

EREB ŞEMO
ŞİVANÊ KURD
DIBISTANA KURDİ

FONDS
ROGER LESCOT

EREB ŞEMO

# ŞIVANÊ KURD

# Û

# KURDÊN ALAGOZ

ÇAPXANE NASSAR - BÊRÛT

# PÊŞGOTIN

Di sala 1935 an de, neşrîyatên dewleta Qefqasiyê, li Tiflisê. bi rûsî bi navê «Şivanê Kurd û Kurdên Alagoz», kitêbek çap dikir. Ev kitêb ji kurdî hatibû wergerandin.

Nivîsevarê vê kitêbê, Ereb Şemo, xortekî kurd, koçer, jîrek û çavekirî ye, û zarotî û xortaniya xwe bi şivaniyê derbas kirine. Di biçûkayiya xwe de, Ereb Şemo ji zimanê xwe pêve, tirkî û ermenî jî hîn bû bû. Di dibistana gundê xwe de, têra xwe xwendin, û nivîsandina rûsî jî girti bûn. Di despêka xortaniya wî de cenga mezina pêşîn «Cenga emperiyalistan» destpê kir. Şivanê me yê xort li cem leşkerên Uris ên keti bûn Kurdistanê û bakurê Tirkiye vegii tibûn xwe kire tercîman.

Ji ber perîşaniyên mezin ku di zarotiya xwe de kişandibûn, Ereb Şemo hêvîdarê rojên xweştir bû, ewî ev hêvî di mebdea Komunîst «tevayî» a «Inqilaba Sor» a sala 1917 an de peyda kir.


Di «Şivanê Kurd» de, Ereb Şemo, bi awakî gelek tabiî û besît, lê ne bê aheng, jiyîna adetî ya eşirên koçer ên Kurd dixe ber çavên me. Em nikarin vê kitêbê bê elaqe û heyecanê bixwînin, nemaze ku ev adetên kevin ên hezar salan êdî, roj bi roj winda dibin. Kurdên Alagozê jî ji mêj ve gihaştine bextiyariya nîzama sovyetî. Di vê Kitêbê de, rûpelên ku behsa wan dikin li ser zilma axan gelek dimînin û guhirandina nîzama civakî zerûrî didin zanîn. Bêş ên li ser feqîran, hatine rakirin. Isûla qelen, ku ne dibişt xortekî bê pere bibe xwediyê jin û mal, êdî ne maye, Koçer bi cî bûne û erd ji her kesî re hatiye par kirin. Ev tişt, giş, ji aliyê merivekî ku bawer dike û dixwaze ku birayên wî yên kurd jî pê bawermend bin, gelek ji dil û can hatine nivîsandin.

Ereb Şemo yek ji wan merivan e ku di Ermenistana

Sovyetî de ji bo danîna elfabeyeke kurdî bi tîpên latînî jî xebitîne. Ji wê pêve, li ser miletê xwe, tiştên din jî nivîsandine, wek bi ûrisî: Kurdên Qefqasiya û Derwêşên Kurd

Ereb Şemo îro, di zanîngeha tarîxa dewlet a madiyetan de momoste ye.

Ev kitéb li Parîsè ji aliyè Bazîl nîkîtîn hatiye wergerandin fransizî û jè dîsa bûye Kurdî.



# ÇEND GOTINÊN WERGER

Xwendevanên delal! Hun baş dizanin ku 10milyon kurd di nav pênc dewletan de hatine par kirin: Tirkiye Iran, Iraq, Sûriye û Ermenistana Sovyetî. Ji vana, çaharên pêşîn ji kurdan re ne bi tenê serbestiya seqafî û siyasî lê heqên insanî, heqên jiyînê bi xwe ne dane, ù çiqa ji wan hatiye, xebitîne da wan di tarî, nezanî û perîşaniyê de bihêlin, wan ji xwe re bikin kole, dewlemendiya axa wan ji destê wan bistînin, û wan nehêlin tu cara çavê xwe vekin, destê bev bigirin û di' riya pêşveçûn û xweşiyê de arîkariya xwe û ya cibanê bikin.

Lê, li Sovyetistan, rewşa kurdan bi awakî din e; li wê ji 60000. hezar Kurd re serbestî û heqên 90 milyon Uris, 30 milyon qozak. 5 milyon Gurcî û 2 milyon Ermenî, hatine dayîn.

Kurdên wê derê, xwe bi xwe îdare dikin, bêşên xwe ji bo pêşveçûna welatê xwe xereb dikin, di dibistanên piçûk û bilin de bi zimanê xwe dixwînin; li Moskawa nemînendeyên wan li Ordiya Sor fermendarên wan, û di zanîngehan de zanayên wan bene. Tu jin û mêr, li wê bê xwendin ne mane. Fikrên Nû ketine serê her kesî û ew şiyar kirine. Di nav milet, axa, beg û mîr ne mane giş bû ne birayên hev û wek hev. Erd milkê gundî û febrîqe milkê emele bûne.

Ferd ji bo milet, û milet ji bo ferd dişixule.

Nivîsevarê vê kitêbê, Ereb Şemo, ji miletê kurd re, ku di sedî de not şivan, rencber, emele û belengaz maye, mîsalekî gelek hêja ye. Em dibîhin, bi çi awayî ev lawkî şivan, reben û birçî bi sayeya fikir û nizamên nû, bû zanakî mezin, nivîsevanekî bi nav û deng, û xilaskarekî bêtirs ji bo belengaz û bindestan.

Va ye, çiwa, em vê kitêbê dîsa werdigerînin kurdî, wê çap dikin û di nav miletê kurd de belav dikin. Em ji xwendeva-

nên xwe hêvî dikin ku wê ji gundî, koçer, pale emele û renceberên kurd re bixwînin û ji wan re bidin zanîn ku eger miletê kurd heya niha, bindest, perîşan û paşdemayî ye, ne ji rûyê wan lê ji rûyê serekên wan ên nezan, menfaet perest û bêbext ji alîkî û ji aliyê din jî, ji istimar û faşistiya derve ye. Şikênandina kurda di sala 1925, 1930, 1939 an de li Tirkiye, û ya 1920, 1930, 1945 li Iraq, û xirakirina Cimhuriyeta Kurdistana Iranê û kişandana kurdan serê çiyan ji gotinên me re delîlên hêja ne.

Divê, kurd giş bizanin ku, xilasiya miletekî, bi şiyarbûn û tanzîma piraniya xelkê wî, pêktê. Piraniya miletême, rencber, şivan cotkar û emele ye. Azadî û serxwebûna Kurdistanê, bi destêvana û ji boqenciya vana wê bêne mêydanê. Ji lewre, me ev kitab, nemaze, ji bo wan wergerand û çap kir.

Em hêvîdar in ku ewê bihayê wê yê edebî û fikrî bizanin, jê ders bistînin û esbabên perîşanî û bindestiya xwe nas bikin û li doraliyên xwe bi çavên ronak û bê tirs binêrin.

# BIRA PÊŞÎN

## I - Malbat û Zarotiya min.

Şemo Şamil ji Eşîra Hesenî, Kurdekî bê milk bû. Di mentîqeya Sûrmelî de-berê tabiê Hikûmeta Erîvanê-şiwanî dikir. Piştî ko jina wî mir, Şemo her du kurên xwe - Bro û Derwêş - bi xwe re birin û ji wê derê derket.

Di himbêzê de, bi van her du zarokan re bi rê ve çûn, jê re ne hêsanî bû. Bro hîngê sê û Derwêş jî du salî bûn; ji bextê wî yê baş, pêre ji bo hilgirtinê tiştên din tunebûn.

Li nêzîkî Qarsê, di gundê Azatê de, Şemo li cem Yûnavekî bi navê Todor bû şivan. Li cem Todor bi navê Naîme, Keçeke bêkes hebû. Şemo Şamil xwest vê keçikê ji xwe re bîne. Lê, Xadimeke bê dê û bav wek milkê axayê xwe tê hisab kirin. Todor dizanî ku kurd jinên xwe bi pere tînin, ango qelen didin, ji lewre, ewî ji Şemo Şamil xwest ku du salan belaş pezê wî biçêrîne. Şemo careke dî çavên xwe li Naîme gerandin, û ji bo jineke ewqas delal xebata du salan kêm dî û bi dilxweşî razî bû.

Di kadîneke de, bi kêfxweşî daweta wan çêbû.

Naîme, xweş bi kêrî îşên malê dihat. Ji hiriyê rês dirist û benik çêdikir û jê jî merş diwûnandin. Her du xweşkên min-Çîçek û Gulzar - û Ez Ereb Şemo, em di vê kadînê de hatin dinê. Diya min her du kurên mêrê xwe -Derwêş û Bro- diêşandin, lê em zaro me gelek ji hev hez dikir.

Şemo di zivistanê de, li cem dewlemendan dibû rencber û li karên wan dinêrî. Zar û zêçên wî êdî pir bû bûn. Bi xebatên xwe yên rojê, dê û bav, bi zor em xwedî dikirin,

Tenûra me di nav kadînê de, di zivistanê de, carna bi rojan ve bê agir dima. Tu dewarê me ne bû ku em ji ziblê wan sergîna çêkin û tevî kayê tenûra xwe pê germ bikin, ji

ber ku li aliyê me dar û devî ne bûn.

Pircaran, dadê, li cem xelkê bi rojê kar dikir, bi wan re li hev dihat ku bihêlin em zaro, li axurê an li gova pez rûnin, ji ber ku di zivistanê de ciyê pez û dewar germ dibe. Lê tu xwedî belaş ne dihişt ew xwe germ bikin. Ji lewre, gava dadê, li mala wan dişixulî, emir didane me ku em li ber alifên miyan rûnin. û ji sibê heya êvarê, birçî êmên ku ji alifan, diketin em wan ber hev bikin û dîsa wan deynin cihê wan. Eger ew li wê ne biwana, miyan pê li ewqas qûtên giran biha bikirina.

Gava em hinek serbert diman, xudiyê pez helez datanî ber me ku em ji bosobeya wî, wî hur bikin. Êvarê, piştî şixul, bi dadê re, ji tab ketî, bi lez û baz em diçûn kadina xwe ya cemidî.

Ji roja ku ez hinek mezin bûm, min xwest ez bibime şivan. Birayên min ji nihu de bi bavo re diçûn çolê wek duşivan, û arikariya wî dikirin û ewî jî ew hînî şivantiyê dikirin.


Daxwaza min bi cî bû. Rojekê, serê sibê, bi bav û birayên xwe re ez çûm çolê ber golikan. Wê rojê ha, diya me jî bi me re hat da ku pincaran şanî me bide (Spînk, tirşo, mendik, pêkesk H.Ş...) Diviya bû, em şivan, zikê xwe bi nan û pincaran têr bikin. Dadê, heyftekê bi me re hate çolê. Piştî ku me ev pincarên ha naskirin, ew êdî nema hat. Her sibê, ewê perçeyek nan û hinek xwey bida me da ku em wan bi pincaran bixwin. Birayên min, pincarên ku tên xwarin û ên nayên xwarin ji hev nas nedi kirin û ew ji min dipirsîn. Diya min pesnê min dida û digo gava ez mezin bibim ezê bibim şivanekî pispor...

Bavê me jî, giyayên ko bi kêrî pez ne dihatin şanî me didan. Kîjan giya di pez de kurm pêyda dikin, bi kîjana pezên nexweş tên derman kirin, û pez ji guran çawa tê parastin...?

Di destpêkê de, me pincar ji bo xwe ber hev dikirin



Di vê zivistanê de agirê me hebû



Di vè zivistanê de agirê me hebû



Di vè zivistanè de agirè me hebù

û ew bi nanê xwe dixwarin. Lê. piştre, diya me, hîn giyayên din ji me re dan naskirin, wek : Spîdak, gûtik û Sîso). Me ew hişk dikirin, dibirin mal. Diya me ew dineqandin, ew datanîn ser hev, û baş bişkirî, ew biltanîn ji bo rojên tengiyê.

Gava ew hîn mezintir bûn, dadê ji me, di zeviyan de, peydakirina helezê xwest, me jî her gav bi xwe re hinek jê tanî mal.

Me rîxa hişk jî her bev dikir, bi avê şil dikir û jê sergîn çêdikir. Li bergermiya tavê, tepikên me hişk dibûn, û êvaran me ew bi xwe re dibirn mal. Her yek ji me, diviyabû her êvar deh liban jê bîne. Lê, êmin bi xwe, kêfa min ji pîskirina destên min bi ziblê ne dihat. Dadê gazina ji min dikir û ez ceza dikirim.

Dê û bav jî xebata me kêfxweş bûn.

Vê zivistana ha, tirsa me ji sermê ewqas ne girau bû. Me têra xwe helez, pincar û sergîn pêkanîbûn.

Payîzê, nîv tazî, em ji sermê, baran û zipika gelek diêşiyan. Bê sebir, em li benda ketina berfê bûn ko em neçin çolê.

Sala Şivantiya me ya pêşîn bi vî awayî derbas bû.

Li mal, nivîna me ji kayê bû. Me ew li erdê radixist û me besîrek ji giyayê nerm çêkirî datanî ser; balgêha me jî ji vî giyayî bû. Li ser xwe jî me merşeke fireh davêt. Em zaro, li cem hev, li ser rêzekê, radizan, û di nav bera me de pevçûn bê heseb bû, heryekî ji me dixwest li nîvî raze, ji ber ku ew der hêj germtir bû. Herwekî ez piçûkê gişan bûm, ew ciyê şeref pir caran, ji min re dihiştin.

Di vê zivistanê de, cara pêşîn, agirê me hebû, û dadê gelek bi kêfxweşî tenûr germ dikir. Piştî ku şîva me çêdibû û nan dihate pehtin, diya me bi merşeke mezin devê tenûrê digirt ku bi şev sar nebe. Êvaran, em li dora tenûrê rûdiniştin û me lingên xwe dixistin tê de û xwe germ dikir.

Diya me ji pincarên ku ji havînê de me hişk kiribûn (tirşayê kelandî) ji genim danû, û ji ard jî devşewitî û gelek xwarinên rengareng pêk tanîn.

Ji bo çêrandina çêlekan, bavê min genim distand. Ewî bi vî karî, ji destpêka nîsanê heya dawiya çiriya paşîn, ango heya ketina berfa ewil radibû.

## 2-Kerê me yê piçûk-Şivaniya Molokan

Bavo, ku genim ji xwediyê dewaran distand bi pişta xwe dibire êş. Gelek hez dikir ku kerekî wî hebe. «Hingê, ewê şixul hêsanîtir bibe.». Wî pir caran digot.

Bê dewarekî, îşê me dijwar bû. Ji bo îşekî ne hêja, diviya bû em serê xwe li ber cîranan xwar bikin. Kûlak (gundiyên têr mal û pere) ker didane me lê, ne bê tu tişt; ji bo kiriya wî, rojek an du roj, ji me xebat dixwestin.

Ji bo kirîna kerekî, bavo her sal du rûbl, (pereyê rûsî 50 qirûş libnanî) datanîn alîkî. Piştî sê salan, şeş rûbl bi girêkeke mezin di paçikekî de, paçik di elbikeke tenekê de û elbik di xurcikê de, hatibûn veşartin. «Bi sê an çar rûblên din emê bikaribin kerekî ji xwe re bikirin», bavo digo.

Gelek caran, bavo girêka bi sir vedikir û pereyên paxirên giran biha, jê vala dikirin. Bi dadê re careke din ew dijwartin. Di hisêba xwe de, xwe şaş dikirin, û di cî de ji nû ve dijmartin. Carna, em zaro, ji dengê wan şiyarbûyî, me li wan dinerî, çawa dijmêrin: bi hurikên 5,3,2 kopek (pereyê rûsî) rûbl pêktanîn, piştre paçika pere têde datanîn nav elbikê, û elbik jî li nav xurcikê.

Di vê zivistanê de, Bavo li cem yûnanekî bi navê Palka Friandofîlof dixebitî. Ewî aşek û gelek pez hebûn. Li biharê, li meha adarê, 4 rûbil dan bavo, ser de jî bo xebata wî ya baş jê re paltoya eskerî ya kurê Friandofîlof hediye kirin. Li doraheywên me çenberek girt û bi helahela me ew bir hundirê kadûnê,

Ev kera ha,, delala hemû malê bû; li havînê ewê dehşek anî. Me gelek bala xwe dida her du kerên xwe. Ji bo zivistanê me ji wan re ji dil û can alifpêk tanî, me giya diçinî, me jê rêsîçêdikir, û gava hişk dibûn me ew dikişandin mal. Kera me, dimala me de gelek bi kêrî me dihat, me pê gunî û giya tanîn mal û li ser pişta wê me tûrên genim ên giran dibirin éş.

Di vê wextê de ez duşivanekî têgihaştî bûbûm û pir caran bavo, kerî bi timamî disparte min û birayên min û ew bi xwe diçû mal.

Salek welê derbas bû. Brayên min bûbûn şivanên bi serê xwe û ez jî bi bavê xwe re dimam. Nihu em li ciyekî din rûdinin, Aleksandrovka; piştî ku bavê min bê şixul ma bû, em hatibûn vir.

Di vê cîguhartinê de, kerê me yê piçûk gelek bi kêrî me hat. Ewî serweta me bi timamî kişand- merş, kulav, beroş, giyayê me yê nivînê û firaxn dîtir...

Bajarê ku em niho tê debûn, berê kurda jè re Koné Sor digotin lé mihacirén ûrisén Molokan jè re navé Aleksendroka danîbûn.

Ev gundê ha 7 kîlometere ji Qarsê wê daye û bi awakî gelek şaîrane li ber çemê Qasat hatiye ava kirin. Gava yek çem bi çem 'diçû, li doraliyên xwe wek xalîçeyên rengareng mêrg didîtin, û hinek li dûr, zeviyên çandiniyê yên çarkoşe kesk dikir, di nav zeviyan re, coyên avê li bin tîrîjên tavè wek şivén zîv diçirisîn. Li wî aliyè gund jî ciyè bîstanan bû. Molakan li wè kelem, gîzer û hèşinayîyèn din diçandin. Aleksandrovka di nav heşînayî û kulikan de xeriqî bû. Li biharè, wextè vebùna kulîlkan, bihneke xemrevîn li her derè newalè însan mest dikir.

Molokan di nav xweşiyè de dijîn û erdè wan tèrhatin bû. Bi xwe, li her deré mintiqeya Qarsè, gundèn ûrisan li erdèn baş hati bûn avakirin, û molokan li serè her nefs ji ji 50-80 donim milk hebû.

Xelkê Aleksandrovka du bir bûn û her bir dér û

keşekî xas hebûn. Molokanén kûlak (dewlemend) ku bi henek xelk ji wan re (merivên qenc) digotin, li me û li molokanên feqîr gelek zilm dikirin. Carna, Ewqas bê insaf li şivanên piçûk dixistin ku bi saetan ve bê hiş em li erdê diman. Hîn di bîra min de ye, şivanek hebû, bi navè Misto, rojek-èdî baş nizanim- dewar dereng anî bû an du ga keti bûn bîstanê Kûlak Matîyû, evî hingè lè da, her u dest û lingèn wî şikênandin.

Ji me pêve, çend şivanên din hebûn ku gelek di perîşaniyè de bûn. Lê, piraniya wan bêkiflet bûn, ji lewre halê wan dîsa dihate qedandin. Şivanekî gihaştî, bi kirêya xwe îdare dikir. Hîn tê bîra min, bi navê Hacî Silêman, şivanek hebû dostê bavê min bû. Carna, êvarên zivistanê, dihate mala me û ji me zarokan re serhatîyên xwe digotin. Ji tebea wî ya vekirî û nerm me gelek hej wî dikir û tucaran, gava ewî guhê me dikişand da dengé me bide birîn, em jê ne dienirîn.

## 3 - Tadariya guran

Li payizê, gelek caran gur dihatin heya nêzîkî gundê me, xwe davêtin nêv kerî û pez dibirin. Dadê û bavo ji bo selameta pez ku me diçêrand, gelek ditirsiyan. Tirsa wan a mezin, nemaze, ji bo min bû; ewan dizanîn ku zarokekî wek min nikare xwe ji guran biparêze. Her êvar gava min kerî tanî mal, bêî ku tu pez jê kêm be, dê û bavê min bi dengekî bilind, ser hev:« Şikir ji xwedê! Şikir ji xwedê ku roj bê xisar derbaz bû!...», digotin.

Gava di zeviyan de, giya destbihişkbûnê dikir, jiyina me dijwar tir dibû. Bê pincar ku parekê xwarina me ya bingehîn bû, me têra xwe ne dixwar. Vî balî, heya gihaştina genim dom dikir. Hingê me simbil jê dikirin, û li ser êgir me ew dikizirandin, fêrik çêdikirin û bi vî awayî birçîbûna xwe me dikuşt.

Piştî paleyiya genim, di zeviyên vala da êdî tu tişt ne dima. Ji aliyê din, di bîstanan de kartol digihaşt. Her sibê

çi wext me pez dibir çolê, me ji pîrekên molokan çend kartol dixwest; gava kêbanî çavtengî dikirin û bera me didan, ji nêza xwe, bi veşartî em diketin nav bexçan û me dizî dikir. Piştire me komek helez ber hev dikir, agir berdidayê û li benda vemirina wî diman da ku kartolên xwe bêxin di nav xuliyên germ de; piştre bi xwey me ew gelek bi lezet dixwarin.

Eger me dizî dikir ji neçarî bû. Şiwan kiriya xwe li paîzê, dereng, piştî ketina berfé, distandin, û heya wé wexté diviya bû em îdare xwe bikin.

Di nav pîrekên molokan de yek hebû, gelek kêfa wê bi min dihat, xaltika Paraşa. Ewê hej min dikir. Bê şik dilê wê bi vî şivanokî reben è ji sermê tevizî, dêşiya, ku serê sibê, li payizê keriyê pez dibir çolê, Heftê du, car xaltika Paraşa, bi dizî ji min re nan û xiyarên xwey kerî didan. Tu zaroyé wê ne bû. Gelek caran, êvaran piştî ku me pez dixist govê, ewê banî min dikir û bi bermayîyên şîvê ez têr dikirim.

Béî ku em pê bihesin, paîza rast a bi baran, tevî serma û mija, destpêdikir. Ber bi vê demê re, şixulên çolê timam dibûn. Li beriyè ji şivana pêve tu kes ne dima. Lê min xwe bi tenê his ne dikir; li cem min, hergav, hevalê min ê sadiq, sayê meyê pez, Çavreş hebû. Min gelek hej çavreş dikir, tucara, ew, bi gavek, ji min dûr ne dibû.

Bavo tim digote min ku divê di paîzê de şivan çavvekirîtir bin; gur ji birçîna pir çavsor dibin, û hema firseteke piçûk bikeve destê wan, xwe davêjin nav pez û çendek jê dibin. Bavê min ez hinî xwe parastinê ji guran dikirin. Her sibê wextê derêxistina pez, ewî çend perçe darê çam ên hişk û qul kirî dixistin tûrikê min û digot: «Ev dar zû pêdikevin û rewîneke mezin didin, eger gurekî êrîşî te kir, vî darî vêxe û bixe devê wî, ewê baz bide...»

Rojeke sar û bi mij, min keriyê xwe dibir çêrê. Piştî xurînîyeke sivik, ez dîsa birçî bû bûm. Digel vê yekê, perçeyê nan ku sibê, dadê danîbû tûrikê min, gelek piçûk bû. Min nanê xwe kir du par, yek jê min xwar û ya di jî min da Çavreş. Lê ev perçeyê piçûk, şûna ku min têr bike, birçîbûna min

hîn tûjtir kiribû. Wextê taştê nêzik dibû, lê tûrik vala bû. Çava bikim? Min kerî nêzîkî bexça kir, ketim nav wan ·û ji xwe re çend kartol dizîn. Piştire min pez bir li ber bereheke. Li wê, komek darê ben hebû; min agir pêdada, xwe germ kir, û bi bêsebrîyeke tamdar, li benda vemirina êgir mam da ku kartolên xwe bêxime di nav xuliyê de. Gava ku rivîn bi timamî vedmirî, bi lez û baz min kartolên xwe avêtin tê de.


Ji nişkave, min dît ku Çavreş radibe, guhên xwe bel dike û di nav mijê de li tiştekî dinêre. Dilê min his kir ku xeter nêzîk dibû. Lê ez gelek birçî bûm û ji min ne dihat ku ez kartolên xwe di nêv êgir de bihêlim û herim. Ji ciyê xwe ne dilebitîm û bi fîkandineke sivik min îşaret didan Çavreş ku bi nûz, nûz û reyîn di nav mijê de winda bû. Ez ji piya, şaş li ber êgir dimam û min qenc guhê xwe dida reyina kuçik, pê re jî, bi çavên birçî, min li kartolên xwe yên nîv-pijayî dinêrî. Dilê min xurt tavêt: di nav mijê de çi derbas dibû? Gur an diz? Şivanekî hîn bêtir tecribekar, ji reyîna sê wê fehim bikira ku Çavreş bêhna gur kiri bû...

Çend deqîqe derbas bûn· Çavreş dîsa xuya kir û bi reyinên xurt hate ber min, herwekî dixwest tiştekî bibêje min. Min fehim kir ku belayek hatiye serê me. Min lez da xwe. Destê min dilerizin. Min êzingê çam xiste gopalê xwe, lê ji gêjbûna xwe min pêxistina wî ji bîr kir û ketim pê Çavreş. Bîstek dî, min du gur dîtin. Yekî ji wan, ji nihu de miyek xistibû devê xwe û êdin jî xwe danî bû ber Çavreş, diranên xwe jê re qîc dikirin, herwekî hevalê xwe diparast.


Di vê demê de, şîretên bavo hatin bîra min. Wek berikekê, min xwe gihande êgir, êzingê xwe pêxist û gava rivîn a wî geş bû, min xwe avêt ser gurê ku miyek biribû alîkî. Gava Çavreş ez bi êgir dîtim cesaret girt û xwe avête gurê li ber xwe. Şerekî dijwar di nav wan de destpêkir. Dilê min bi Çavreş êşiya. Min dev ji miyê berda û çûm arîkariya hevalê xwe yê sadiq. Di vê gavê de, Çavreş gur xistibû bin diranên xwe, lê heywanê kûvî bi awakî welê diranên xwe xistibûn qiriqa Çavreş ku



Çavreş dihate hewara min



Çavreş dihate hewara min



Çavreş diliate hewara min

kûz kûzên seyê reben ji yên gur bilintir bûn. Diviya bû ez xwe kûz bilezînim. Min bi destê xwe yê çep darê bi rivîn girtibû, û bi destê xwe yê rast jî min rahişt kevirekî. Min êzingê pêxistî anî heya ser pozê dijmin û heya ji min dihat, bi hîz, min kevirê xwe li parsûyên wî xist. Gur xwe ji lepên Çavreş derêxist û bi lez berê xwe da newalekê. Hevalê min êdî rîzgar bû bû.

Digel vê yekê, gurê din mî kişandibû nav mijê. Ez ji heyecanê dilerizîm; min berê xwe da aliyê wî û ez gihaştimê. Bi dîtina min, gur xwe da ber tehtekê, pez avête alîkî, û diranên xwe li min beş kirin.

Ezingê min êdî tu rivîn ne dida. Ez bê çek ma bûm. û gur bi çavên xwe yên tûj û şerût li min dinêrî û xwe kar dikir bête min. Lê min xwe şaş ne kir. Bêi ku ez çavên xwe ji gur bilînim, min hêdî, hêdî, êzîngê din pêxist ji siûda min bû ezîng zû agir girt, û hingê min êrîş birê. Gava gur rivîna geş dît, xwe ji miyê bi dûr xist xwe gij kir û diranên xwe qîc kirin. Di vê demê de min reyîneke xurt bihîst, Çavreş dihate hewara min.

Rewş derhal guhirî; Hevalê min bera gur da, min jî kevirek avêtê, û piştre bi ezingê xwe yê pêxistî ez çûme ser û min agir xiste, gepa gur, tirs pê ket û di cî de, di nav xirama da winda bû.

Şer xilas bû bû û dijmin reviya bû. Min xwe nêzîkî miyê kir. Rebenê, ji tirsa dilerizî, û ji sê ciyan brîndar bû. Gava ez vegeriyam keriyê xwe, min dît bizinek avêtî ye erdê, gur ew dirandibû.

Min pez ê belavbûyî da hev û ew anî nêzîkî êgir. Ez ji tabê ketibûm, û birçîbûn ji ezabekê xurtir ez gêj dikirim. Bi destên xwe yên bi lerz, di nav xuliyên de li kartolên xwe geriyan. Li kû ne?.. Tu tişt jê ne ma bû... Giş şewitî bûn. Deqîqeke tehl... Ez li ber girînê bûm...

Ji goştê bizina dirandî min perçeyek da Çavreş; lê min bi xwe jê tam ne kir û êvarê ji nêza diliyayî, ez vegeriyam

gund. Min, bi rùmetî, goşt bir xudiyê wî ku ji bê siûdiya min keşeyê Molokan bû. Xezebeke dijwar ew girt; ez birim axirê, û li wê, ewqas li min xist ku min ne dikarî xwe ji erdê rakim. Ez bê hiş li wê mam. Bavê min hat û ez li wê dîtim û bi zehmet ez kişkişandim mal.

Adet wa ye ku şivan ji xisara ji pez re ji aliyê guran, neyin ber pirsiyar kirin. Herwekî şivan bê çek in, ev tiştekî maqùl e. Lê, kûlak Selîverston, mezinê Molokan, guh ne da adet û qanûnan. Ji bo bizina dirandî, saliya min, -çend rûbil, û çend kopek-ji min birî.

Ji van peran mehrûm bûyî, ji bêgaviyê, zivistanê, ez li cem xelkê nanzikî xebitîm.

Biharê, min xwest ez dîsa vegerim karê xwe yê ku min gelek hez dikir, ango, şivaniyê.

Ez pir geriyam ku ji xwe re ciyekî pêyda bikim. Tu kes, ji bo piçûkbûna min bi min qaîl ne dibû û digotin ku ez ne hêja me nanê zivistanê.

Piştî mideteke dirêj, gundiyekî ez ji bo zivistaneke timam birim cem xwe.

Li cem xudiyê min ê nû, gelek pez û dewar hebûn. Ez li axir, li ser textikan radizam.

Şixul ne hêsanî bù, diviya bû ez berê şefeqê rabim, axir bimabim, zibil bibime hewşê, wê baş kom bikim, alifa paqij bikim, êmê hespan û ê pez bidim... Ev tişt giş, ji taqeta min zêdetir bù, berê derketina rojê, diviya bû ez yana giş xilas bikim.

Ji xebata min a baş, axayê min, ji min gelek razî bû. Sibehan gava dihate axir, ciyê hesp û yê çêlekan gelek paqij û dewar û pez têr xwarî didîtin. Ez gelek dixebitîm, û ji axir qet dernediketim. Xwarina min jî ji min re tanîn wê derê. Bi tenê, rojên cejnê, min li mal dixwar, ew jî ne bi xweyiyên malê re, lê bi tena xwe.

# 4-Çetel bi kêrî çi tê?

Havîn hat. Xwîşka min Gulzar û ez, me li cem yekî xwe kir golikan. Havîn bê serêş derbaz bû û heya paîzê em xweş bi karê xwe rabûn.

Carek mielimeya gund, ji bavê min xwest ku ji bo şixulekî xwe min rêke Qarsê, ji gundê me heft kîlometir wê da. Bavo razî bû, Mielîme tûrek û mektûbek dan min ji bo merê xwe ku bi du kurên xwe re li Qars rûdinişt û li wê memûrtî dikir.

Piştî ku ji bo vê zehmetê, min 15 kopek xistin bêrîka xwe, bi dilxweşî ez bi rê ketim.

Li bajêr, ji bo pêyda kirina mal, li gora adresa ku da bûn min, ez gelek geriyam. Piştre, di hewşekê de min du kurik dîtin ku dilêystin. Bê pirsîn, min nas kir ku ew kurê mielîme ne. Min mektûb şanî yekî ji wan da. Kurik qîr kir; «Bavo, mektûbek ji yadê!»

Bavê wan, di cî de derket, mektub vekir, û piştî ku ew xwend, banî min kir. Zarok jî, ji hewşê hatin û em tev de ketin mezeleke dî.

Her du bira bi hev re pistepist dikirin û şaş li min dinêrin. Ji vî tiştî bêhna min gelek teng bû. Bîstek dî zaroyên din û hin jin jî hatin. Giş li mezelê kombûyî, çavên xwe ji min hilnedikirin. Ez gelek aciz bûm. Piştre, sebeb ji min re dan zanîn; mielîme di mektûba xwe de gotibû ku ez kurd im. Bê şerm, wek dehbekî ecêb, ji serê qehfê min, heya neynûkên lingên min, li min dinêrin. Hin ji wan ji min çend tişt pirsîn; min jî bi lez bersîva wan da.

Wa dixuya, mielîme, di mektûba xwe de hin tişt xwestibûn, ji ber ku mêrê wê em berdan û berê xwe da alîyê bajêr. Zarok jî dora min girtin û ji min xwestin ku ez jî bi wan re bilêyzim. Lê her wekî min lêztikên bajariyan ne dizanîn, min xwe da alîkî.

Gava bavê zarokan ji sûkê vegeriya, ew banî taştiyê

kirin. Ji min re jî li metbexê xwarin dan. Xadima wan, jinikeke bi laş û gewde û bi hinarikên sor, firaxeke şorbê da min û li cem firaxê ji, kefçî kêr û çetelek danîn. Min dizanî kefçî ji bo xwarinê ye, lê, kêr û çetel ji bona çi...?

Min da eqlê xwe û min jê derêxist ku ev lêztikên zaroka ne; hedîyek ji min re... Li gund, milhêbên mezin min dî bûn, û kêfa min gelek bi van milhêboka hat.

Min sehina pêşîn û a dîtir jî bi kefçiyê xwar û gava ez ji masê rabûm, min kêr û çetel xistin bêrîka xwe. Xxadima ku çavên xwe ji min ne dizivirandin çû û mesele gote efendiyê xwe. Ewî ji min pirsî eger min dil dikir bi rê hevim an na? Min gotê ku min dixwest ku ez vegerim mala xwe.

Rexma tiştên baş ku min xwari bûn û hediyên delal ku min standibûn, dilê min ne rahet bû. Her tişt li vir ji min re biyanî û ne nas bû û her kesî li min bi awakî ecêb dinêrî.

Efendî ji odê, turikê bend kirî anî û du elbik jî dan min ku ez wan dêynim bêrîkên xwe. Ewî qesden ev tişt dikir da ku bibîne ezê çawa xwe jê derêxim. Lê, bi awakî gelek adetî, min çetel û kêr ji berîkên xwe derêxistin û ew kirin paşila xwe, da ji elbika re cî çêkim. Hingê efendî ji min pirsî: «Tê kêr û çetelê me ji ku birin?» -«Ma, we bi xwe ew ji min re ji hediye ne kirin...»? bi telaş min jê pirsî.

-Bê şik .na. Kê ew ji te re hedîye dan?» Ew jî şaş mabû. Êmin, êdî, min xwe ne girt û bi xeyd min qîr kirê; «Ne xwe, wextê xwarinê, we çima ew danîn ber min...?»

Di vê gavê dezaro xeber gihandibûn cîrana û metbex tije xelk bû bû; giş guhdariya me dikirin.

—Kêr û çetel ji bo xwarinê danîn ber te ne ji bo tiştekî din», efendî gote min.

Min ne dizani êdî çi bêjim. Zimanê min ne digeriya. Ez bi girînê ketim.

Di nav jinande ku li me kom bû bûn, ermenîyek hebû;

ewê xwe nêzîkî min kir û pirsa ji min kirin. Bi girîn, bi dengekî êşayî û dilşkestî min gotê: «Li van lêyistokan binêre-kêr û çetel- ew ji min re hediye kirin û nihu jî dibêjin ku min ew birin.» -«Ev nelêyistok in, jinika ermenî gote min, ew dan te da ku tu bi wan xwarinê bixwî...»

Dawiyê em li hev hatin. Hinekan dikeniyan û dilê hinekan jî bi min ve dima. Efendî gote xadimê ku du çetelên kevin bide min; lê min ew red kirin. Efendî bi xweşî ez qanî kirim û dawiyê min her du çetelên giranbiha xistin paşila xwe. Piştî ku ji mielîme re mektûbek dan min, min turik hilgirt û berê xwe da dîsa gundê xwe.

Di riya xwe de, ev hadiseya pîs ji bîra min qetdernediket, lê digel vê yekê bi van çetelan ez ewqas ne dilşikestî bûm û min bi lêztika wan ji xwe re gelek xeyala dikirin. Gelek caran, li rê, ez disekinîm, min ew derdixistin, hêyran, hêyran. li wan dinerî, û bi wan, kayên li erdê ketî hildikirin.

Wê rojê ha, dinya pir xweş bû, û ez beriya êvarê gihoştim gund. Min mielîme, digel keça wê, li hewşê dî. Gava çavê wê bi min ket, bi lez, bi aliyê min ve hat. Min mektûb û elbik danê,

Bi xwendina mektûbê, mielîme kenî, keça wê hat cem û sebeb jê pirsî. Wê jî, çîroka çetel gotê, her du jî li min nêrîn û mideteke dirêj kenîn. Min turik jî da wan. Mielîme pesnê min da û got ku ez kurikekî gelek bîr bi-rim û hişt ez herim mala xwe.

## 5-Dersên pêşîn-Nifûsa min.

Piştî du rojan, gava mielîme, bi keça xwe re digeriya, ber bi aliyê koxika me ve hat. Ez derketim û bi bez çûm pêşiya wê. Ew kenî û pirsa bavê min kir. Min jî bi lez, ban bavê xwe kir. Ewî jî hat, bi edeb kumê xwe rakir û silav lê da. Mielîme jê xwest ku mehê bi sê rûbil ez bibim dergevanê

dibistanê. Bavê min bi dilxweşî razî bû û ez bi mielîme re çûm dibistanê. Li wê, ewê berî gişan, ez birim ciyê êzinga û piştire dersxane; li wê karên min çi bûn, ji min re dan zanîn: Diviya bû her ro, ez dersxane bimalim, tozên mase pencere û derî papij kim, sobeyan pêxim, bermîl tije av kim, û her sibê û êvar semawara mielîme hazir bikim û ji bo şixulên wê, car, car herim bajêr.

Roja pêşîn, gava ez ketim dersxane, hema, hêyran, min temaşaya tabloyên li dîwaran daleqandî kir. Çi ne bû li wê? Têyr, heywan, heşerat, xerîte... Min tu tişt ji wan dernedixist, lê kêfa min bi wan gelek dihat. Bi tenê, tiştek hebû ne dikete serê min; li cem teyrên rengareng tabloyeke ecêb û bi tirs hebû. Ev zilamekî bi qehfeke rût bû. Di qehfê de diran û şûna çav û difin qûlên mezin hebûn û ev zilam bi tenê ji hestîya pêve ne tu tişt bû. Welê dihate min ku, ev yek ji wan cinan bû ku li mal em pê ditirsandin. Tesîra vî tiştî di min de ewqas mezin bû ku gava, ez di ber re derbaz dibûm, min çavên xwe digirtin û êvaran, di tariyê de, min ne diwêrî, bi tena xwe, li odê bimînin Min gelek hez dikir mana vî, ji mielîme bipirsim, lê ji fehîtiya min, ji min ne dihat, Piştire min bala xwe da ku şagirt qet guh ne didan vê tabloyê. Bi vî awayî. dilê min jî êdi xurt bû. Hêdî, hêdî, bê tirs ez li ber dimam û min sêyra tabloyên têyrên xweşik dikir.

Roja pêşîn, gava êvarê, piştî şixul ez vegeriyam mal, hemî xelkê malê, bikêfxweşî dora min girtin, min jî ji wan re yek, bi yek, çi dîtibû û kiribû, got. Bavê min bawer ne dikir ku mehê sê rûbil bidine min, û pir caran digo ku eger rûbilek biwa dîsa baş bû.

Lê, gava meha min qediya, Mielîme banî me kir û ji min re 3 rûbil dan. Min ne dizanî navê xwe binivîsim; şagirdekî li şûna min îmza min danî. Mielîme pere xiste destê min emir da min ku ez ji xwe re çakêt û şebqekê bikirim û gote min: «Hingê ezê te bêxim dersê û te bielimînim xwendin û nivîsandinê.»

Bavo, ji bona kirîna cakêtekî minasiptir razî bû, lê ji bo xwendin, izna min neda; ji tirsa ku eger ez jî wek şagirtên din bielimim, ez êdî tu kiriê nestînim....

Ji min re pantalonekî kevin, şebqe û saqoyek, li gora min, gelek mezin, kirîn. Bi vî awayî, ez nihu, ji berî bi cilê xwe ê kevn, kêmtir diketim ber çavan. Li dibistanê, bê haya bavê xwe, ez diketim dersê, ji dil dixebitîm û bi ser de jî, min karên xwe yên dergivaniyê jî, xweş, bi cî tanîn.

Min, bi rûken û kêfxweşî hemû şixul dikirin û Mielîme ji min gelek razî bû. Lê, rexma çekên min ên nû, zaroyên Molokan ne dixwestin li cem min rûnin û digotin ku ez gelek qirêj im. Mielîme mecbûr bû min bi tena xwe bide rûniştin.

Di şobeya nû hatiyan de, min dest bi xwendinê kir. Min pir dixwest ez bielimim û ez zû û bi hêsanî dielimîm. Mielîme pircaran dihate maseya min û didît ku roj bi roj ez gelek pêve diçim.

Em hînî elfabe, bi tîpên li ser kartonê leziqandî, dikirin; me ew dibijartin, û ji wan pirsên ji me xwestî pêktanîn; min jî, her gav, ew pirs ji ber dikirin.

Ez bi keça Mielîme, Marûsiya re, bûbûm heval. Ew keçikeke gelek delal bû û di şobeya dibistanê ya diwemîn de dielimî û baş bi xwendin û nivîsandin dizanî. Ewê di naskirina tîpan, dirûst kirina hêcan û pirsan de, gelek arîkariya min dikir. Her du Mielîmeyên min, ya mezin û ya piçûk, ji pêşveçûnên min ecaîb diman.

Min gelek hej Marûseya dikir, û sibeha gava, zû, li dersxane û mezela Mielîme, min sobe pêdixistin ez li ser pêçiyên xwe dimeşiyam da ku wê şiyar ne kim.

Carek serê sibê, berî destpêkirina dersa min semawar anî û ew danî ser masê û vegeriyam; di vê gavê de, Mielîme ez sekinandim, û Marûsiya bi awireke cidî û bi çavên biken ji min re elfebayek hediye kir. Li ser kitêb, nivîsandineke desta hebû ku hingê min ne dikarî bixwenda. Ez lê heyran mam û ji vê

hediyeyê, ewqas kêfa min hat ku min ne dizanî çawa ji bin vêqeneiyê derkevim.

Gava şagirt hatin, ez li pişt maseya xwe rûniştîbûm û bi serbilindî kitêba xwe danî bû ber xwe.

Évarê, carek ji ders û şixul xilasbûyî, min kitêba xwe danî bin milê xwe û min bazda mal da ku xwişk û brayén xwe jî ji kêfxweşiya xwe paydar bikim. Bi kitêbekê vegera min mal, qiyamet rakir. Xelkê malê dora min girtin, li kitêba min bi elaqeke mezin nêrîn û guhdariya mesela wê kirin. Digel vê yekê, xwîşkên min bawer ne dikirin ku tiştekî ewpas baş ji min re hediye kirî bin û ji bavo û yadê re digotin ku ber hal, ew kitab li şûna kiriya min a meha diwemîn dane min. Her çend jî bi sond û yemîn, min gote wan ku ew elfabe ji min re hediye kirine, dîsa baweriya wan bi min ne dihat.


Roja dîtir, xweşka min a mezin bi yadê re çû cem Mielîme da rastiyê jê seh bikin; gelo min ev kitab bi pere kirîbû an ji min re hediye dabûn? Mielîme gote wan ku ewê, ev elfabe, ji min re hedîye kiribû, bi ser de jî ewê his kir ku li ber zimanê xwîşka min tiştekî dî heye û newêre bîbêje. Mielîme fikra wê fehim kir û gotê ku wê belaş dersa min dida, ku ez lawikekî gelek xebatker û zîrek im û ku serê salê, gava, ewê here bajêr, ewê ji min re cilekî kevn ji yên kurên xwe, bîne.

Gava min dît ku halê min çêtir dibû min hîn bêtir xwe da xebatê da ku rojek berî rojekê bikaribim kitêba ku Marûsiya ji min hedîye kiribû, bixwînim.

Rojek ji rojan, Marûsiya ji min pirsî ka ji kitêba wê ez çi elimîbûm û rûpela pêşîn vekir? Min zû, zû, xwend: «Ma-şa na-şa (diya me), şa-şa (navek) oza (moz). h.ş....» Marûsiya bi lez çû cem diya xwe û gotê ku Ereb ji nihu de elimiye xwendinê. Mielîme hate nêzîkî min û piştî ku guhdariya xwendina min kir, destê xwe li ser serê min gerand, ez pîroz kirim û got: «Ji îro bi şûnda, tu êdî zû bielimî!»



Li havinê min dîsa şivantî dikir; lê îcar bi min re kitêbek jî hebû.



Li havinê min disa şivantî dikir; lê îcar bi min re kitêbek jî hebû.



Li havînê min disa şivantî dikir; lê îcar bi min re kitêbek jî hebû.

Ji pesin û hezkirina Mielîme, ez ewqas bextiyar bûm ku min ne dizanî çi bêjim û çi bikim, ez gelek sor bûm û hindik mabû ez ji dilxweşiyê bigirîm...

Ez bi marûsiya re dost bûm, lê zaroyên Molokan hejî min ne dikirin, li min dixistin, ez diheqirandim û ne dihiştim ku ez bixwînim. Marûsiya ez ji wan dipirastim, diket navbera me û bi xweşî dixiste serê wan da ku dev ji min berdin.

Bi vî awayî, zanîna min li dibistana gund destpêkir.

Li havînê, gava dibistan girtî bû, min şivantî dikir, lê nihu, DI TURIKÊ MIN DE, LI CEM PERÇEKÎ NAN, KITÊBEK JÎ HEBÛ, min tê de, tiştên ji berê de elimî, dîsa dixwendin. Li zivistanê, wek berê, min li dibistanê dixwend û karên xwe jî dikirin.

Bi pêşveçûna xwe, ez peşiyê sinifê bûm û min gelek numereyên baş distandin: giş 9 û 10; şagirdên dewlemend û tîral, ji min didexisîn û diranên xwe li min qîj dikirin, lê min guh ne dida wan û heyfa min bi wan dihat.

Ûsa, di çend salan de, min dibistana gund qedand û xwendin û nivîsandin girtin.

Rojek, bavê min xurcîn vekir, jê desteyek kaxitên kevin derêxist û ji min xwest ku ez jê re pasaporta wî pêyda bikim. Nihu bihar hatibû û ji me re pasport lazim bû, ji ber ku, me dixwest em xwe neqlî bajarê Vladîqars bikin. Bi zanîna xwe, min xwe dinepixand û yek bi yek min ew kaxit giş dixwendin; di nav wan de, wesîqeya jêrîn kete berçavên min.

## Emir..

Ez emir didim mixtarê gundan û bajaran ku ji bod îtina mehîneke boz, esîl û rana wê ya çep damxakirî, arikariya Şemoyê Adil bikin. Heçî bi emrê min nake, ewê bête ceza kirin.

## Imza

Serekê Polîsa mintiqa Qizil Çak-Çak.

Ez şaş ma bûm... Gelo çavê min di wextekê de zilamekî hikûmetê bû, ji ber ku di emir de hatibû gotin ku diviya bû hemî mixtar arîkariya bavo bikin, yan na ewê berpirsiyar biwana...? Bavê min ji dil kenî û gote min ku berî çend salan, ew li gundê Qizil Çak-Çak şivan bû, û serekê polîsa vê minteqê jî li wê rûdinişt. Rojek mehîna wî winda bû bû û bavê min ne dikarî wê pêyda bike, hingê, Serekê Polîsa ku gelek hej mehîna xwe dikir, ji bavê min re emrekî nivîsandî da bû; ewî jî bi arîkariya mixtaran mehîn bi dest xisti bû. Bavo gote min ku wê rojê ha bi xwe, ez hatibûm dinê, bi awakî welê ku ew wesîqa, bi tarîxa 28 çiriya pêşîn 1898, nifûsa min bi xwe bû.

Piştî ku min dibistana gund qedand, bi mideteke piçûk, em ji Aleksendrovka derketin û berî çûn gundê Vladîqars, ji wê jî, saleke dî, cem kurdên koçer, da ku li wê dîsa, şivantiyê bikin.

Di gundên kurdan de yên li aliyê me, xudîkirina pez ne wek a Molokan e, li cem van koçeran, di welatê çiyan de hayat bi timamî, bi awakî din bû.

## 6-«Baro-dan»-Cejna biharê

Jiyîn di gundekî de kurd de, ne wek ya gundên Molokan e, li wê, ê bêtir bi ziraetê mijûl dibin. Kurd xwedî pez in, û li çiyayên bi têr çêre rûdinin. Çêreyên çiyan dewlemendiya welêt pêk tînin, bi deh hezaran pez li wê diçêrin, goşt û bez digrin.

Li zivistanê, çiya bi berfa stûr pêçandî ne lê li bin tîrêjên rojên biharê yên pêşîn tebiat zû vedinije. Berf dikele, erd nerm dibe, hêşinayî û kulîlk, qûntarên çiya dixemilînin.

Li çiyan, hewa siviktir e û wek li newalan ne germ e. Ji lewre li wê, li havînê bi xwe, giya tu caran hişk na be. Şûna giyayên hişk bûyî, giyayên dinên ter derdikevin, û kulîlk ciyên xwe ji yên nû re dihêlin. Pez her gav çêriyên ter li ber

xwe dibîne, û ji sibê heya êvarê bêî ku ji gemiryê aciz bibe, diçêre. Li wê, wek li newalan, pez ji puşî, mêşên mezin û heşeratên din aciz nabe. Li ser darên çiyan bi hezaran têyir bi hev re difirin û nêçîra kelmêş û mêşa dikin.

Hema berf dihele, giya şîn dibe, û kulîlk vedibin, gundê kurd xwe tev dide Serê sibê zû, çûn û hatin destpê dike, kurd xwe pêk tînin da bi keriyên xwe ve herin lêfa...

Kurdan li lêfan gelek bala xwe didin berxên nû zayî, wan xweş têr dikin, da ku zû mezin bin, û bikaribin gava dinya dibe germ, derkevin zozanan.

Li zozanan, kurda, bi awakî xas, dicivin hev û bi navê «obe» ji 40 heya 80 êl pêktînin, da bikaribin tevde, li çiyan keriyên xwe biçêrînin: Li serê her «obe» «Oba Başîyek» heye, endamê dewlementir û bi nifûztirê xudiyên pez. Her tişt di bin emrê wî deye. Ew bêş davêje ser xelkê, ciyê çêreyan nîşan dide û wextê zivirandina wan dibêje. Ew merkez bi întixabê dibû û gelek bi şeref bû, diviya bû her kes bê lam û cîm emrên «Obe Başî» bi cî bîne. «Obe Başî» hemen, hergav serekê qebîle ye û li ber çavên feqîr û karkeran hakimê mitleq e. Ji lewre, li ser şivanan wacib e ji şixulên xwe yên şivantiyê pêve, hemî karên «Obe Başî» jî bê pere biqedînin: anîna pezê wî konê, her êvar jimartina wî, her sibê paqij kirina govan û derêxistina ziblê derve.

Li gundê Kelcha Reş em bûne şivan. Em di meha sibatê de hatinê, û hema giya di nevalan de şîn bû me pez da hev û me ew bire lêfan.

Li gora adetên wî ciyî, piştî pez digehe lêfan û dest bi zayînê dike, her kurdê dewlemend pezekî serjêdike, xwarin dirust dike, cîran û şivan diezimîne. Xudiyê pez û jina wî bi destê xwe xwarin didin mêvanên xwe. Piştî xwarinê, xort stran dihêjin û bi şivanan re direqisin. Gava cejin diqede, her kes sipasên xwe pêşkeşî mêvandarê xwe dike û dia dike ku jina wî li havînê gelek rûn û penîr pêk bîne, ku tu nexweşî neyête pez û ku zozan bixweşî here serî.

Wê rojê ha, mêvandar gelek comerdî nîşan dan û ewqas nan û goştdan me ku çar rojan têra xelkê malên me kir.

Kurdan ji vê cejnê re «Serê Pez» dibêjin. Di heyata xwe de cara pêşîn bû ku min ev tişt didît û jê hêyran mabûm; lê yadê û bavo dikeniyan û digotin ku «Serê pez» ne cejneke ewqas mezin e, lêdi nêzîkê de, «Baro Dan», roja salê ya xweştir, wê bê. Ez ji bê sebir, li benda «Baro danê» dimam.

Ji roja ku berxik hinek mezin ûxurt bûn û berf hîn bêtir li çiyan helîya, Obe-Başî roja «Barodan», ango derketina pez ji lêfaber bi zozanan ve, tayin kir. Berî hefteyek her kes haziriya xwe ji vê rojê re dikir. Ev roj bi xwe hat.

Serê sibê, xelk, giş cilên xweşik ên cejnê li xwe dikin. Keçên ciwan, cilên bi rengên ronak û têrzînet wergirtî, serên xwe bi kulîlkên ter dixemilandin, û xizêm datanîn bèvilên xwe. Kurda, li stûyê mî, beran û bizinên xwe gulîkên rengareng danîbûn, û liyên çêtirên ji wan jîzingil daleqandibûn. Piştire ew berdabûn nav pez û saeta meşê tayin kiribûn

Ber bi rê derketina meve, roj li ifiq qederek bilind bû bû. Ezman safî û bê ewir bû, hewa bi xweşiya germiya rojekê biharê û bi bêhna kulilkan dagirtî bû. Her tişt pêkhatî bû û Obe-Başî emrê seferê da. Li pêşiya «Baro-Dan» bi cilê xwe yê xweşiktir û bilûra wî di dest de, ser şivan dimeşiya. Ewî wezîfeya serfermendar dikir; ji şivanên xort re, ji bo îdareya berxikên piçûk û miyên neban talîmat didan. Li dû Serşivan nerîyê spehîtir dihat, li stuyê wî zingilê mestir danîbûn. paşê gotin, min ku ewî noteya bilintir lêdixist.

Berê em bi rê kevin, axa banî şivanên xwe dikirin û ji wan re digotin: «Bi girtina te ji xwe re şivan, ez ji te dixwazim ku tu wezîfeya xwe baş bi cî bînî û qenc bala xwe bidî pezê min.»

Gava tenbîhat qediyan, serşivan dest bi blûra xwe kir û em giş bi rê ketin. Keriyê me bi nîzam li dû şivan diçû û

duşivan û zaro li her du alî, vir da, wê da, bazdidan, ne dihiştin ku nîzam xirab be, û bi kopalên xwe, an bi fîkandineke xas, di nav kerî de, ji ber pezî re ciyê wî nîşan didan.

Ji vê rojê heya nihu, gelek sal derbaz bûne, lê tesîrên cejna Baro Dan a pêşîn, di bîra min de, pir vejandî mane. Her wekî îro bû, ez li ber xwe, rûyên biken ên zaro, xort û şivanan dibînim û stranên wan dibihîsim. Cilên bi neqiş yên keçikên delal û serê wan ên bi kulîlkan xemilandî di ber çavên min re derbas dibin. Newal giş bi heşinayiyê pêçandî ye. Li her derê, ronahiya rojê diçirise û li dûr, çiya hîn li hin berfê ne. Barîna mî û ya berxikan, stranên Şivan û xortan li dûr, di newalan de ekis dikin, û gundî ji malên xwe derdikevin û tên sêyra me.

Ev tişt, di salê de du caran çêdibin, li Biharê, gava pez dibin zozanan, û li payîzê dereng, gava ji zozanan vedigerin mal. Divê ji bîr ne kin ku dewlemendiya kurdên koçer gî di keriyên wan de ye. Kurdan ji şîr, ne bitenê penîr û rûnê xwe yên salekê derdixînin, lê jê gelek jî dibin bajaran û li wê digel hirî û pezên xwe yên zêde, wan difroşin, û bi vî awayî bêşê xwe didin û ji kifletên xwe re tiştên lazim dikirin. Ûsa, qet ne ecêb e ku kurdan, çûn û vegera, zozana di heyata xwe de bûyerên hêja bigirin û wan wek cejnên mezin bihesibînin.

## 7-Li Zozanan

Xort, piştî ku çend kîlometir, bi germî, bi me re meşiyan, em berdan û vegeriyan malên xwe, lê şivan û duşivan zadên wan li pişt wan, hêdî, hêdî, dom bi riya xwe dikirin. Adetî, roja ewil mesafeyeke piçûk dibirin, piştire, her roj, hin bi hin wê zêde dikim da ku pez gelek newestînin û wî hînî cîguhirandinê bikin.

Kerî, ji hev û du hinek dûr, li du hev, bi rê ve diçûn. Li qonaxa pêşîn, em hinek rawestan da ku pez hinek bêhna xwe bistîne û biçêre. Hingê, bavê min, wek serekşivan, ji

me re, desbi parkirina diyariyên ku axeyan dabûn me, kir: nan‘ goşt. helaw û mêyweyên hişk kiri. Heya hatina axan, bavê min wekîlê wan bû. Li rê, êvaran, şivan dihatin cem bavo û şîret jè distandin. Gelek pirsa jê dikirin: Ji bo istiraheta mî û berxikan çend carrawestan diviya bû, çend car ji wan re avdan lazim bû...?

Li warê pêşin, em bi tena xwe pir neman. Piştî çar rojan, axên me bi kifletên xwe ve hatin û di cî de konên xwe danîn.

Konên kurdên dewlemend, gelek mezin, û bi çar, pênc çîtan ji hev veqetandî, bi mehfûr û secadeyan raxistî bûn. Kon, hîn ji wan ji hev dûr hinekan jî li cem hev, li quntarên çiyan, li nêzîkî tehtan, lehî û robarên çiyan, dihatin danîn. Ji dûr, evkonên reş, wek warekî eskerî, dixuyan. Di van robaran de, masiyên berad hebûn, ku di wê wextê de, ber bi kaniyan ve derdiketin Her kes xwe, li wê, şidiyayî û şêntir dihesiya û şixul ji me re xweş û hêsanîtir dihat. Zaroyên axan, ji sibê heya êvarê, li derve diman, dilêystin, di robarên nêzîk de, masî digirtin, û li çêre giya diçinîn.

Jiyîna şivana, bi awakî din bû. Li vir jî, dewlemendên kurd ji yên Molokan kêmtir em ne diêşandin, Li vir jî em perişan û bedbext bûn. Di hatina me ji destê ber bi zozana ve, di ser kevir û zinaran re em pêxas gihaştibûn jor. Ji dirih û daran, cilên me diqetiyan û em bi kincê zerzilî diman, wek li cem Molokan. Malê min ji van tiştan pêve ne bû: Kulavê şivaniyê ku bi şev min xwe pê dipêçand, turikê xwey, perçeyek nan û piyanek. Carna, ji şivana hinek şîr min bi dest dixist. Diviya bû ku xwarina germ tu car neyê bîra me. Digel vêyekê, halê min dîsa ji yên din hinek çêtir bû. Her du, sê, hefte carek, min dikarî serekî bidim mal, û li wê ji destê diya xwe, xwarinekegerm bixwim. Bav û birayên min, hîn ji me bijortir, pezê mêşin diçêrandin; di şiverêyeke welê re ku pezê biqiloç nikaribû derbaz be. Ewan bi mehan rûyê mal, ne didîtin.

Li ber destê min kerek hebû ku pê, carna, berxek ne-

xweş an ling şikestî, min tanî mal. Hurmirê min jî giş, li ser pişta vî kerî bû. Şivana hem û, 24 saetên xwe li bin ezmên derbas didikirin. Wextê baran û bager, min xwe li bin beriha, di şikeft an di quncikeke şil de, vedişart û bê agir, bi cilên xwe yên şil, bi saetan ve, li wê, ji sermê dilerizîm. Carna, bi heftan, heta bi mehan ve, min dengê tu însan ne dibihîst.

Di jiyîna xwe de, li ciyên kuvî, em her gav li ber xetera mirinê bûn. Me pez, ji tada guran, ji çeteyên dizan, ji herikandina sîpanên berfê û ji gundirbûna keviran diparast. Carna, kevirên mezin ji serê çiyan bi dengekî gur digundirîn û li ber xwe çi hebû, dibirin newalan.

Bi rojan, em li palên çiyayên asê, di kenarên zinaran re, û di kortalan de dimeşiyan, pez ji ciyên bi xeter bi dûr dixist û bala xwe dida ku tu ziyan negihê axayên me. Carna bı strandin, an bi fîkandin, bê tirs û telaş, wek pez kuviya, ji tehtekê me xwe davête tehteke din. Lê, piştire, me li jêr dinêrî, û li bin xwe, newala, an kortalên kûr ên bi lehiyan, didîtin, tirs dikete dilê me û em jê gêj dibûn. Her wekî dibêjin: Ji mirinê, em bi tiliyekê, dûr bûn. Lê, li miqabilê van, laşê me xurt, û hisên me tûj dibûn. Di cî de, bi roj an bi şev, gava tiştekî xerîb xwe nêzîkî me dikir, em pê dihesiyan û dengên gelek nizm, zû digihaştin guhên me.

## 8-Lêstikên me.

Car, car, duşivana keriyên xwe nêzîkî hev dikirin û bi xweşî bi hev re dilêyistin. Hin ji lêystikên me ji yên kevin bûn ku ji piçûkahiya xwe de me dizanîn, lê hin jê, me bi xwe derdixistin. Ewjî pir caran reqis û stran bûn. Mesela, me destên hev digirtin û me heleqeyek çêdikir; yekî ji me distrand û ên din jî bi dengekî lê divegerand.

Yek ji stranênme ev bû:

Lo Şivano, lo, lo Şivano, dil bi kulo, dil kovano.!
Navè Şivanê'm Elî ye, pez berda dora gelî ye.
Lo Şivano, lo, lo Şivano, dil bi kulo, dil kovano!

Blûra Şivan'm zêytùn e, pir bedew û şikil cune,
Bi wî dengê xwe yê xweş ew, di blurê de dixune .
Lo Şivano, lo, lo Şivano. dil bi kulo, dil kovana!

Lê keçikê, lê bedewê, navzirav û laşqelewê!
Gava çavê m'le dikeve narazim ez roj û şewê.
Çavên te î di reş kuştim ax û eman gidiyano!

Me stranên kevin ên li ser egîdan jî, digotin. Wan zilama ku bi mêranî, ji bo bi destxistina çêreyên baştir, xwe davêtin ser kurdên din, ew dikuştin, an ew bi xwe dihatin kuştin.

Carna, me bêhna xwe, bi şerê berana jî derdixist, Ji nav keriyên xwe, li heranên xurt û şerker digeriyan, ew berdidan hev û seyra wan dikir. Karkirî ji me ew bû ku beranê wî bera yên dîtir dida.

Ev lêstikên me bi dizî çêdibûn. Axeya qebûl nedikir ku em keriyên xwe bînin cem hev; ji tirsa ku pez têr nexwè û goşt negirê...

Di tenhaîa me de, teseliya me ya bingehîn, blûra me bù. Her yekî ji me yeke wê hebû û xweş lêdixist. Blûr bi kêrî gelek tiştan dihat: Bi hewakî hezîn, me pez û kerî li hev didan, bi ahengeke din me ew dibirin avê, dîsa bi nexmeke din me banî yên winda bûyî dikir. Hêdî, hêdî me ew hînî deng û nexmeyan dikir. Gava berxik hin gelek piçûk bûn û me ew dibirin avdanê, me ji wan re, bi awakî welê dixist ku li ciyên din nayê lêxistin. Gava me xwey dida wan, dîsa bi hewakî xas me ew didan hev.

Berxên me zû dîelimîn dengên blûra û ew ji hev gelek xweş feriq dikirin. Kîjan deng ji bo kîjan sebebê bû, zû dikete guhê wan û li gora wî dikirin.

## 9-Ji Zozana veger-Cejna Payizê «Beran Berdan»

Koçeriya kurdên xwedî pez ne bê sebeb e. Li biharê di newalan de berf zû û li çiyan dereng, dihele. Berf, li quntarên jêrîn despêdike û hêdî, hêdî, her hefte, li ciyên ku berf li wê winda dibe, li bin germiya rojê, erd şîn dibe û bi giyayên ter tê raxistin. Bi berfê re ku hin bi hin xwe bi şûnda dide, koçer bi keriyên xwe ve, hîn ber bi bilindahiyê ve derdikevin. Li payizê, piştî nîvê çiriya pêşîn, tev dan ber meqlûb destpê dike. Li newala baran û li çiyayên bilind berf, dikevin; Kurda jî, bi keriyên xwe ve, ji ber berfê direvin, berê xwe didin jêr û digehin warên xwe yên berê; li wê, nihu giya ku li havînê hişk bûbûn, ji nû ve, ter derdikevin. Piştire, di dawiya payîzê de, pez dadikeve newalên ku hîn berf li wê ne ketiye, eger bikeve jî zû dihele û qet xwe nagire. Digel vê yekê, berf dereng namîne ku bigehe newalan jî, hingê, xwediyên pez bi keriyên xwe re vedigerin wargehên xwe yên zivistanê.

Kurda, vê vegera payîzê bûyereke bi xêyir dihesibînin; ji ber ku rojên zozana her xweştir û serbestir bin jî, ne bê xeter in. Ev dem bi xweşî digehe dawiya xwe û kerî bi selametî vedigerin ciyên xwe û şivan jî kiriya xwe ya havînê timam, ji axayê xwe werdigirin. Digel vê yekê, ev roj ne wek a (Cejna Biharê) ye. Di vê de kêmtir tevdan û can heye. Guhirandina mewsim li ser nefsa kurda tesîreke mezin dike. Ev tesîr, di dema hatina rojên payizê yên bi mij û baran de, hîn bêtir xuya dike. Yek dibê qey pez bi xwe bi vê guhirandinê dihese. Gava min pezê xwe ji zozana ber bi germiyana ve dibir, welê ji min re dixuya ku beywan, bi serên xwe yên, bi awakî dilşkestî xwar kirî, ji borîna rojên serbestî yên çiyan poşman bûne, û naxwazin vegerin govên teng, û heya dawiya zivistanê, ji azadî mehrûm, tê de bimînin.

Lê heyat bi ihtiyac û zerûretên xwe, me her gav bin dest dike. Jinên xweyî pez, li ser riya vegera mal, ji hev dipirsin eger havîn xweş derbaz bû an na? Bi hev re hêsab dikin, û ji hev dipirsin her yekê ji wan, çiqa, rûn, penîr û cacî li hev daye?

Kurdên dewlemend, bi xirabî û bi hesûdiyê, qala kurdên feqîr, ku rexma kêmaniya pezên xwe, bi xebat û zîrekiya xwe bi nisbeta wan, gelek rûn û penîr, çêkiribûn. Zilama hêsab dikir, çiqa rûn, penîr û hirî bikaribin bifroşin û bi pereyê wan ji xwe re genim û ce bikirin. Kurdên koçer ku bi piranî bi xwedî kirina pez îdare xwe dikin, bi çandiniyê mijûl nabin. Ji lewre mecbûr in dexlê xwe bikirin. Ev, ji bo wan meseleyeke gelek dijwar e.

Îşê peyda kirina çêreyê zivistanê jî ne hêsanî ye. Her wekî, koçer, li havînê ji pezê xwe re ji bo zivistanê tu êm pêk nayinin di zivistanê de pezê xwe derdixînin çêreya.

Pîreka bi tiştên ku ji çerçiya kirînê, xwe dinepixînin û wan şanî hev dikin: Destmal, derzî, ta, biçkov, kibrît, û zînetên por. Xort û keç sirên xwe dibêjine hev; ji xwe re kê û kêdergistî girtine û wan bistînin an na? Dilketiya behsa rojên bex tiyarî yên zozana dikin, û ciyên ku bi delalên xwe re, bi saetan, li wê diman, tînin bîra xwe: kaniyên ku ji ava wan vexwarin, şevên tavheyivê, gava bi tena xwe ji çavên xelkê dûr, li bin stêra, li serê çiyan, di nav kulîlk û heşînayîyê de, deqîqeyên jiyîna xwe yên xweştir derbaz dikirin, lawika digotin û direqisîn, û di dawiyê de, bi navê xwedê sond dixwarin ku heya mirinê ji hev re sadiq bimînin. Ev tişt nihu, giş, dihatin ber çavên wan û pê dilê wan davêt.

Keç diyariyên ku ji dostên xwe standibûn, şanî hevalên xwe didin: gustîlkên zîv, ên paxir, eynikeke dora wê zêr kirî, mirariyên rengareng.

Xort jî ji aliyê xwe bediyeyên xwe şanî hevala dikin: Destmal, cizdanên neqiş kirî, kirasên bineqşên hevrîşim, goreyên hirî, lepik,,,... Ev giş, û li dora wan, giyayên zer, kulîlkên hişk bûyî, dar bi pelên xwe yên çilmisî, ezmana tarî û bayên hişk, deriyên zivistanê vedikin û li benda wê disekinin.

Bi vî awayî, kurdên koçer bi kiflet û keriyên xwe ve li ser riyên bi herî, ber bi warên zivistanê ve dimeşin. Gava

digehinê, pîrek hurmirên xwe zû saz dikin, tiştên ji çiya anî bi cî dikin, pez dijmêrin û karên xwe pêktînin.

Piştire cejna (BERAN BERDAN) tê. Ji vê re, ji her kesî bêtir, kêfa şivan û ya duşivana tê. Di vê rojê de, karê wan xilas dibe û kiriya xwe ya havînê ji axên xwe distînin. Roja (BERAN BERDAN) ê, mî dixin govekê bi tenê û berranên tovê ku, li havînê, ji wan cuda diçêriyan, berdidin nav wan. Ûsa dikin ku li biharê, giş di carekê de bizên.

Gava beran berdidin nav miyan, kurd tifinga berdidin, herwekî şahîneta ziywaca miyên xwe dikin. Wê rojê ha, xwarinên rengareng çêdikin, xelkê diezimînin, banî belengaza dikin û ji wan rexwarin didin.

Keçên ciwan, destmalên xwe ji serê xwe dikin û wan davêjin stûyê beranên hêjatir, û xort jî diçin destmalên keçên ku hez dikin û dixwazin bistînin, direvînin. Dê û bav hala xwe didin ka kîjan xort destmalê keça wan distîne. Bi vî awayî dizanin ku keça wan li havînê, bi vî xortî re li hev hatiye û di dilê wê de heye ku wî bistîne. Eger dê û bav razî dibin, nîşana wan tête birin û piştî demekê jî, daweta wan çêdibe.

Piştî cejna (BERAN BERDAN), xwediyên pez hisêba şivanên xwe didîtin. Şivanekî, jibo xebata xwe ya havînê, ji 8 heya 9 pez distandin û duşivan jî, ji 3 heya 5. Li gora adetên ciyî li ser her 25 serî, şivanekî pezek distand. Bi vê hisêbê, xwediyê 200 an 250 pezî, diviya bû 10 an 15 pez bide şivanê xwe, ev jî li gora dijwarî û zehmetên ku dihatin kişandin, ne tu tişt bû. Lê, bi ser de, her xwediyê pez, bi awakî din em dixapandin. Ew bi cîranên xwe li hev dibatin, miqabilê pere, keriyên wan jî bi yên xwe re dibirin zozana, û bi vî awayî, 200, 300, serî beî ku tiştekî bidin şivana, didan çêrandin.

Digel vê yekê, rexma kêmbûna kiriya me, li cem kurda halê me ji yê li cem Molokan, çêtir bû. Ji bo mîyekê ji aliyê gura revandî, an dirandî, kurdan ji heqên me ne dibirî û wek Molokan, bi bêinsafî ewqas, li me ne dixist. Jê pêve heqê

her şivan hebû ku li havînê ji xwe re, bi dilê xwedî, pezekî serjêke. Ji bo sivik kirina perîşaniya me, ev tiştekî gelek giranbiha bû.

## 10-Pezên Winda Bûyî-Mirina Brakî

Havîna dîtir dîsa li gundê Keleha Reş li cem Baroyê Evdê em bûn şivan. Bavo, her du brayên min û ez, me çêrandina hemû pezên wî, li ser xwe girt. Me gelek bi xweşî karê xwe pêk tanî; me guh dida gotinên bavo û bi xwe jê şîret dipirsîn. Bavo' êdî pîr bûbû û çêrandina pez êdî jê re pir zehmet dihat. Me bi tena xwe şixul dikir û ne dihişt ku bavo gelek biweste. Ewî bi tenê bi roj rabet dikir û bi şev, her wekî baweriya wî bi me ne dihat, ew bi xwe diçû ber pez. Ewî digote me ku xort bi şev nikarin, heya sibê bê xew bimînin, û ku bi şev, diz bi tifinga têne pez. Gura jî bi şev, bêtir xwe davêjin keriya, û bawerî bi kuçika jî; bi tenê, nabe.

Gava dibû şev, bavo, kincên stûr li xwe dikirin, çifta xwe digirt, nizim difikand û çavên xwe di tariyê de digerandin. Ji kuçika re ciyê sekna wan nîşan dida û li wê ew didan vezelandin û nobet girtin. Bi tenê Bêlas, seyê hêja, tum bi wî re dima û bi bihustek jê ne di bû.

Rojekê, serê sibê, gava em şiyar bûn, brayê min Bro ne li mal bû. Em gelek lê geriyan û li tu dera me ew peyda ne kir. Bi vî, awayî, ez û Derwêş bitenê li ber pez man. Piştî çend mehên din hin kurd gotin me ku Bro li gundekî dûr, şivantî dikir. Bavê min, di cî de bi rê ket û çû wî bîne. Lê Bro ne xwest vegere û got ku li mal bi têra xwe ne dixwar, ku kifletên malê gelek bûn û çêtir bû jê re ku bi tena xwe bişixule; qet ne be bi vî awayî ewê birçî ne mîne. Bavo û yadê gelek li ber ketin, lê, bê feyde bû, Bro xistibû eqlê xwe ku bi tena xwe bimîne.

Havîn bi xweşî derbas bû, lê, li payizê felaketek hate serê me. Ji keriyê me sê pez winda bûn. Bavê min pir li wan geriya, lê, taba wî vala çû. Ji bê umîdî, çû cem falçiyekê, ewê jî gotê ku şivan Mîrza Temo ew dizîne. Bavo çû cem, xeber danê û jê xwest an peza an heqê wan bidiyê. Şivanê reben sond dixwar ku haya wî jê ne bû. Lê bavo, jê bêtir bi goti

nên falçiyê baweriya xwe anî û bi xeyd çû cem Mûsa beg, sereké eşîra Mîrza Temo. Beg gelek bi nifûz bû, çi dixwest dikir. Da kugiliyên bavê min bibihîse, jê berxek xwest Bavo qaîl bû û bi vî awyî ketdîwana wî û gotê ku li gora fala qereçî, Mîrza Temo sê pezên wî dizîne. Mîrza Temoyê reben, ku tu cara dizî ne kiribû, bi sond û yemîn xwe xilas ne kir, Mûsa beg, bi zor; sê pez jê standin, lê şûna ku wan bide bavê min, ew ji xwe re biştin. Bavê min ji vê miamelê pir aciz û dilşkestî bû; du, sê car çû cem beg û pez jê xwestin. Lê Mûsa beg gub ne dayê û dawiyê gotê ku eger dom bi telebên xwe bike, ewê wê bide girtin û lêxistin. Bavê min dizanî ku her tişt ji destê beg tê, tirsiya û nema bi ser de çû. Me êdî dizanî ku, pezên me winda bûne, û bi wan re, kiriya me ya bavînê jî. Em li ber diketin, hêstir di çavên me re dihatin xwar û me digo ku bela li pişt hev, wek kevirên giran, têne ser me.

Êvareke xweş a payizê, ez, bavo û birayê min Derwêş, gava em li çolê rûniştibûn û me'nanê xwe dixwar, kurdek, ku me ne dinasî, bate cem me.

Kurd, qedrê mivana ne bi tenê li mal, lê li çolê jî digirin, ji lewre, bavo di cî de çû, şîr doşî, xwarin û vexwarin, danîn ber mêvanê me, jê re li ser kulavekî nivînek çêkir û piştire jê pirsî ka ewê bi çi dikaribû arîkariya wî bike. Mêvanê me piştî ku spasên xwe pêşkeşî me kirin, gote ku ev e çil roj in ku, sê pezên biyanî ketine nav keriyê wî û pê re diçêrin; ji xelkê pirsî bû û gotibûnê ku ême ne, ji lewre hatibû xeberê bide me.

Ji vê xeberê em ewqa kêfxweş bûn ku me ne dizanî ji bin qenciya ku vî zilamî bi me dikir, çawa derkevin... Piştire me bi hev rexeber da; welê derket ku mevanê me ji wek me şivanekî bi icret bû û ku ev bela bi xwe, rojek hatibû serê wî jî, ji lewre dilê wî bi me ve mabû û ewqa zehmet dabû xwe ku vê xeberê bigebîne me.

Roja dîtir ez pê re çûm da ku her sê peza bînim. Gava

em nêzîkî kerî hatin, şivan û duşivan xwe li dora me çivandin û ji min xwestin ku ez pezên xwe binasim...

Ji dûr, min li keriyê mezin nêrî; ûsa, bê imkan bu ku ez wan ji nav ewqas heywanan, derêxim. Hingê ez derketim ser tekteke bilind, û di cî de min dît ku her sê pez, her wekî biyanî ne, bi tena xwe diçêrin.

Şivana pesnê min dan û gotin ku ez pisporekî hêja me. Piştire ez sekinandin ji bo xwarina goştekî biraştî, bi isûla şivana: Piştî ku berxekî qelew gurandin û postê wî jê derêxistin, goştê wî kur kirin, giyayên bi bihin û sîrik danîn tê de, û dîsa ev goşt xistin nav çermê. Di vê gavê de, duşivan, li erdê ciyek ne gelek kûr kolabûn, postê goşt tê de xistinê de, ax li ser kirin û li ser wê jî agireke mezin dadan. Du, sê saet bi şûnda, agir û ax ji ser de avêtin, û hêdî, hêdî, postê goşt tê de, derêxistin û ew danîn di nav beroşa de.

Bêhna goştê biraştî, bi vî awayî iştiha me vejand, bi xwe ji sibê da me tiştek tam ne kiribû. Bêhna giya, ewqas xweş, bû, goşt ewqas tamdar dixuya ku bê aram (sebir), em li benda xwarinê diman. her wekî şivan li cem hev bi isûl, bi heleqe rûdiniştin, min xwe digirt ku be edebî nekim û berî wan xwe nevêjin sifrê.

Piştî xwarinê ez vegeriyam mal. Bavê min minasib dî ku here cem Mîrza Temo û efwa xwe jê bixwaze. Lê, begê zalim guh ne dida feqîrên weq me û Mîrza Temo; ji lewre, ewî her sê pezên Mîrzayê reben, jè re venegerandin. Qereçî jî, ji derketina pezên me beicî û derewên wê li her derê hatin bihîstin û êdî tu kesî miraceata wê bi tu tiştî ne kir.

Havîn dîsa derbas bû. Du wê, payiz bi mij, baran û bi bayên xwe yên cemidî, bi ser me de girt. Brayê min Derwêş, bi nexweşiyekê ketibû, tum ser û parsuyên wî diêşiyan û roj bi roj êşa wî zêdetir dibû. Bi zor dikarî li du kerî bimeşe û hin, bi hin ji taqet diket. Dawiyê kete nav nivîna. Bavê min çû cem hekîmekî kurmancî. Ewî tewsiye kir ku tenur gerim bikin, pezekî serjêkin, çermê wî derênin, brayê min tê de bi-

pêçin û wî mideteke, li ser devê tenûrê bigirin û rojê, du, sê car vî tiştî tekrar bikin.

Bavo û yadê gotinên hekîm, yek bi yek bi cî anîn. Bi ser de jî, hekîm ji brayê min du sê car xwîn berda, di nav şîr de kilis keland û ew danî ser singa wî. Van dermanên ha tu tesîreke baş ne da. Brayê min, hin bi hin, ber bi mirinê ve diçû. Bavo, dilşkestî, miraceata şêxa kir. Lê, ewanjî, ji êşa reben re tu çare ne dîtin û Derwêş terka me da û ji destê me çû. Bê wî ji êdî bavo pîr bûyî, ne dikarî keriyên mezin îdare bike. Ji wê rojê bi şûnda, li cem zilamên bi pezên hindik şivantî kir. Bi vî îşî dikarî bê berdest jî rabe. Ser xwestina wî, ez çûm bajêr, da ku ji xwe re karekî peyda bikim, qet nebe, yê dergevaniyê. Belê, bi şivantiyê, êdî me ne dikarî nanê xwe derêxin, û ji zûda bi xwe, me bi têra xwe ne dixwar.

## II-Li Bajêr-Serê emperialîstan Cenga mezin a Pêşîn.

Cîranên me xwe pêk tanîn ku herine bajêr, li wê genim û cehên xwe bifroşin û bi pereyê wan ji xwe re şekir, çay cil û caw û tiştên dîtir ku ji wan re, ji bo zivistanê, hewce bûn, bikirin.

Diya min ji min re nan peht turek durit, cilên min ên qetiya yî çêkirin, û bi şev, min xwe gihande kervanekê erebiyan û di du rojan de, em gihaştin Qersê.

Bajarê Qersê, li milê çiyakî hatiye avakirin. Li serê çiyê, kelehekemezin heye. Li dora Qersê, li ciyên bilind gelek asêgeh hene; Bi xwe, Qers bajarekî eskerî ye. Kêfa min, gelek bi wan xaniyên, bi du, sê tebeq, bi kolanên kuç kirî û bi bexçeyên di heşinayiyê de xeriqî, dihat. Lê, ê bêtir ez lê hêyran dimam, mexzenên mezin bûn. Min ne dikarî ji ber cemekana ku li pişt wan ewqas tiştên bi texlît û spehî hebûn bi dûr xim. Ji bo peydakirina karekî ez li her derê bajêr gariyam û min ew xweş nas kir.

Ez li xanekê peya bûbûm û kiriya wê bi xebata xwe derdixist: Her sibê min axir paqij dikir û hewiş dimalî. Bi roj

ez li şixulekî digeriyam. Lê, her roj destvala dizivirîm xanê û pereyên min jî digihaştin dawiya xwe. Ji 25 kopek pêve, tu tiştê min ne ma bû. Yekê, hingê şîret li min kir ku ez herim febrîqeya kevirê xiram ku li Aleksendrovka vekiribûn, gundê ku berê me li wê şivantî dikir. Ez çûmê û li karxanê rastî Molokan hatim ku min bi wan re li dibistanê dixwend. Bi arîkariya wan, ez ketim şixul. Xebata min ev bû: Danîna kevirên ku ji bin axê derdixistin, di senduqan de. Qedrê 150 keç û xort bi vî îşî mijûl dibûn. Ev kar ne gelek çetin bû, min zû xwe hînî kir. Ji şefeq heya bi rojava, em dixebitîn, ango, qedrê yanzde saet û nîv li havînê, û deh saet li zivistanê; rojiya me jî, bi tenê, bi 30 kopek bû. Min kevirên baş û xirab ji hev ferq kirin; mehê, ji bona cûda kirina wan ji hev, ji min re 10 rûbil didan. Piştire min her du xwişkên xwe jî xistin xebatê. Gava ew hatin û bi cî bûn, me ji xwe re xanîyek bi tena xwe girt; welê halê me hinek xweş bû û me dikarî, ji bo dê û bavê xwe, çend kopek jî deynin alîkî. Di vê febrîqeyê de ez du sala xebitîm; gava em hîn li wê bûn, Cenga Emperiyalît (Serê mezinê pêşîn ku dewletên mezin kir ji bo xwin û mal xwarina miletên piçûk û paşde mayî), destpêkir.

Di payiza sala 1914 de, Ordiya sisiya ya Kozaka, hate gundê Alêksandrovka û li nêzîkî fabrîqeya me bi cî bû. Herwekî min bi rûsî dizanî, bi eskeran re ez zû bûm dost. Her êvar, banî min dikirin xwarin û nanê spî didane min. Rojên yekşembê; ez bi wan re diçûm çem; gava hespên xwe dişuştin min gelek arîkariya wan dikir. Eskerên Kozak û çend zabitên wan gelek hej min dikirin. Gava fermendarê wan bihîst ku ez baş bi kurdî, rûsî, ermenî û tirkî dizanim, ji min xwest ku mehê bi 25 rûbil, ez li ordiyê bimînim û bibim tercimanê wê. Xwişkên min digirîn, ne dixwestin ku ez terka wan bidim. Lê, 25 rûbil mehê, ji min re, ji hêstirên wan bihatir bûn; min guh ne da hêviyên wan û ez ketim ordiyê. Lê berê, min sê roj izin xwest da ku ez xwişkên xwe bibime mal û vegerim. Piştî ku min ev tişt bi cî anî min xwe xist ordiyê û min dest

bi xebata xwe kir. Digel bi cî anîna karên xwe yên tercimaniyê di navbera zabit, memûr û mixtaran de, diviya bû bi riyên wê minteqê ez giş bizanim, ji hespa re êm bikirim û bi tacira re jî bazar bikim.

Piştî hefteke, di bajarê Kajîzman re ber bi Sarîbûlax ve em bi rê ketin. Berê, em li ser cadê dimeşiyan, piştire, li ser qerara fermandar, em ketin şiveriyên gunda. Karê min pir dijwar bû: Min hem tercimanî, hem jî rêberî dikirin; diviya bû ez bi xelkê cî re xeber bidim û rê binasim. Pircara em bi şev dimeşiyan, li welatekî bi çiya, bi geliyên kûr, rêve çûn û rêderêxistin ne tiştekî hêsanî bûn; çar reyan ewqas pir bûn ku me xwe pir cara, şaş dikir. Gundiyên wê derê ji tesîra propagandeya tirka, hej Ûrisa ne dikir û reyên xelet şanî me didan. Carek kurd û Tirkên wê derê em xapandin. Gava zabitên me hesiyan ku em di reyekê xelet re diçûn, miawinê fermendar du qirbacên xweş li min xistin; di gel vê yekê tu sûç di min de ne bû. Welatê ku em tê re diçûn, gelek spehî bû. Lê pêşveçûn jî pir dijwar bû, girbûna kevira, zinarên bilind, kaşên asê û lehiyên çiyan, meşa me dereng dikir. Hespên ordiyê ne elimî bûn rêveçûnê. Li ciyekî, em bîst û pênc saet sekinîn, me solên hespa nû kirin û erheya selihandin. Jê pêve jî her ro, em hinek radiwestiyan; me bêhna xwe distand, xwarina çêdikirin û dixwarin.

Roja neha em gihaştin sinorê Tirkiyê. Esker li Sarîbûlax kom dibûn û li dirêjahiya geliyên kûr ên ji dijmin veşartî, konên xwe datanin. Piştî istirahеta çend rojan, eskerên Ûris derbazî tixûbê Tirkiyê bûn. Sê kîlometir ji Sarîqamîş wê da, şer despê kir. Top, tifing û mîtralyoz dinya li hev dida. Gurgira wan bi awakî dayimî, hewa dadigirt.

Karê me ew bû ku em di pişt çiyan re bizivirin û paşiya eskerên tirk bigirin. Di vê zivirînê de min rê winda kir; ji ber ku Kurdên koçer reyeke nerast şanî min da bûn. Piştî vê hadisê baweriya serekên min êdî bi minne ma. Welê hate wan ku min ew xapandibûn; ez ji tercimaniyê derêxistim, û ji bo du mehên xebatê bi tenê 7 rûbil dan min.

Heyif bû ku ez karekî welê berdim, lê tu tişt ji destê min ne dihat; min ne dikarî li cem kesî gili bikim. Ordiya me bi rê ket û li serê çiyan, bê çek, li welatekî nenas, ez bi tena xwe mam.

Bi kû da herim? Min qerara xwe da ku ez vegerim Sarîbûlax û ji wê jì herim Qiznefer, cem mêrê metika xwe ya mirî. Di van geliyên kûr de, tije dehbeyên kuvì, bi tena xweman ne tiştekî xweş bû. Bi dileki givaştî û teyizî, ez bi rê ketim û hêdî, hêdî. gava ez fikirîm ku ev ne cara pêşîn bû ku ez li ber xeterê dimam, cesaret hate min.


## 12-Hez kirin û jin xwestin.

Wek ez ditirsiyam ne bû; li rê, ez rastî tu serpêhatinê ne bûm. Sax, selîm, ez gihaştim Sarîbûlax û ji wê jî Qiznefer. Li wê, min merivên xwe zû peyda kirin. Mêrê metika min ez nas ne dikirim. Bi tenê ewî bihîstibû ku ez diçûm dibistanê û ku min bi xwendin û nivîsandinê dizanî. Ewî ez gelek bi xweşî qebûl kirim û pirsa xelkê mala me kir. Ecebmayî dima ku riya 50 kilometir, bê tirs, ez tena xwe hatî bim... Min jî ji wan re bikurtî, çawa ez li febrîqeya kevir dixebitim, çawa ez bûbûm terciman û çima ez jê hatibûm dêrêxistin, gote wî... Welê, qederê meheke, ez li cem apê xwe mam û di vê midetê de, di işên malê de, min arîkariya keça meta xwe, Gulê dikir. Em her du jî xort bûn; di vê meheke de, berê, em bi hev re bûn dost, piştire, bi rastî, dilê me kete hev. Bi hêvî û rica Gulê ji min dixwest ku ez wê mehir bikim; eger bavê wê bê dilî bikira, ez wê birevînim. MA LI CEM KURDA JI MESELA ZEWACÊ PÎSTIR ÇI HEYE? Min ji kû qelen peyda bikira? Ev, wek pozê çiyayê Axri yê bilintir li ber min disekinî. Ma ez rebentirê dinyayê ne bûm? Min ne pere, ne jî pez hebûn û min dizanî ku bavê Gulê wê bê qelen nade min. Li ser vê meselê ez û Gulê, em çiqa fikirîn. Gulê, heta, stiranek jî çêkir û tê de lanet li wana anî ku firotina jina kirine adeteke kirêt û genî.

Ji careke bêtir, bavê Gulê, zilamekî tirtire û bê dil, ku ji



Bi hêvî û rica, Gulê ji min dixwest ku ez wê mehir bikim.



Bi hêvî û rica, Gulê ji min dixwest ku ez wê mehir bikim.



Bi hêvî û rica, Gulê ji min dixwest ku ez wê mehir bikim.

aliyê tu kesê ne hatibû hez kirin, xwe têkilî axaftinên medikir Digo ku şêxê mezin, heta pêxemberê me bi xwe, jinên xwe bi qelen anîne; ne xwe, Xwedê bi xwe, ev adet danîye. Gulê cıwaba wî dida û digo ku bav, keçên xwe wek dewara difroşin, wek pezê adî, û, ji bo isbat gelek mîsal ji tanîn. Lê dawiya wan pevçûnan her girîn û hêstir bû. Gava min dît ku iştixalî bê feyde ye û em nikarin vî kalî şerût iqna bikin min gulê bire alîkî; min gotê ku divê xem nexwê, ku ezê bixebitim û qelenê wê pêkbînim.

Bajarê Sarîbûlax bûbû qerargeheke mezin. hemû eskerên ku diçûn eniyê an jê vedigeriyan, li wê kom dibûn. Gelek eskera li wê, ez wek tercimanê kevin dinasîm û ez bi xwe re dibirim xwarinê. Rojekê, serê sibê, eskerek hate mala me û gote min ku sereké qerargehê, Mîrelay Emerîk, min di cî de dixwaze da ku jê re tercimaniyê bikim. Min zû cilên xwe wergirtin û çûm Sarîbûlax. Di van rojan de, gundiyên dorê, gelek zad û qût anîbûn Ordiyê. Tu kes ji wan bi rûsî ne dizanî û tu rus jî bi zimanê wan fehim ne dikir.

Gava ez nêzîki erebeyan bûm, min dî ku fermendarê qerargehê bi xwe, li nav gundiyan sekiniye û dike, nake nikare ji wan fehim bike çima naxwazin pêştetir herin? Bi kurdî min ji wan pirsî: Gotin min ku dewarên wan ji tabê diketin û ku rê gelek asê bû. Ez çûm cem fermendar, min silaveke eskerî dayê û çi ji gundiyan bihîstibû, gotê. Fermendar li min nêrî, kenî û ji min pirsî eger min dixwest ez bi bimetercîman, min bi çend zimana dizanî, mehiya min berê li Ordiyê bi çibû û çima ez jê hatibûm derêxistin...? Min jê re vegerand ku ez bi Kurdî, bi Ermenî, bi Rûsî û bi Tirkî, dizanim û sebeba derketina xwe jî ji Ordiyê gotê. Fermendar ji zanînên min saş ma û ji min pirsî ka di kîjan dibistanên bilin de min xwendibû...? Min ji gotê ku ez kurd im, ku bi tenê rûsî min di dibistanê de xwendiye, ênmayî, min li cem tirk, û ermeniya şivatî kiriye û bi vî awayî, min zimanên wan girtine. Fermendar emir da ku çekê eskerî li min kin...

Bi karê min ê nû halê min gelek baş bû. Sarîbûlax nihu ji aliyê Drûjîna 593 ya Orengbûrg (Eskerên bi imir gelek mezin ku du cara eskertiya xwe kirine.) işxal kirin. Ji wan re «Ordiya Îsa» digotin, ew jî, jê gelek aciz dibûn. Carna erebeyên xwarin û zad gelek dereng dibatin û yekîneyên eskerî bê qût diman. Hingê, zabitê lewazim, Andrîev, miawinê wî Nikolayêv û ez, bi çend Kozaqan re, em diçûn gundên dora xwe da ku pez, dewar û dexil bikirin. Gelek cara, malê gundiya, hemen, hemen, bê pere distandin. Li ber çavê me, zabit qayimeyên sexte pêktanîn û gundiya icbar dikirin ku wan imza bikin; pereyê mayî bi zabitên din re par dikir.

Min zivistanên sala 1914 û 1915 bi timamî li wê derbaz kirin. Her wekî, her tiştê min li ser Ordiyê bû ji meaşê xwe min kêm xerc dikir û min pereyê xwe giş dida bavê Gulê, Seîdo, li ser hêsaba qelen. Ez pêre bi 150 rûbil li hev hatibûm; eger min ev pere gî bidayê, Gulê wê ya min bibiwa û hingê heqê min hebû ez wê bibim. Qelen ne gelek giran bû, Seîdo bi vê miqdarê razî bûbû ji ber ku ez ne xerîb lê, kurxalê Gulê bûm.

Bi vî awayî, hin bi hin, min qelenê Gulê dida Seîdo. Ev tiştekî hêsanî ne bû, lê ji bo anîna gulê, minê her tişt bikira... Gava ji qelen çi dima min da, min sê roj izin stand û ez çûm cem Seîdo; min jê re got ku divê Gulê hazir bike ku ez wê bibim cem dê û bavê xwe û dîsa vegerim ser karê xwe. Lê hingê tiştek qewimî ku min tu cara ne anî bû bîra xwe Seîdo qebûl ne kir keça xwe bide min û bi eşkere got ku min tu qelen ne dabûyê û ku bi zor min dixwest ez Gulê birevînim. Bi xweşî, min gotê ku min qelen dabûyê; Seîdo bi tehqîr li min nêrî, her tişt inkar kir û got: «Ka şahidên te? Li ber kê te pere da min? Isbat bike...!,,

Ev pirs wek birûskeke li min ketin. Min fehim kir ku Seîdo ji xeşîmî û dilpakiya min dixwaze pereyê min bixwe û Gulê bifroşe yekê din. Li ser pêvçûna me, cîran li dora me kom bûbûn; ewana dizanîn ku min qelen daye, bi qencî gotin Seîdo ku bêbextiyê nekê û keça xwe bidê min. Lê zila-



Jina, tifing di dest de. namûsa xwe parast



Jina, tifing di dest de, namûsa xwe parast



Jina, tifing di dest de, namûsa xwe parast

mê çikùs û zalim, guh ne da wan û herwekî du qasê min bû, rabû ku li min xe. Tifinga min li ser milê min û qntaxa wê jî li destê min bûn. Gava Seîdo hate min, min baz da. Ew kete du min, û ez li hewşê girtim. Destê xwe avêt tifinga min, lûla wê girt û ew bi aliyê xwe veda. Bêî ku ez vegerim paş, min xwe avête pêş û tifing di destê min de teqiya. Seìdo di cî de hatibû kuştin.

Ez girtim û ez birim cem fermendar, ji wê jî gundê Kulê, li cem Serekê Polîsê minteqê. Di isticwabê de, şahid û gulê jî hi wan re ifada min tesdîq kirin û gotin ku eger Seîdo tifinga min ne kişandaba ez direviyam û ev misîbet ne dihate serê wî. Li ser xwestina fermendar, îşê min bi derengî ne xistin û ez berdam. Lê merivên Seìdo dawa xwinê li min kir û li kuştina min digeriyan. Édî min ne dikarî ez li wan deran bisekinim û Gulê careke dî bibînim. Merivên wê ew bi xwe re bir...

## 13-Li Tirkiyê.

Li ser şîreta fermendar ez bûm tercimanê Ordiya I a Kozakên Labînskî û çûm eniya Tirkiyê. Li wê, li gundên ku ketibûn destê Ûrisan, teqrîben, xelk, li ciyê xwe mabûn. Ezab û işkence ku ji aliyê zabit û eskerên Qeyser bi wan dihatin kirin, min bi çavên xwe didîtin. Leşkerên Imprator wa bawer dikir ku li ser ber tişt mesmûh e: Talana malê xelkê, şikênandina erza jin û keça...

Da ku xwe biparêzin, jina dest bi şerê canî û bêbexta kir û li gora adetên kevin, xencer di dest de, bi mêranî namûsa xwe parast.

Hadiseyek hin di bîra min de ye: Di vê minteqê de, li gundê Kêrik, pîrekek ji eşîra min hebû.

Ewê di mala xwe de çeleyeke jina pêk anî bû û ne dihişt ku zabit û esker bikevin hundirê malê. Di gel vê yekê, zabitên xort aşiqî vê delala şerevan bûbûn û gelek dixwestin ku wê bêxine destên xwe.

Zahitên Ûris di herbê de gelek pere distandin û gava li eniyê lihevxistin disekinî, xwe didan sefaheteke mezin. Bi rojan ve, nemaze bi şev, diketin vexwarin û qumarê. Serekên wan ew didîtin bêî ku dengê xwe bikin, herwekî ev tişt gelek adetî bûn...

Carek piştî vexwarinekê, di şeveke xweş de ji yên havînê, çend zabit xistin serê xwe ku bikevin mala jinên asê. Gava deriyê hewşê girtî dîtin, xwestin di ser dîwaran re bikevin hundir. Zabitekî xwe bilind kir da ku derkeviyê. Van serxweşên ha wa dizanîn ku di mal de tu peya nîne, lê gava ku tifingek li wê teqiya û berik di ser serê zabit re derbaz bû, şebqa wî qul û serê wî jî hinek birîn kir, pir şaş man... Zabit di cî de ji dîwêr hate xwar û careke dî ne wêrî xwe nêzîkî wi bike.

Lê, yekê din west mêraniya xwe nîşan bide û çû ku ji *wî* alî, derbazî hindurê malê bibe; Tifingeke dî hate berdan, û zabit, bi milekî brîndar bûyî, pol, poşman, vegeriya cem hevalê xwe...


Ji nîşandariya pîrekan ecayib mayî û ji tirsa ku dengê tifinga bigehe guhên dewriyeyên Ordiyê, zabitên me dest vala û ser nizim vegeriyan ciyên xwe.

Piştî çend rojên din, ji *nû* ve avêtin vê malê. Lê dîsa, zabitê ku dixwest bibihure cem jinên kurd ji aliyê tifingvanên veşartî derbek li milê xwe xwar û bi lez xwe bi *şûn*de da.


Îcar, yekê raporek da Erkanê Herba Qerargehê. Di cî de, zabitekê inzibatê bi çendeka din re hate wê de rê ku tehqîqatê bike. Ez jî di vê encimenê de terciman *bûm*. Gava em gihaştin mala jinên kurd, zabit di pêşiyê de ez şandim da ku ji pîre*ka* re bibêjim *k*u ev encimen ji bo parastina wan hatiye. Ev giş bi roj çêdib*ûn û* gava gihaştim mal, li ber derî tifinge*k* direjî min b*û*, lê min bi *k*urdî gote wan: Metirsin,» ez ji we me!,, Hiştin *k*u ez bikevim hewşê û piştire hundirê malê bi xwe. Hingê min dît ku şervanên me çar pîrek bûn: Xesû û her sê bûkên wê. Sereka çetê, bi rastî jinekeke gelek spehî, bûka pi-



Siyabend û Xecê



Siyabend û Xecê



Siyabend û Xecê

çû*k*tir bû; her du bûkên din û xwesû, li bin emrê wê bûn giş bi tifing û rex. Min gote wan ku Mezinê eskerî yê bilintir hatibû tehqîqê; dixwest rastiyê bizane da ku yên bi sûç ceza bike. Pîrek çûn mezeleke dîtir ku bi hev re şewrê bikin. Yek ji wan tifinga wê bi dest û li min dirêj kirî, li ber derî sekinî. Piştî ku, qederê nîv saet, bi hev re axaftin, vegeriyan û li ser niyetên heyetê ez dam sondê. Min ji bi ya wan kir. Piştire heyet hat û ji hemû jina, ji hin zabit û eskera, pirsa kirin. Evan gazina ji wan jina dikirin û gelek tiştên xirab di heqê *wan* de digotin.

Ji isticwabê, pir filên zabit û eskeran ên ne baş derketin meydanê. Dawiyê. hin zabit hatin rêkirin yekîneyên din, û ji bo parastina jinên kurd ji, nobetçi hatin danîn li ber mala *wan*. Lê, pîreka baweriya xwe bi wan ne tanî û ne dihişt ji min pêve tu kes bikeve mala wan.

Çend hefte bi şûnda em hîn bêtir ketin nav Kurdan û gihaştin çiyayê Sîpanê ku bi bilindahî ji Axrî ne kêmtir e. Çiyayê Sîpanê yê mihteşm, çiyayê (Siyamend û Xecê) ku li wê çend car min stirana wan bihîst. «Siyabend û Xeçê» yek ji çîrokên kurd yên xweştir *û* spehîtir e.

## 14- Ez hêvî ji we dikim, mebin qurbanên derbên min!

## Vegera min mal.

Li ber çiyayê sîpanê em gelek ne man, piştî çend rojan, ji serfermendar emir hate me ku em bi pêşve herin. Belê, li ser serdestiya Ordiyên Ûris eniya şer gelek çûbû pêş. Zabitekî, çend Kozak û ez jî bi xwe re birin û di pêşiyê de derket. Diviya bû, berî hatina esker, em ji qerargehê re cî, ji Ordiyê re xwarin û ji dewara re jî êm, peyda bikin.

Gava di quntara çiyakî re ber bi jêr dibûn me kurdek dî direviya û 10-15 peya jî li pey wî, dida ser û tifinga berdidanê; lê berikên wan gî vala diçûn. Firar tim diziviri û digote

wan: «Ez ji we hêvî dikim, bela xwe ji min vekin û mebin qurbanên derbên min. Ji min çi dixwazin? Ev meseleke borî ye.» Mêrik baz dida, şîreta li wan dikirin, û gava guh nedidanê diziviri wan, bera wan dida û di her derbê de yek ji dijminên xwe dixiste erdê. Kozakên me tev de, destek fişek berdanê û li lingê wî egîdî xistin. Mêrik mecbûr bû bisekine.

Di isticwabê de hate zanîn ku ev zilam, ji bo hilanîna tola xwe. ketibûn dû vî peyayê hêja. Firar ku, bi mêranî û nişandariya xwe em heyirî hiştibûn, çû bû gundê ku ji zûda li wê merivek kuştibû. Merivên kuştî wî dibînin, û herwekî dizanin ku ji malbata wî tu kesê dîtir ne maye, didin pê ku wî bikujin. Qatil ji gund direve, û ji tifinga xwe bawer, ji dijminên xwe natirse, heneka xwe bi wan dike û ji wan re dibêje: «Qurbanên berikên min mebin, bela xwe ji min vekin!»

Ewên ku ketibûn dû wî giş hatin girtin û rêkirin ber hakimê Melazgirt, nû ketî destê Ûrisan. Brîndar jî hate danîn xestexaneya eskerî; li wê, piştî ku brîna wî bi timamî rahet bû, dîsa vegeriya mala xwe.

Jiyîna min li eniyê, bi vî awayî derbas dibû: Çûn û hatinên dayimî di nav gunda û warên koçeran de. Zivistana sala 1915-1916 nêzîk bû. Halê min jî pê re dijwartir dibû; serma destpê dikir û ez difikirim vegerim mal. Di vê wextê de, gelek eskeran ji malên xwe xeberên xirab distandin. Ji wan re dihate nivîsandin ku ji ber seferberiyê, tu kes li gunda ne mabû ku bi çandiniyê mijûl be. Gelek ji wan ji eniyê direviyan.

Her çend em nêzikî çephê dibûn, rewşa me xirabtir dibû. Min xiste eqlê xwe ku ez xwe ji wezîfê derêxim... Meaşê sê mehan dan min û di cî de min berê xwe da gundê Astaflû, (li minteqeya Sûrmeli, tabiî Erîvan û welatê bavê min).

Gava ez gihaştim mal, min xelkê xwe di perîşaniyeke mezin de dîn, salakê dûrketina min ji mal, ew ji xebatkerek mehrûm kiribûn û işên wan tevlehev bûbûn. Di vê nebûna min de li mal, çavên diya min êşiya bûn; her weki doktor ne

bûn, çûbûn cem hekîmê kurmancî; ewan ji çavên diya min ewqas baş derman kiribûn ku, rebenê bi zor ber xwe didît û nema êdî bi kêrî işên malê dihat. Her du xwişkên min kebaniya malê dikir. Bavê min jî, rexma pîrî û êşên xwe, dîsa diçû ber dewarên xelkê.

Gava ez ketim hundirê malê, diya min ez ji dengê min nas kirim. Xwe avête min da min maçî bike; ne dihişt ku tukes berî wê nêzîkî min bibe. Rebenê ne dikarî cilê min ê eskerî bibîne; destên xwe li ser min digerandin û kêfa wê bi bedla min a eskerî û bi biçkokên wê yên mezin, dihat. Piştî ku ez têra xwe himbêz kirim, diya min hişt ku xwişkên min jî bên silav li min bikin.

Xebera hatina min zû li gund belav bû. Meriv û nasên me hatin xweşhatina min. Bavo ne li mal bû, çûbû ber golika. Xwişka min çû xeberê bidiyê û li ber garanê rûnê da ku ew vegere mal. Rexma pîrbûna xwe, bavê min, bê sekin, bihin çikandî û çav bi hêstir, bi lez hate mal, ez himbêz kirim û gote min: «Çima te ez berdam? Ez êdî pîr bûme û nikarim herim ber dewêr...!»

Piştire rûnişt, bêhna xwe kişand û bi girînê ket. Hingê, min heştî rûbilên xwe derêxistin, danê û got: «Evê ji bo zivistanê, têra we bikin.» Kelek kêfa bavê min hat: Ji bo wî, her wekî elimî bû kiriyên bê qiymet, heştî rûbil, xezneyeke mezin bûn.

Qederek ji payizê derbaz bû bû û çêreyên havînê digihaştin dawiya xwe. Min ciyê bavê xwe girt; da bihêlim çend rojan xweş rahet bike.

Min turikê xwe yê kevin bir û çûm dîsa çolê, ber golika. Bi xwe piştî çend rojên din berf daket, çêre êdî ne man û ez vegeriyam mal. Ez çend rojan di nav xelkê xwe de mam û piştire di şixulekî fikirim.

## 15-Di partiyê de.

Min izna xwe ji mal xwest û berê xwe da bajarê Sarîqamîş. Li wê, ji bo xebatên avahiyê di (Drûjana 6 a) de (tab) û-

ra ihtiyatan), ez bûm emele. Piştî çend rojan, gava serekên min bihîst ku ez'bi çend zimana dizanim, ez dîsa kirim terciman.

Drûjana me ber bi Erzerûmê ve, ku di meha Sibatê de ketibû destê Ûrisan, rêhesîna teng çêdikir. Di vî karî de, ji her miletan Kurd, Ermenî, Tirk, Gurcî... çend hezar emele dişixulîn. Ji van pêve, ji Moskowa û bajarên Rûsiya yên mezin jî, gelek ûris hebûn. Min ji wan gelek naskirin û bi Kilîmov, Mîxaîlov, Popov Şûkro Kornev re ku piştire min li moskova dî, ez bûm dost. Ji Kornev pêve ewên din giş endamên partiya Sosiyal Dêmokrat a Bolşevîk bûn û di teşkîlatên veşartî de dixebitîn. Kêfa wan bi min gelek dihat; ez kirim hevalê xwe û ez pir caran dibirim civînên xwe. Heya wê gavê, heya min ji civatên veşartî ne bû. Cara pêşîn bû ku ez rastî xebatkerên sewrewî dihatim. Di civînên xwe de endamên civat ji min dixwest ez ji emeleyên ne Ûris re bibêjim ku pir guh nedin şixul û zêdekirina kiriyên xwe teleb bikin. Min li ser xwe girtinên gihandin emeleyên Kurd, Tirk û yên dîtir... Ewan jî di ci de gotinên me ecibandin û xwestinên xwebeyan kirin ku, bi tercimaniya xwe min gihandin ciyên berpirsiyar. Meqamên bilind serên xwe di ber xwe re berdan, li ber xwestinên emeleyan serê xwe danin û hin, bi hin kiriyên wan zêde kirin.

Emeleyên Moskowa ji min re neşriyatên sewrewî (serhildan, laperîn) didan. Bi saya xwendina van kitêban û tim û tim bi dîtina endamên partiyê, hêdî, hêdî min li ber xwe didît û ji bo Azadiya miletên bin dest û xilasiya feqîr û xebatkera ji bin istimara xwedî milk û dewlemenda, dibûm şeravanekî bêtirs û serhişk. Berê, ferq di navbera Bolşevîk û partiyên din de çi bû, min ne dizani, lê, min bez dikir ku hemu partiyên isyan û azadîxwaz xwe bikine yek û tevde ji bo armancakê bixebitin: RAKIRINA ISTIBDAD Û ZILIM, SEKINANDINA ŞER. NASKIRINA HEQEN HEMU MILETAN, ÇI BIÇÛK, ÇI MEZIN, XILASKIRINA FEQÎR Û XEBATKE-

RAN JI BIN TEHEKUMA SERMIYAN, ANGO JI YA DEWLEMENDA. Min fikrên xwe gotin hevalên xwe. Kilîmov, dûm û dirêj bi min re axaft û piştire kitebeke pir mezin da min ku min bi diqeteke kûr xwend. Paşê, ez çûm civînên Bolşevîkan di nav rêla da, li wê ji bo qulibandina hikumetê Bolşevîk xwe pêk tanîn. Tenbîha li min kirin ku ji tu kesî re behsa van civîna nekim yan na polîs wê bihatana me û em giş bigirtana...

Bi vî awayî, hin bi hin, pêşiya min firehtir bû; xebata teşkîlatên partiyê ez bi xwe re kişandim û min xwe gihande Bolşevîka.

# BIRA. DIWEMÎN

## I - Sala 1917.

Kela şahiya rojên Sibatê xwe danî. Bêmanabûna şer ji her kesî re êdî eşkere bû, lê dîsa, di gel vê yekê dom dikir. «Qeyser êdî ne maye, lê... Hikumeta Miweqet hikim dike.» Û tabûrên nû rêdikirin eniyê.

Li mîtînga (li hevgihanên mezin), Menşevîk û Eser (Civata xwediyê arda yên iştirakî, malpardar) xwe tev didan û armancên xwe bi qîrîn belav dikirin: «Şer heya serdestiya dawîn!»

Esker, li ciyê xwe melûl û dilşkestî diman, bê deng guh didan gotaran, bê dil û bisistî, dihiştin ku *w*an rêkin eniya şer. Û li eniyê, grûya (qitea) êrîşî dijmin ne dibir û dixwest ku wan vegerînin welatê wan, Rûsiya.

Fermendarî, ji bo itaeta wan, Kozak û Jùnkera (şagirdên dibistanên cengê) rêdikirin.

Ji Rùsiya, di ser çiyan re xeberên bêbextî û birçîbûnê, dihatin. Xeyid, gilî, û gazin, ji eniyê, digihaştin paşiya wê û di nav esker û emeleyan de, belav dibûn.

Di nav van dilêşî û gazina de, zerûriyeta bi tehdîd x*w*e da bihîstin «Edî şer rawestînin! Me vegerînin mal!»

Drûjana me a Qefqasiya, hingê, li Sarîqamîş dixebitî. Di nav me de gelek elemanên Rùsiya hebùn, lê herwekî hikùmeta Qeyser bi wan bawer ne bû, çek ne dida wan û ew di îşên avahî û çêkirina riyan de, didan şixulandin.

Cejna yekê Gulanê, (Cejna Xebatkera) nêzîk dibù. Teşkîlata Bolşevîkan a bi dizî ji ku ez tê de bûm, bi dil û can xwe ji vê rojê re pêk tanî. Me qerar da ku emê Seyranekê Gulanê û mîtîngekê pêk bînin, rêçika Bolşevîkan bidin zanin û ji esker û xebatkera re, çima Hikumeta Miweqet şer ne disekinand, bidin fehim kirin.

Armancên me ev bûn: «Rawastandina şer. Aşîtiyeke bê ilhaq û terxîs kirina Ordiyê.» wek endamê teşkîlata bi dizî, karê min ew bû ku ez di nav xelkê bajêr de beyaname û gazi-

ziyên Komunîstan belav bikim.

Bi kincên minên kurmancî, tu kes ji min bi şibhe ne dibû. Bi kum û destmal û bi şal û şapikên xwe ve, serbest, ez li nav bajêr digeriyam û li ciyên, ji berê de tayin bûyî, ez rastî hevalên xwe dibûm. Beyaname û kitêbokan didan wan.

Bi roj em di nav rêlê de dixebitîn û êvarê ez vedigeriyam bajêr.

Carekê, gava bêrîkên min tije beyaname ez ji holika xwe derdiketim, li ber sênca rêlê, rastî hevalê xwe yê Drûjana, eleman Şineydir, hatim. Min bala xwe da bû ku, ew her gav, her wekî bi tesadifî, li wê, rastî min dibû, heya ez ji ber çavên wî winda bibim li min dinêrî, her wekî dixwest min ji casosan biparêze...

Ez sekinîm û bala xwe dayê. Ew kenî û nêzîkî min bû:

—Tu diçî? Ewî gote min û li dora xwe nêrî.

—Ez diçim. Û tu jî, ji xwe re digerî?...

—Ez digerim, Şineydîr kenî: Ereb! Min jî bi xwe re bibe!

Diltengî nîşan da û sor bû. Min baş li çavên wî nêrî û gotê:

—Bi ku da?

—Bajêr...

—Çima?!!

—Ezê bi te re bim. Ez dizanim...

—Tu çi dizanî? Bêje...!

Şineydir kenî.

—Metirse xeber bide!

—Ezê ji çi bitirsim? Ez dizanim... Ez ji zûda dizanim, hêdîka gotê guhê min û destê xwe li bêrîka min xist... Here, Ereb, bi dilekî xurt here! Ez livir im... Û Şineydir, bi fîkandinê, di ber sêncê re meşiya.

Ez ketim du wî, ew girt û gotê:

—Şineydir!

—Çi ye?

—Te gotiye hinekan?!

—Tu dîn î... Gelo yek dikare vî tiştî bibêje her kesî?! Ev di şeva Yekê Gulanê de bû. Min ji wê bi şûnda êdî Şineydir ne dî. Gava ez gihaştim bajêr, min beyanameya dan hevalekî xwe ku li benda min bû, û berê xwe da istasyona Sarîqamîş da ku bikevim nav eskera ku, ji bo bihîstina xeberên Rûsiya, li wê kom dibûn.

Li istasiyon min lihevgihaneke gewre dî. Bi nêzîkayî, hemû lekên leşkergehê li wê kom bû bûn. Meydana li ber istasyon tije xelk bû. Civîn li ser vî tiştî hatibû xwestin: Pakêtên ku ji eskera re ji Rûsya hatibûn rêkirin, di rê de riziya bûn, û gava gihaştibûn Sarîqamîş, midîrê istasiyon ew ji wagona avêtibûn, ji ber ku êdî bi kêrî tu tiştî ne dihatin.

Timam di vê gavê de, yekîneke rêdikirin eniyê. Eskera pakêtên riziyayî dîtin, ji enira xwe çûn li midîr xistin û mîtîngek pêkanîn. Qebûl ne dikirin herin cephê û dixwestin ku wan vegerînin malên wan. Gelek diaxaftin û ser gerim bûn.

Gotarên wan gelek tesîr li min dikir. Bi lerza şabûnê ez dilerizîm. Dilê min pir dixwest ku ez derkevim pêşiya van eskeran ku bê rawestan, xwe tev didan. Qiweteke ne nas, ez, berbi senduqa ve ku menberek pêk tanî, avêtim. Eskerekî ez sekinandim.

— Bra, ez dixwazim xeber bidim, ez bolşevîk im!...

Kenî û destê xwe da min. Ez derketim ser sendûqa. Li wê qiyafeta min a Kurdî, bi kum û destmal û bi şal û şapik, eskera eleqedar kirin. Li dora min herkes xwe ker kir.

—Xeber bide esker gote min, lê bi dengekî bilind, da ku herkes te bibihîse!

Bi qetandin û nîvqûrçî kirina pirsên rûsî, min dest bi axaftinê kir, û, di nav çend salên dawîn de, min çî dibûn û hiskiribûn, gotin wan. Min gote ku, berê Qeyser em dixeniqandin, lê nihu, li şûna wî, bájariyên dewlemend, beg û axa me dixeniqînin û me rêdikin mirinê. Divê ku em wan ji hi-

kim bavêjin û vegerin malên xwe.

—Ev tirk e! Zabetekî lewt, lewt, kir, derket ser minberê û hate min.

Eskera lê kir qîrîn: «Dêstê xwe dirêjî meke!»

Ez ji ser sendûqa hatim xwar û di nav xelkê de winda bûm.

Mîtîng heya miqdarekê ji şêvê jî dom kir.

Bi şev dereng, ji tiştên ku min kiribûn kêfxweş, di kolana istasiyona teng re, ez vedigeriyam holika xwe, û min ji xwe, re bêdî, hêdî, straneke kurdî digot. Ji nişkave, ji paş min reperepa lingê zilama hat. Ez sekinîm. Çend meriv da bû dû min.

—Va ye..! Zabitê ku ketibû pêşiya wan kire qîr, û di destê wî de tiştekî giran dikila.

Bi wî li serê min xist. Bê hiş, ez ketim erdê...

Di hebsa Sarîqamîş de, di hicreke piçûk de, min çavên xwe vekirin.

Nobetdar kete hicra min. Gava dît ku min bi nalîn, serê xwe ji erdê hildikir, pehineke hişk li rûyê min da û got:

—Tu dîsa hatî hişê xwe, ne,.? Sa, kurê sa..!

Ez dîsa ketim erdê...

Di hicra xwe de, çend rojan, ez bi tena xwe mam. Piştî isticwabê ez birim cem girtiyên din. Li wê, çend esker hebûn, Di nav wan de, bi navê Nîkolayev, zilamekî rîspî û xwende jî hebû.

Gava bihîst ku ez di mitîngê de hatibûm girtin, Nîkolayêv ji min re dest bi dayina şîretan kir, da ku di isticwabê de, çi û çawa cewab bidim? Lê, hevalên min, ji berê de, rê şanî min dabûn da ku ez wan nefroşim.

Ez birim cem mistentîq. Ewî, di mîtîngê de, min çi gotibûn, ji min pirsîn. Di bersîvên xwe de, bi rûsiyeke çat, pat, min jê re tiştên tevlihev gotin.

Hakim qîr dikir û lingê xwe li erdê dida

—Xwe kermeke! Te di mîtîngê de behsa Bolşevîka kir?!!

—Bolşevîk?... Û min şaş lê nêrî.»

—Tu Bolşevîka nas dikî?... Hakim bi dengekî bilind qîr dikir min, û şeşderba xwe dida singa min.

Ez dikeniyam û serê xwe dihejand.

—Bêje...

—Ez bolşevîka nas dikim! Miletekî mezin... Dibê lazim e şerê Tirka bête kirin..

—Divê herkes heriyê...

Hakim tif dikir, xwe hiltavêt û banî nobetdara dikir ku li min xin.

—Bêje... Hakim dîsa qîr dikir, û şeşderba xwe li ber guhê min digirt. Lê, bi girîn, min dîsa digot: Bolşevîk, miletê mezin.. Şerê tirk dixwaze»

Piştî ku bi min re çend rojan, kişkişandin, hakim qanî bû ku xeletî çêbû bû û li hebsê, yekcar ez ji bîr kirim û di despêka hezîranê de ez berdam.

Ez di cî de, çûm civata xwe. Hevala, mayina min li wê minasib, ne dî; di wê rojê de, ez vegeriyam welatê bavê xwe. Gundê me, Bêav.

## 2-Li gund.

Li welêt tu tişt ne guhirî bû. Wek berê, Walî hin «Xwedê û Qeyserê» minteqê bû. Wek adetî, çawişê Jendermê, kurda davêtin ber dara, û mal û pereyê wan dixwar. Kurda jî hîn xwe bê deng dikir û li ber zilamên hikumetê xwe heya erdê ditewand. Ne dizanîn ku li Rûsiya inqilabek çêbûye û Qeyser êdî ne maye.

Min gundî civandin û li Rûsiya çi çêbûbû, gote wan. Gundiya bi tirs guhdariya min dikir û kala, bi pistepist, şireta didan min: «Bala xwe bide, Ereb! Hakim wê bibihîse û belakî

bîne serê te.» Û ez berdidam û diçûn malên xwe.

Mezinê gund, Cindiyê Emo guh li gotinên min bû. Ha-te cem min û bi çawişê jandarma ez tirsandim.

Gotinên min vala ne çûn. Heta, berî hatina min jî, li ser azadî û parkirina erd û milka, hin gotin gihabûn gundi-yan; lê Kurd ji hikumetê ewqas ditirsiyan, ne diwêrîn ji kê ku bû, tişta bipirsin.

Lê, li gundê me bi xwe, ji min re hevalek derket. Ev, bi navê Xelîlê Şero, gundiyekî feqîr bû. Li serê çiyan, me bihev re, çend şev derbaz kiribûn û li ser îşên dinê û jiyîna xwe, axaftibû. Min jê re qala Bolşevîka kiribû û gotibûyê ku ev ji gundiya re serbestî û erazî dixwazin. Xelîl guhdariya min dikir û ji şahiyê çavên wî diçirisîn. Em bi hev re di zeviyan de digeriyan; Xelîl bi tiliyê xwe, şanî erdên xwediyê milka èn bê hed û hêsab, dida û ji kêfxweşî bihnçiki-yayî, digo:

—Ev erd jî, wê yên me bin...

—Giş ême ne. Emê her tişt ji destê wan bistînin...

—Û pez û dewar?

—Ew jî wê bikevin destê milet...

Xelîl dikenî û wek zarokekî piçûk xwe hildida:

—Divê ev tişt, rojek berî rojekê, çêbibin;

—Em bi tena xwe nikarin. Divê milet tev de xwe ra-hijê vî karî... Min gotê.

—Gundên Kumsoro û Qerekele bi xwe, wê bibin ên her kesî? Lê eger erd têr nake?..

—Erd wê têra me gişan bike, min dilê wî rahet kir...

Carekê, Xelîl gundikî xweşhal, Cindiyê Ûso, anî.

—Ereb, Ewî gote min, tu dibêjî ku erd ê her kesî ye?

—Belê.

—Û hikumet? Ew erd nadê me...

—Emê ji xwe re hikumetekê deynin.

—Eskerên wan hene.

—Kî?

—Serekên me.

—Emê jî heq, îman û çiyayên me hene...

Cindî ponijî, û hêî ku tiştekî dî bibêje, serê xwe nizim kir û vegeriya gund.

Roja dìtir dìsa hat:

—Ereb, tu Îsrayil Mîrakiyan dinasî?

—Belê ez wî dinasim.

—Ez li cem wî bûm. Cindî sekinî û li çiya nêrî.

—Te tiştek gotê?

——Belê,

— Mamoste Îsrayil Mîrekiyan çî dibêje?

—Ew jî wek te dibêje, Ereb. Cindî xwe lal kir, pi ştirebi dengekî nizim bi ser de ajot:

—Ez çûm Qerekelê.

—Kurd çi difikirin li wê?

—Erazî dixwazin.

—Erd dixwazin?» Şaş, mintekrar kir...

—Belê, li Qerekelê û li Gazaçìn, gundî behsa erd dikin... Bêje, emê çi bikin?»

—Min got...

—Serekên xwe biqewirînin?

—Belê...

—Ewê bi me re bibe, Cindiyê Ûso, wê bihe hevalê me...

Belê, Xelîl xwe ne dixapand. Cindiyê Ûso bû hevalê me, û piştî wî pir gundiyên dîtir jî ketin şopa wî

Roja dîtir, serê sibê zû, siwarek bi lez hate gund Bi qîrqîrê çû mala mezinê gund. Di cî de kurd li dora wî kom bûn.

—Mixtar! Siwar, bi dengekî bilind, ban kir,axa emir daye ku gundî giş herin mala wî, ji ber ku îro, walî bi xwe wê bê cem wî û we giş dixwaze...

Cindiyê Emo bi îtaet serê xwar kir.

—Ji bona çi? Hinekan li dorê pirsî.

—Metirsin, siwar bi ken vegerand. Nihu, êdî azadî ye. Axa nema dikarin zilim bikin. Piştire qîr kir hespê xwe, ew rakir telebê û berê xwe da çiyê.

«Serbestî? Axa êdî zilim nakin!!!»

«Herin cem axa, Xelil digo, nihu azadî ye!...-

—Zimanê xwe pir dirêj meke û bala xwe bide gotinên xwe! Cindiyê Emo gotê û bi tiliyê xwe ew tehdîd kir.»

Herkes xwe lal kir. Emo, bi awirên tûj, li dora xwe nêrî, lêvên xwe yên qermiçî li hev xistin û got: «Herin, lê bi tertîb, we seh kir?!!»

Gundiya da rê û bê deng ber bi çiyayê ve meşiyan.

Li gundê Digurê mezin, bi nêzîkayî, hemu xelkê minteqê, civiya bûn.

Nemînendeyên hemu miletên ciyê me li wê bûn.

Nemînendeyê Hikumeta Miweqet, gotarek da. «Sewreyek li Rûsiya hatiye çêkirin, ewî digo. Qeyser ne maye, û êdî, milet ji aliyê nemînendeyên xwe tê gerandin, û li ser wan jî Hikmeta Miweqet heye.»

—Û erazî?! Xelîl kire qîr.

Pirsa erd weke barûdê, agir girt. Bi sedan ve denga ev pirs tekrar kir.

Gotarbêj zor da xwe ku dengê gundiyan bide birîn; lê tu kes guh ne didayê. ji bihntengiya xwe, çû cem mezinekî kurd ê gelek bi nifûz, Egîd beg.

Ez li nêzîkî memberê bûm û guh bi gotinên wî dibûm:

—Ev xwestin ji ku ketine nav Kurda?!!

Egîd beg bi çav ez nîşan damê.

—A!a! Nemînendeyê Hikumet mirmirî, û bi diqet li min nêrî. Ez bi cilê eskerî bûm. Piştire devê *xwe* da guhê Egîd beg, û tiştek pistepist kirê. Egîd beg bi giranî serê *xwe* hejand û banî Çawişê Jendermê kir. Ewî jî, bê deng, temaşa min kir, û bi işareta teyid serê xwe bir ber *xwe*.

—Ereb, derkeve, xeber bide! Xelîl bi lez hatî cem min, digote min. Hevalên me hêvî ji te dikin ku tu ji wan re gotinên *xwe* yên gund bibêjî. Li benda te ne zû bike!

Bi lez, ez derketim ser memberê.

—Firarê eskerî...! Nemînendeyê Hikumeta Miweqet, di nav diranên xwe re fîkand û xwe ji min dûr kir. Guhdar bê deng bûn.

—Hevalino! Bi dengekî bilind min destpê kir.

—Ereb... Ereb... Ev nav di nav koma guhdaran de ji devê berksê derdiket.

—Em gundî, mihtacî erd in. Heya kengê emê bibin koleyên xwediyên milk û *wek* dewarên wan bijîn? Û erd, Bolşevîk *wî* didin me. Ew dibêjin: «Ji şer re dawî, ji xebatkera re, febrîke û karxane, ji gundiya re erazî!»

Gava, min his kir ku yek bi milê min digire û min ber bi xwe ve dikişîne, min xwe zivirand û min destê Nemînendeyê Hikumet li ser xwe dî:

—Dengê xwe bibire... Yan na..? ewî xwe tewand ser min û ji guhê min re mimirî.

Rûyê wî ji xezebê sor bûbû.

—Wî berde! Bira xeber bide...! Çima tu *wî* nabêlî?!! Gundiya ji nû ve lê kire qîr



Em erd dixwazin, heya kengê emê kole biminin?



Em erd dixwazin, heya kengê emê kole biminin ?



Em erd dixwazin, heya kengê emê kole bimînin ?

64-65

—Bibêje, Ereb, bibêje...!

Gava min dî ku gundî diqîrin, mîtînga eskera û hebsa Sarîqamîş, hatin bîra min. Ez dîsa li wan zivirîm. Nemînendeyê Hikumet, xurt milê min girti bû. Egîd beg ji xeyda xwe dilerizî û bi çavên tîje kîn û bi çîrs, li min dinêrî.

Min milê xwe ji destê wî derêxist û dom bi gotara xwe kir:

«Jendermeya, xwediyên milk, dewlemend û axa, kurda davêtin ber dara û ji îro bi şûnda jî, ewêli wan xin. Divê em sovîyetên (meclisên gundî, emele û esker ji bo gerandina hemu karên welêt) gundî, û emeleyan bibjêrin,»

Gotinên min ev bûn.

—Na! Emê hikumeteke mehelî û miweqet deynin, lê, ne sovyeta! Nemînende kire qîr, û ez dehf dam alîkî. Min his kir ku desteki giran milê min digivaşt . Ev Egîd beg bi xwe bû.

—Îşê min bi te heye, Ereb, ewî gote min.

—Tu gotinên min bi te nînin, bi xeyid min vegerandê, û milê xwe ji destê wî filitand.

—Ciwaba te ev e, Ereb?

—Bi gurekî re, yek an bi agir, an bi berik, xeber dide, min gotê, ji aliyê wî de tuf kir û ji memberê hatim xwar.

Civîn, heya derangiya şevê, dom kir. Gelek hele, hele, û deng hebûn. Nimînendeyê Hikumeta Miweqet, ji hemu xwestinên kurda re mazereta dîtin û bi cî anîna wan li ser xwe girt. Lê, gava intixabat çêbûn, hemu namzedên Taşnaq û yên bega derketin. Namzedê me, Israyîl Mîrakiyan ket, heta, ew mecbûr kirin namzediya xwe bikişîne.

Di tariya şevê de, ez vedigeriyam mal. Ewrên girandi ser çiyan re hêdî, hêdî, derbaz dibûn. Car, car, heyîv, wek dasekê, di pişt wan re, rûyê xwe yê şên nîşan dida. Ez di şi-

vereyekê çiyan re dimeşiyam, û hevalên min ên Bolşevîk, ku li wê, di bajarên Ûris de, dixebitin, dihatin ber çavên min. Ji nişkave, ji tariyê, sê zilama xwe avêt min: «Kemînek danînji min re...» min ji xwe re, di dilê xwe de got. Çiqa ji min dihat, min kulmek li rûyê yê pêşîn, xist. Min li destê xwe tiştek lezîqoy his kir... *Xwîn*...

—Kurê sa! Mêrikî lerizî qîr kire min û rûyê xwe bi destê xwe pêçand. Diduyên dîtir. şûrên bi çirs li destê wan, ban kir min: «Li ciyê xwe bisekine..!»

«Ewê min bidin ber xencera.... Min di dilê xwe de go. Hun kî ne?!!»

—Tu hatîyî girtin, yekê ji wan gote min. Eger tu li ber xwe bidî, emê te bikujin.

—Ji bona çi?

—Li ser emrê mezin.

Diduyê din jî, ji paş, xwe avêt min *û* destên min badan. Li ber xwedan bê feyde bû. Destên min girêdan û ez birim Dugir.

Gava em gihaştin mala Egîd beg, çireyên wê pêxistî, tavheyiveke çilmisî xwe raxistibû li ser gundê raketî. Jenderme derket jor û di hindurê xanî de, winda bû.

—Wî binin hundir! Nemînendeyê Hikumeta Miweqet kire qîr û li ber deriyê mezin sekinî. Li pişt wî, Egîd beg, dev bi ken li min dinêrî:

—Derbaz be; tu ê bibî mîvanê me yê gelek ezîz. Bi keneke tije henek, Egîd beg gote min, ez dehif dam hundir û derê li me girt.

Min çavên xwe li dora xwe gerandin: Çawişê jendermê, Nemînendeyê hikumet û çend Taşnaqên dewlemend, li pişt masê rûniştîbûn. Egîd beg ez kişandim ber *wan* û got:

—Ha ji we re!

—Tu bolşevîk î? Nemînende ji min pirsî.

Min deng ne kir.

—Bêje! Ev tu î ku gundiya radikî ser me? Xeber bide!

—Li xwe nagire bi me re biaxêve ji, Egîd beg bi henek got, çavên wî ji xezebê agir dibarand. Bi gavên hêdî û giran hate ber min:

—Biştexile: Ew ziriya û kulmên xwe givaştin. Min, devê xwe venekir.

Hingê, wek kitikekî, xwe tewand, û xwe avête min. bi her du destên xwe qirika min girt û ew givaşt. Bihna min çikîya û ez ketim erdê.

—Ah! Ah! Sa! Kurê Sa! Tu erd dixwazî?! Egîd beg digote min û bi cizmeyên xwe pê li laşê min dikir. Piştire ji jendirmeya re got: « Wî bibin axurê û wî hepis bikin; ezê bikim ku xeber bide»

Ez kişandim hewşê û avêtim axurê...

Jenderma û çawişên wan ez diêşandim û miameleyên xirab bi min dikirin.

Zibilbi min didan kişandin, li rûyê min tif dikirin û li min didan; lê, wa dixuya ku ne diwêrîn min bikujin. Egîd begbi xwe, her wekî piştire min bihîst, ne dizanî çi bi min bike; mîna ku li benda tiştekî bû...

Êvara roja pênca, ez birim daîreya hikumetê û kaxitek bi min dan îmza kirin. Tê de min sond dixwar ku êdî di wê minteqê de tu tevdanê nekim. Piştî vî, ez serbest berdam. Gava ez derketim derve, çûna xwe ya rast bi rast mal, min baş ne dî ,tirsiyam ku egîd beg min bêxe xefkê û tifingekê li min bide herdan. Çend roja, ez li cem gundiyekî ji nasên xwe mam, û bi wî min ji Xelîl re da zanîn ku bi şev, bi çek bê û min bibe.

Xelîl dereng ne ma, û bi şev, bi çend kurdên çek kirî re, hate Dugir. Di nav wan, de min rûyê cidi û xemgîn ê Cindiyê Ûso dî.

Li rê min her tişt gote wan.

Xelîl bihnteng dibû û dixwest pereyê Egîd beg jê re vegerîne. Ango, dixwest vegere Dugir û wî bikuje. Min xiste eqlê wî ku armanca me, ne xwîn rijandin, lê, şiyarkirina kurda û xilaskirina wan ji bin nîrê beg, axa, Taşnaq, xwedî milk û, emperiyalîsm (istîmar)ê, bû.

Tu ê li mala me bimînî, Cindî gote min; hikumet nayê cem min...

Û min xwe li mala wî veşart.

Çend roj borîn. Êvarê, bi dizî, ez ji cem Cindiyê Ûso derdiketim û bi Xelîl re, li gunda digeriyam; min ji gundiyan re, Bolşevîk çi bûn, dida zanîn û digote wan ku divê erdên dewlemenda ji wan bêne istandin û ji gundiyan re bêne parkirin.

Évarekê, gava em li mala Cindî civiyabûn û me behsa tirs û sistiya gundiya dikir, jina Cindî, ji nişkave kete hundir û kire qîr: «Jendirma!..»

—Li ku ne? Me qîrand û rabûn ser xwe.

—Li mala kalo Şamil...

—Xwe veşêre! Cindî gote min û ji mal derket. Min xwe xist nav tenûrê.

Gava jendirmeyên siwari, hatin ber deriyê me, banî bavê min kirin û bi qirbac ew tirsandin:

—Bêje! Kurê te li kû ye?

Bavê min digirî û sond dixwar ku ji roja Dugirê, ez ne dibûm. Diya min, di nav ax û tozê de, li ber bespa, li ser çogên xwe, digirî û hêvî ji wan dikir ku rehma xwe li wan bînin...

Xelk li hev gihabûn. Jendirma li her derê malê, geriyan; gava ez ne dîm, ji kîna xwe, dîsa bela xwe dan dê û bavê min. Lê, gundiya xwe xist nav wan, û ew ji destê wan xilas kirin û gotin wan ku ji roja Dugirê, êdî tu kesî ez ne

dîbûm, Jendirme, destvala vegeriyan û gotin dê û bavê min ku eger ewê min bigirin, ewê hisêba xwe bi min re bibînin...

Ev tişt giş, Cindî piştî vegera xwe mal, gotin min, ji bo dê û bavê min ên pîr û kal, dilê min dişewitî, lê min dizanî ku heya ez li wê me, hikumet û begên me ew rahet ne dibiştin. Min fikra xwe gote Cindî. Ew hinek poniji û piştire fikra min qebûl kir û qerar da ku piştî çend rojan ez ji wê derê herim

Di mala me de, her tişt tevlehev bûbû. Diya min li erdê, bi girîn, hurmirên me yên bela vala bûyî, li bev didan. Bavê min rabû, hate ber min, mideteke li min nêrî:

—Ereb, bêje, te çi diziye? Gote min û destê xwe danî ser milê min.

—Min tu tişt ne diziye, bavo.

—Ne xwe, te kuştinek kiriye?

—Min tu kes ne kuştiye.

—Ne xwe, Jenderma, çima li te digerin?

—Ez nizanim.

—Tu naxwazî rastiyê bêjî bavê xwe, diya xwe?

—Bavo!

—Bêje...

—Ez dixwazim ku hemu miletên dinê bigehin heqên xwe, ez dixwazim ku gundî xwedî erd bibin, bextiyar bibin, ji koletî, nezanî, û perîşaniyê, xilas bibin. Welatê me ciyekî fireh û dewlemend e, lê, miletê kurd bindest, paşde mayî û belengaz e. Çima? Ji ber ku, ji alîkî, biyanî, û istimar, ji aliyê din jî, axa, maldar û xwediyên milka, me wek dewara dişixulînin. Em dixebitin, ew dixwin. Em zehmetê dikişînin ew kêf dikin. Em ji xwendin û ilim mehrûm, bê xwarin û cil, lê, ew di bajêr, qesra û dibistana de imrên xwe derbaz dikin, û, li me, ne bi çavê insan, lê wek heywana, dinêrin. Çima? ji ber ku erazî, febrîke, pere û hikim di destê wan de ne. Ez dixwazim ku karxane ji emeleyan re, û erd ji gundiya re, bin. Ez dixwazim ku tu gundî bê erd nemîne. Û tu jî bibî xwedî

erd.

Te seh kir, bavo, çima li kuştina min digerin? Nihu ez diçim, lê, ezê dîsa vegerim. Bi xatirê we!...

—Ereb tu kurê me yê tenê yî, em êdî pîr bûne, çima tu li helaka me digerî?!!

Bavo digirî, û hêstirên mezin di çavên wî re dihatin xwar û di ser rûyê wî yê qermiçî re, deherikîn.

—Em şivan in, em ne mihtacê erdê ne, diya min digo, li ser çoga, xwe dikişkişand û bi tiliyên xwe yên hişk, çıpên min digirtin.

—Bi xatirê te bavo... Min ewxurt di himbêza xwe degivaşt, û piştire, min diya xwe ji erdê rakir.

—Ereb! Bi nalînê, ewê gote min, û bê hereket, kete erdê...

Min trukê xwe avête milê xwe û bi lez, min da rê. Li dûr, di nav tehta re, şirîta şefeqê bi zor dixuya.

Min berê xwe da Alêksandropol (îro Lenînakan).

## 3-Ji Alêksandropol Stavropolê.

Li Aleksendropol esker pêl didan. Li meydanê, li istasyonê, kom, kom diçûn û dihatin.

Hin tirena esker dibirin eniyê, û hineka jî, jê vedigerandin. Ewên ji cebhê hatî, li istasion, bi deng û tevdanên xwe, qiyamet radikir, mîtanga pêktanîn, şandiyar rêdikirin. Yekîneyên din ku diçûn eniyê, siwarî tirêna dibûn bi gotinên «Mal.....» bi rê diketin û di tariyê de winda dibûn.

«Herin, enî êdî qe...» Vasiya, eskerî bolşevîk ku min di hatina xwe de Aleksendropol, naskiribû bi kêfxweşî, di nav diranên xwe re fîkand. Xwe avête tirêna ku dikete istasiyonê, xwe pê girt û gote min: «Şamil we re, xwe bavêjiyê!...»

Di mezeloka firenê de min ciyê xwe çêkir.

Ber bi Tiflisê ve em bi rê ketin.

Çend roja, li Tiflis, me ne dizanî em çi bikin? Dihate gotin ku li rê, tirên disekinandin. Xelk talan dikirin, çek distandin û dikuştin. Rewş endîşenak bû. Digotin ku li nêzîkî Ganca, tirênek perçe, perçe kiribûn, heçî tê de bûn çekê wan hatibû standin, û tu kes ne dizanî ew biribûn kû? Midîrê istasyon ne dihişt ku esker bi rê kevin. Ji nişkave, hate gotin ku ji bo bêçek û rêkirina eniyê eskerên ku li Tiflîs bûn, Kozak bianiyana...

Esker xwe tev da. Mîtîngek danî, da ku bizanin li gora vê xeberê, ewê çi bikin? Çekên xwe bidin wan an xwe li ber wan bigirin?... Vasiya diçû û dihat û bi çend eskera re pistepist dikir.

—Şamil! Ewî dawiyê banî min kir.

Ez nêzîkî wî bûm.

—Gelo tu riya Viladikokaz dinasî?

Gî li dora min kom bûbûn.

—Belê, ez dizanim. Min vegerandê. Digel vêyekê tu cara

bi peyatî, ez ne çûbûm Vîladîkokaz.

Me da rê. Panzde rojan em li çiya man, dawiyê. di meha çiriya pêşîn de em gihaştin Vîladîkokaz.

Li vir bi xwe, tu nizam tu ne bû. Esker, bi timamî, tiren zeft dikirin û diçûn Rûsiya. Hevalên min xistin serê min ku ez jî bi wan re herim Stavropol. Li Vîladîkokaz jî, Hikumeta Miweqet hebû, û min li wê tu kes nas ne dikir. Min dilê xwe kir ku ez herim ciyên dûrtir, Rûsiya, xebatgeha Bolşevîka...

Bi vî awayî, em gihan Stavropol. Roja dîtir, ez çûm li hevalên xwe yên partiyê bigerim. Rojeke timam, min her derê bajêr nas kir, bêî ku rastî tu nasê xwe bêm.

Ez vegeriyam istasyonê. Li nav bajêr, bêdengî hikimferma bû. Bi Vasiya re, dûm û dirêj, li ser rewşa xwe, me axaft, Di dawiyê de, me qerar da ku em hinekî bisekinin. Da ku em ji nêza nemirin, me ji xwe re hemaltî dikir.

Ûsa, me çend roj derbas kirin.

Carekê, li istasyonê ez li şixul digeriyam. Rêwiyek li wê rûniştî bû, û li ber lingên wî ji, çend çente hebûn. Min xwe nêzîkî wî kir:

—Hemwelat, belkî tu hewcedarê arîkariyê yî?» Min gotê û çenteyên wî nîşan danê. Ewî, ji ser serê min heya lingên min li min nêrî:

—Gelek baş e, arîkariya min bike, ezê heqê te bidim. Ewî li min vegerand.

Min çente danîn milê xwe û em çûn mala wî ku ji istasyonê gelek dûr bû.

Çente pir giran bûn, û yek ji wan di pişta min re hate xwar.

Tirsiyayî ez sekinîm. Ewî şaş li min nêrî: «Min efû bike heval! Ez ji singa xwe brîndar im; ji lewre min ne dikarî arîkariya te bik.»

«Ji min re heval got.» Ez fikirîm û min çente dîsa bilgirtin û em di riya xwe re çûn.

Gava em gihaştin mala wî, ewî heqê min û çay û nan dan min û ji kû dihatim ji min pirsî. Min baweriya xwe pê anî û çîroka rev û hatina xwe jê re go.

—Ne xwe tû bolşevîk î?! Ewî ji min pirsî.

—Belê...

—Kaxitên te hene?

—Çi kaxit?

—Şehadetname yan pirseke borînê.

—Na...

—Ûsa nabe... Lê, binêr min, ezêji te re tişteki binivîsim; here vê adresa ha, ewê te qebûl bikin...

Min karta wî girt û bi dilşahî ez çûm ku li Vasiya bigerim.

Roja dîtir em ketin Ordiya Sor. Fermendarê me Mîralay Şpak bû...

## 4-şerê Hundir

Di sala 1918 de, mifraza me, di mintiqeya Salîsk de, Şerê çeteyên Rûsên Spî, dikir.

Gava mifraza me girêdayî alaya yekemîn a Stavropolê kirin, hevalê min Vasiya, di vegirtina Batayisk de, hate kuştin. Piştire, di mintiqeya Tasarîsten de, me bi Rûsên Spî re lihevxistin; û di dawiyê de, em çûn ku Stavropol ji çembera Kozakan xilas bikin.

Her wekî, ji leşgergeha wî, ji eniyên din re qiwet rêdikirin, rewşa Stavroqol roj bi roj, dijwartir dibû. Çeteyên Spî li dora bajêr xuya kir, û ordiyên Spî xwe kar kir ku êrîşî bajêr bikin. General Şkûro, eniya me qelaşd û hate me. Piştî şerên xwînrêj, bajar kete destê dijmin. Me xwe kişande gundê Tataroskavê û ji wê jî, bi ber êrîşekê, me xwest ku em bajêr

dîsa bêxin destê xwe. Du cara, em gihaştin nav bajêr, lê her du cara jî em bi şûnda vegerandin.

Di van lihevxistinan de, yek ji fermendarên me yên mêrtir û hêjatir, heval Şpak hate kuştin.

Ji gundê Totaroskokyê, me xwe kişande ser Nevîmoskaya. Di van şeran de, ji bo êrîşa Stavropol, li ber çe mê Manîç, bergeheke nû hate danîn. Bi mifrezeyên piçûk, me avêt ser bajêr, lê, li Medevêdka em bi şûnda hatin êxistin. Li wê, nexweşiya tifûs ez avêtim erdê. Bi birîndaran reez birim Piyatîgrosk û ji wê Viladîkokaz.

Li wê jî, binexweşiya (Paratîfoîd), ez dîsa ketim nav nivîna. Ez hêdî, hêdî dihatim ser xwe. Tîfus, û Paratîfoîd, ez yekcar ji qiwet xistibûm û xwarina xestexanê jî, ne dihate xwarin. Hingê, Çeteyên Ûrisên Spî, dest bi êrîşî kir. Rojekê, me dengê topa bihîst; xestexane, wek kumîroyekê fûrî...

—Rûsên Spî.. Rûsên Spî... Ev pirs li dora me, ji devê her kesî derdiketin. Ên ku dikarîn ji piya pisekinin, lez didan xwe ku ji xestexanê derkevin.

Li cem min Kozakek ji Kûban hebû; rabû ser xwe û cilê xwe xwest.

—Tu diçî? Min jê pirsî.

—Herê.

—Kû da?

—Xwe bigehînim ordiya xwe.

—Lê, ka binêr! Tu bi zor xwe li ser piya digirî...

—Xem nake, li derve, ezê xurt bibim. Ma tu dixwazî ez livir bimînim da ku Rûsên Spî bên û min bidin ber xencera?

Kozakê me ji xestexanê derket. Min jî dil kir ku ez herim, lê, ez ewqas sist bûm ku bê arîkariya tu kesî, min ne dikarî li odeya xestexanê bixwe bimeşim.

«Çiqa ji min bê, ezê xwe zû, zû, rahet bikim!.»

Ev xwestin di min de ewqas xurt bû ku, yek dikare bêje, ewê di çend rojan de ez bi qiwet kirim. Di nav odê de, ez êdî, bi tena xwe dimeşiyam, nêzîkî pencereya dibûm û guhê xwe dida dengê tifinga. Şer êdî, li nav bajêr çêdibû. Rojekê, sere sibê me bihîst ku Rûsên Spî ketine nav bajêr û ew girtine.

Piştî çend saetan, Kozak hatin xestexanê; li Kozakên komunîst û li Drûjana xwe digeriyan; gava ji wan didîtin ew di cî de dibirin hewşê û ew didan ber tifinga.

Serê minê rût û riha min a li xestexanê dirêj bûyî, şik xiste dilê wan ku ez cuhî me.

—Tu cuhî yî! Digotin min, her du milên min digirtin û ez dihejandim.

—Na, ez kurd im.

—Tu derewa dikî û ev?... Berde!... Binêrin... Bi zor derpiyê min daxistin. Min digote wan ku ez misilman im û ku... Şewata derbekê qemçî, gotinên min dan birîn. Ez avêtim erdê û bi kulma bi min ketin. Di vê gavê de, Sertebîb xwe gihande hewara min. Li ser milên wî nîşanên zabita hebûn:

—Ev çi ye? Çi dikin? Ewî qîr kire kozakan.

—Ez benî, em hêsaba cuhîyekî dibînin...

—Kê gote we ku ev cuhî ye?...

—Cuhî bi xwe ye. Ez benî... Livir, temaşe bike!...

—Ev kurd e, misilman e... Wî di cî de berdin!...

Kozaka, şaş bûyî, ez berdam; lê ne bi dilê wan bû. Gava derdiketin qîr kirin min:

—Emê dîsa bêne te, tu ji destê me nafilitî...

Wê şevê, ji derba ketî, mest û helak, min ji nexweşnêr hêvî kir ku ji min re cilekî peyda bike. Ên hevalên me yên mirî, giş li wê bûn. Pîrê ji min re pantalonek qetiyayî û çakêtek anîn. Ber bi sibê ve, min xestexane berda, û li derve,

rastî ermeniyên mihacir hatim ku bi min gelek şı bûn. Yek ji wan, Xaço, nasekê me yê kevin bû.

Li bajêr, talan û vegirtina xaniyan bê perwa dom dikir. Xwe veşartin dijwar û bi xeter bû. Xwediyên xaniyan ji bo nefsa xwe dilerizîn. Tu kes ne dikarî gazina ji wan bike, ji ber ku li kuçan, li ber deriyan, komunîst, eskerên Ordiya Sor, û herçî kesên ku ew vedişartin, didan ber tifinga an bidarve dikirin. Li nav bajêr ger bi xwe, bi xeter bû; eger hema, kêfa kozakekî serxweş bi rûyê yekî ne hata, di cî de, şeşderba xwe derdixist û ew di serê wî de vala dikir.

Dawiyê, jina Xaço, derketina min ji mal minasiptir dî. Êvarekê, Xaço ji min re nan û kartol dan û ez bi rê ketim. Bi şevê, ez ji bajêr derketim; armanca min ew bû ku di eniya rûsên Spî re derbaz bim û xwe bigehînim Sora. Piştî çend rojan ez gihaştim gundê Qîzler. Min ne pere ne jî nan hebû.

Ermeniyekî dewlemend ez birim cem xwe ku ez jê re bexçevaniyê bikim.

Digotin ku di van rojan de, Sora, di nav qamîşa de xwe dabûn xuya kirin. Bi kêfxweşî, min guh dida van xebera, û, ji bin de jî min xwe pêktanî ku ez dom bi riya vwe bikim. Piştî çend rojan, firseteke xweş kete destê min.

Carekê, çend zabitên serxweş hatibûn bexçeyê me. Efendiyê min ji wan tirsiyayî, ji wan re xwarin, vexwarin jin anîn û sefahet destpê kir. Heta sibê, heya bêhiş ketin, vexwarin. Hinek ji wan, mest bûyî, li bexçê, li bin sitêra raketin.

Wê şevê, xew qet ne ket çavên min û min seyra sefaheta wan a kirêt kir. Gava giş serxweş ketin min xiste eqlê xwe ku ez çekên wan bidizim û xwe bavêjim nav qamîşa. Du tifingên Kozaka, li ber masê avêtî bûn, lê, rext li raketiyan bûn. Min bêbna xwe girt û çar lepika, xwe gihande Kozakekî, rextê wî birî, tifing girt û ji wê reviyam. Mîdeteke dirêj, bêî ku rastî hevalên xwe yên Sor bêm, ez di nav qamîşa de geriyam.

Ji teab ketî, min xwe dirêj kir ku hinekî bêhna xwe bis-

tînim.

Hindik ma bû ku ez di xew herim, çend zilama xwe avêtin min û di nav milên xwe de ez givaştim. Min zorda xwe ku ji destê wan bifilitim, lê ez xuat girtibûm û li berîkên min dige. riyan. Min baş li rûyê wan nêrî û ji nişkave, kenekê ez girtim.. Ne xwe, ew bûn... Fedaiyên me yên sor bi xwe bûn...

Gava zanîn ez kî me, ez birim mifrezeya canbêzara. Li çiyan, li dar û deviyan me xwe diveşart û me davêt ser tirênên çek û posatşer, û yekîneyên piçûk ên Rûsên Spî. Me riya eskerên Jeneral Dratsenko ên şikestî digirt û gelek xisar didan ordiya Şkûro ya par û mar bûyî. Di van roja de, Ordiya Sor jî, eskerên Jeneral Denînkîn, ji Xarkof derdikirin.

Di bihara sala 1920 de, li Georgîviyesk, me xwe gihande Ordiya sor.

Li Qefqasiyaya Bakur, dijminên Sewreya Sor şikestibûn û hemu eniyên şer ji wan pak bûbûn. Em, şerevan bi xwe, çûn eniyeke nû, eniya ava û sazkirina abûriya (iqtisadiyat) Qefqasiya ya hilweşiya yî.

## 4-Veger.

Salên Şerê Hindur, ji bo mideteke dirêj, ji Kurdistan, ji welatê min ez bi dûr xistibûm. Di Sibata Sala 1924 de, partiya me ez rêkirim Ermenistanê da ku li wê, di nav Kurda de bixebitim. Komîteya Navçe (Licne Merkezî) ya partiya Komunîsta Ermenistanê, ez tayin kirim ku bi îşên (Eqeliyatên Qewmî) mijûl bibim. Ji wê rojê de, rûpela jiyina min a nû despê kir. Mın xwe xist şerê xwînmijên miletê kurd: şerê axa teşnaq û bega, da ku li şûna wan, li warên koçer, û li gundan, sovietên gundî, emele û febrîka, pêkbînim.

Bi dilxweşiyeke mezin, min çiya, û çêreyên welatê xwe dîtin, ciyên ku di piçûkahiya xwe de, min bi bav û brayên xwe re keriyên xelkê çêrandibûn.

Mij, hin bi hin stûrtir û bi xoftir dibû û serê Axrî yê bi

ewir, ji min vedişart. «Dê û bavên min, hîn sax in, gelo?» Di dilê xwe de min ji xwe dipirsî, û hêdî, hêdî, nêzîkî çiyayên gundê xwe yên kesk dibûm.

Va ne, holikên me, yên di erdê de temirî! Lê çi qewimiye? Gundên kurdan giş vala bûn. Derî û pencereyên xaniyan vekirî bûn... Çi bi gundiya hatibû?... Xelîl li kû ye?... Bavo, Yadê?.,. Ez daketim newalê. Di çemê şile re ku sînorên gundên Ermenî û Kurd pêk tîne, derbazbûm û li ber xaniyê pêşîn sekinîm. Ermeniyekî porspî, di bîstanekî de erd dikola.

—Heval! Min gotê, kurd li kû ne?

Ewî, çavên xwe yên nîv kor rakirin ser min, bi milê xwe xweydana xwe paqij kir:

—Gelo tu nizanî? Ewî bi bê bawerî, vegerande min û dîsa ziviri şixulê xwe.

—Guh bide min, min gotê û ji hesp hatim xwar. Bêje min, diya min, bavê min Şemo, li kû ne?

—Şemo? Ma tu nuhatî yî?

—Belê.

—Ew giş çûne... Kalo destê xwe dirêjî çiyan kir.

—Kû da?

—Ser çiyayê Alagozê.

—Alagozê? ji mêjve?

—Belê, ji mêjve. Here li wan deran bigere...

Piştjre, kalo, pişta xwe, bi awakî welê da min, min fehim kir ku êdî tu gotinên wî ne mabûn.

Piştî ji mal derketina min bi çend rojan, hikim ketibû destê partiya Taşnaq. Ev partiya ermeniyên dewlemend, a dijminên sewrê, ûya dijminên hiqûqnasên gundî û xebatkeran bû. Armanca wê ev bû: Pêkanîna Ermenistanekê ji deryakê heya derya din ango ji derya Reş heya Derya Spî. Ji bo bi cî anî-

na vê armancê, ewê qelandina kurdên Ermenistanê danibû ber xwe; da ku bi timamî paşiya xwe ji wan pak bike û piştire bi hemu qiwetên xwe, xwe bavêje ser Kurdistana Tirkiyê.

Ji lewre, nihu min gund vala didîtin û ezab û işkenceyên xebatker û feqîrên kurd, dihatin ber çavên min. Kurdên ku min li bakurê Qefqasiyê, dibûn, ji min re qala zilma Taşnaqan kiribûn.

Çeteyên Taşnaq, bi çekên ku Ordiya Qeyser li Ermenistanê hiştibûn, gundên kurd û tirkmen, talan û wêran dikirin.

Lê, eşîrên ku, wek Sipkî, Heseni û Zukrî, serekên wan hikmê partiya Taşnaq qebûl kiribûn, li ciyê xwe mabûn. Mezinên wan ritbe û nîşan standibûn. Hinek ji wan bûbûn efser (zabit). Van axa û bega, ji Taşnaqa re eskerên kurd pêk anîbûn, û pê, bi hevaltiya Taşnaqa, feqîr û xebatker diqelandin. Li ser her mifrezekê kurd, Taşnaqa yek ji zilamên xwe yên mixlis datanîn. Li miqabilê vê arîkariyê, begên kurd ji nûve, sixreyên derebegitiyê danîbûn; heta, ewên ku di zemanê Qeyser de bi xwe hatibûn rakirin jî. Xebatker, êdî ji taqet diketin, Taşnaq, mawzer di dest de di bin emrên Ximpabêt (serekên çete) ên xwe, li gora dilê xwe, dikuştin, talan dikirin, dişewitandin, xelk didan ber xencera. Tu kesî ne dikarî serê xwe li ber wan rake. Serekê eşîra Zerkî, Cangîr axa, bûbû serfermendarê qiwetên kurdî û, ritbeya serheng (mîrelay) standibû. Ûsif beg Teymurof jî, di civatmileta Taşnaqan de nemînende bû.

Beg har bûbûn. Kê bi emrê wan ne dikir, heya bikeve ber mirinê, dihate lêxistin; milk û pez û dewarê wî jê dihatin standin. Ji bo Ordiya Taşnaq, bêşên bilind hatibûn avêtin ser xelkê, dewar û zadên wan, bê hisab û kitab, dihatin zeft kirin. Lê, para şêr, dîsa di destê began de dima.

Egîd beg Teymurof, ji aliyê Taşnaqan, serekê polîs ta-

yin bûbû; bi zilm û bi bê wicdanî, mala xelkê dişewitand û eşîra Şerqî tanî helakê. Her wekî, Şerqiyan êdî ne dikarîn hikma Taşnaqan hilgirin, li deşta Serdar- Abad isyan kiribûn û danîna hikma Sovietan xwestibûn. Ji bo şerê wan, Taşnaqa li bin fermendariya Garo Sasonî, ordiya xwe rêkiribûn. Eşîra Şerqî ya piçûk, bê çek û bê arîkar ne dikarî li ber alayên Taşnaq ên heya diranên xwe çek kirî, xwe pir bigire. Isyana wan ne çû serî, û rebena ji destê Taşnaqan, işkenceyên li tn deran ne didîtî kişandin; her tiştê wan hate hilwêşandin û ew bi xwe di xwîna xwe de hatin xeriqandin...

Çend rojan, bi ûmida peydakirina dê û bavê xwe, ez gund bi gund geriyam, lê, tu kesî ne dikarî min li ser wan ageh bike. Her wekî kurd girêdayî adetên xwe bûn, gava min, behsa wan dikir, serê xwe xwar dikirin û bê deng diman.

Hingê, Min zanî ku felaketek hatiye serê dê û bavê min. Min berê xwe da Alagozê, cem kurdên koçer. Di niqtekê de min bi xwe re jendirmeyek bir û êvara roja dîtir, hêdî, hêdî, di şiveriyeke teng re, em digihaştin çiyê. Hespên me di kaşa çiyê re, bihn çikandî, bi rê ve diçûn.

Bîsteke dî em ketin merceke piçûk. Li vê, Li wê, ber bi geliyê ve, konên reş hatibûn danînin. Li ber konekî, kurd kom bûbûn; em li cem wan sekinîn û ji wan hêvî kir ku konê Sereka Sovyeta şanî me bidin. Giş li hev nêrîn û destê xwe direjî deştê kirin:

—Sovyet li wê ne, cem me, li vir, hîn axa û şêx in.

—Ev çêre, ya kîjan eşîrê ye? Min pirsî.

—Ya eşîra Hesenî ye.

—Serek kî ye?

—Elîxan beg Teymurof, yekî ji wan got. Û serekê çêre jî, Şêx Silêyman e. Tu bêfeyde pirsa sovyetan dikî. Piştire konekî mezin û zengîn şanî min da û bi ser de ajot: -Mistefa beg Teymurof hatiye; ew hez nake ku kurda behsa sovyetan bi-

in.

Zilamekî bejin kin, ji kon derket û ber bi me ve hat. Ji kemera wî ya ziv xencerek daleqandî bû. Di destê wî de, qemçiyeke bi qebda zêrîn hebû. Kurdan, li ber wî xwe heya erdê tewandin.

—Çi dixwazin? Bi rûsî, ewî ji me pirsî.

—Îşê me bi serekê soviyetê re heye, bi nermi, min vegerandê.

Mistefa beg kenî:

—Serekê eşîr pismamê min e, û mala wî, ha, li wê ye! Ewî gote me û bi destê xwe newalek, di mija êvraê de nîv xuya, şanî me da.

—Sipas, min gotê û hespê xwe dirêjî konê pismamê wî kir.

Li ber devê newal, bi tenê bi kevir dora wan girtî, konên kurdên feqîr hebûn. Li ber deriyê yekî ji wan, jinikeke bejin bilind û porspî, disekinî. Min silav lê kir; rû û dengê wê, tiştek ji zarotiya min a dûrketî, anî bîra min.

Min bala xwe dayê:

—Xaltika Parê! Min qîr kirê û ji hesp hatim xwar. Ew, tirsiyayî xwe bi şûn de da.

—Ez Ereb im, Ereb Şemo. Ez nayim bîra te, Xaltika Parê?

—Na, tu ne Ereb î, tu bê simbêl î, te rûyê xwe kur kiriye! Ewê bi hişkî gote min.

Hingê hate bîra min ku li cem kurda, kurkirina Simbêl guneheke mezin bû.

Min gelek xwe westand da ku baweriya wê bînim ku ez Ereb Şemoyê şivan bi xwe bûm, ku pir caran, ewê ez ji destê bavê min derêxistibûm, gava, ewî dikir ku li min xe. Ser van gotinan, êdî, tu şikên wê ne mabûn û bi kenekê dilxweşiyê ez ezimandim mala xwe. Em ketin konê wê yê dîsa weke

berê perîşan. Di cî de, Xaltîka Parê, xwe da xebatê da ku ji me re xwarinekê pêk bîne.

—Ereb, çi hatiye serê te? Muyên spî ketine porê te... Û destê xwe li ser serê min gerand.

Min hingê behsa Rûsyaya Sovyetî û şerê hundir kir, û, ji vî bi şûnda, kurd êdî çawa wê bijîn, gotê. Bi şev dereng, Ge lo, mêrê Xaltika Parê, hate mal. Ewî, ji sibê heya wê demê, şixulê begê xwe dikir. Gava bihîst ku ez kurê Şemo me, bi kêfxweşî silavli min kir û rûnişt. Dûm û dirêj, li ser kurda me ji xwe re axaft.

Çar sal bûn ku nîzama sovyetî, li Ermenistanê hatibû danîn, lê, gundî û koçerên kurd, dîsa wek berê, bi isûla eşîrtî dijîn, li ser wan, dîsa, axa an kurên wan hikim dikir. Hîn, meclisên eşraf û dewlemendan hebûn, û. şêxa jî ji aliyê xwe gundî û rencberên kurd bi navê dîn tazî dikirin. Isûlên istismara kurda weke berê diman, bi tenê rengê wan guhirî bûn. Nihu, axa û beg, şûna ku rast bi rast bi destê xwe, xelkê biêşînin û malên wan bixwin, şêx didan pêşiya xwe.

Perçeyên erd, çêre û zozanên baştir, di destê beg û gundiyên dewlemend de bûn.

Û yên ku bi kêrî tu tiştî ne dihatin, ji gundiyên feqîr, rencber û belengazan re hatibûn hiştin, Keriyên bega, bi sedan ve serî, ji bêşa miaf bûn, ji ber ku xwediyên wan li ser hikim bûn. Edalet ji bi awayê berê, dîsa bi destê began dihate bi cî anîn. Di nav eşîrê de, ji bo neheqî û mixalefeteke, axa û bega pez an pere distandin, bê şik ku ji bo xwe, lê ne ji bo yên ziyan dîtî.

Xelk hîn xûkî didan beg û axan; lê nihu jê re (reeû) digotin. Zilamên bega ên xas hebûn, ku xweş têr kirî, li ber derê, pesnê begên xwe didan û ew parazkerên feqîran, didan zanîn. Gava Nemînendekî sovyetî dihate wê derê, ev xulam diçûn pêşiya wî û li singa xwe dixistin û qîr dikirin ku di

nav eşîrė de hikim gelek baş e, û feqîr ji her tada û neheqiyê hatine parastin. Kurda ciyên qemçiyên bega xweş tanîn bîra xwe lê ne diwêrîn rastiyê bibêjin nemînendeyên Sovi yetan. Ji çîrokên Gelo, yekî xweş his dikir ku ev kurdên perîşan li riyekê digeriyan ku ji bin zilmê xilas bibin. Gava, Gelo bîhîst ku ez ji Erîvanê hatibûm rêkirin da ku kurdên feqîr bigehînim hev, erd û çêre ji destê bega û axa bistînim û wanji yên mihtac re par bikim, bi tirs gote min:

—Ereb, beg axa û dewlemend û xurt in, lê, em bi xwe?... Û Gelo çavên xwe li konê xwe yê rût gerandin.

—Divê arîkariya Hikma Sovyetî bikin, da ku xelk ji zilma axa, beg û dewlemenda xilas bikin. Divė ku hemu kurd ji xwe re soviyetan deynin, min gotê.

Piştî ku ez bi Gelo re li hev hatim ku êvarê hemu kurdên rencber û feqîr li mala xwe bicivîne, ez sibê zû, ji mal derketim. Nîro, em gihan çêreya Yûsif beg, serekê Eşîra Hesenî. Li wê, li meydaneke piçûk, bîstek siwarî li hev gihabûn, û gundiyên feqîr jî, li dora wan kom bûbûn.

—Cirid! hevalê min gote min.

Siwara, bi qîrîn, serê hespên xwe ber bi nevalê ve berdan û darên xwe avêtin hev.

Şêx, beg û maldar, li alikî, li cem hev bûn û li lêstikê dinêrîn. Gava em ji wan xuya bûn, Elîxan beg hate pêşiya me; ew ji berê de ageh kiribûn. Deh gava ji me wê de, ji hesp hate xwar û bi rûsî, xêrhatin da me.

—Li vir Serek kî ye? Min jê pirsî û li koma beg, şêx û maldaran nêrî.

—Ez im, xulamê Dewleta Sovietên Lenîn, Serekê Koçerên Eşîra Hesenî, Elîxan beg disa silav da û xwe xwar kir. Em kurd bi xwe mileteki piçûk in, em têkilî tu kesî nabin, û tu kes ji bela xwe nade me. Miletê me bi xweşî dijî û giş ji nizama Lenîn razi ne, Elîxan beg gote min.

Min dîsa çavên xwe li dora xwe gerandin û li ser balagihên nerim pal dayî, min kalekî porspî dî. Bi giranî ewê silav da me û em ezimandin konê xwe. Elîxan û Yûsif beg ne dizanîn ku ez kurd im û bi hev re serbest bi kurdî xeber didan. Beg, şêx, maldar û mela, li dora me li serçoga rûniştin. Ez gelek kêfxweş bûm ku ez wek biyanî dizanîm.

Gava Yûsif beg bibîst kû ez ji Erîvanê têm, dest bi pesandina Nîzama Sovyetî kir.

Li ser (destexaneki), xwarin danîn ber me

—Va ye xwarina me. Ûsif beg gote min; em miletekî gelek feqîr in. Berê herkesî, Tirka û Ûrisa li me tada dikirin, lê nihu, li bin hikma Sovyetî, jiyîna me xweştir bûye. Dengê xwe hinekî birî û li dora xwe nêrî. Guhdarên wî, giş bi teyid serê xwe hijandin

—Em bi nizama Sovyetî pir kêfxweş in. Em ne Qeyser ne jî dewleteke kurdî ya bi serê xwe dixwazin. Em koçerên serbest in. Heta zimanê me bi xwe nîn e.

—Zimanê kurda nîn e?!! Min gote Yûsif beg û xwe şaş nîşan da.

—Me çi ziman heye? Li vir em bi rûsî, û li minteqa Abaran, kurdên me bi ermenî dixwinin.

Min dengê xwe ne kir.

Êvarê, keriyên pezên bê bed û hêsab, li ber konên Yûsif beg bûn kom- Ev e balê te yê qedandinê? Min di dile xwe de got û li ber deh, donzde şivanên bi kincên peritî, li hezaran seriyên pez nêrî.

Me izin ji wan xwest û me berê xwe da konê Gelo. Li wê, kurdên belengaz li benda me bisekiniyan...

Wê şeva ha, di nav tehtan de, li cem kona, civîna kurdên feqir yên Alagozê ya pêşîn hate danîn. Koçera, bê deng, guh dan gotinên min ên li ser Soviyetan.

Min gote wan ku Lenîn dixwest ku miletê kurd azad

bibe, di xweşiyê de bijî û ji destê axa, beg û dewlemenda xilas bibe...

Piştî civînê, kurdên feqîr, dîsa bê deng ji hev cuda bûn, da ku sibê herin û ji gund iyên din re gotinên min belav bikin. Ev civîna me ya pêşîn, bê deng derbaz bû, lê, piştî vegera me, çiya û deşt û zozan, wek lehiyekê, xwe hildan:

—Erebê Şivan! Erebê Şemo, Lenîn bi xwe ew rêkiriye da ku me ji bindestî, perîşanî, nezanî û zilmê, xilas bike... Kurda digotin.

Adetên çend sed sala xebatker û rencberên kurd elimandibûn sebrê. Ji lewre, ewan bi tirs û bi dizî ji halên xwe gazin dikirin. Li cem kurdên gundî, berê hatina min jî, li hinek ciyan, soviyetên gunda hatibûn danîn. Lê, hin dewlemend jî ketibûn nav wan.

Serekê yekê ji van Soviyeta, hevalê min, Xelîl bi xwe bû. Min ev gund, ji bo şerê beg, axa, û şêxa, ji xwe re kire qerargeh. Li wê, bi saz û gihandina xortên kurd me destpê kir.

Ji bo peydakirina dê û bavê xwe ez gihaştim heya Tiflîsê, û li wê, xweşka min, ji çihatibû serê wan ez ageh kirim.

Piştî çûna min ji mal, Taşnaqa, bavê min gelek êşandibûn da ku bikin ku min vegerîne mal. Bavê min, ji bêgaviyê bi kifletên xwe ve, ji welêt derketibû û çûbû mintiqeya Aleksendropol. Piştî wî, gelek mihacirên kurd hatibûn wê derê.

Lê, li wê jî, kîn û dijmintî xistibûn nav mileta, û serekên eskerî bi kêfa xwe hereket dikirin. Carekê, ximpabêtên Taşnaq, bavê min biribûn derve û *ew* êdî venegerandibûn. Piştî çend roja, nêzîkî gundekî, bavê min kuştî dibûn.

Xwişka min jî bi yadê re derketibû çiyê; li wê diya min jî ji nêza miribû.

Bi vî awayî, min ixtiyarên xwe sax ne dîn. Ez vegeriyam

ser karên xwe. Di nav salekê de, min ji feqîr û rencbera, fireqeke xurt pêk anî. Di sala 1925 an de, beg ji hiqûqên siyasî ketin; feqîr ew ne dihiştin ku bikevin civînên wan. Şerekî dijwar di nav me û wan destpê kir. Bega xwestin ku xelk li me rakin. Şêx û mela lanetê Xwedê li min û li hevalên min berandin û em xayinên dîn, dijminên miletê kurd, dijminên miqedesat û yên adetên bav û kalan, îlan kirin.

Ji bo parastina mezinahî, hikim û dewlemendiya xwe, û, ji bo cahîl, sefîl û perîşan hiştina rencber û xebatkerên kurd, şêx, axa û bega, miraceatî her tişt kirin, li kuştina me bi xwe geriyan, lê me guh ne da wan *û* li ser riya xwe bê tirs û telaş meşiyan.

Di sala 1925 an de, li hemu *w*arên koçeran, soviyet hatin bijartin. Bi vî awayî, me dawiya zilim, neheqî û zorkeiya beg û axa û şêxên kurd anî.

# KURDÊN ALAGOZ

# I-Tirsa Derebegên Alagoz.

Çiyayê Alogoz, çiyakî gelek mezin û asê ye; ji beriya Serdarabad digehe heya geliyê Mîsxan. Bi tenêkoçer derdikevin zozanên wî, û li wê, keriyên xwe diçêrînin.

Pozê wî yê bilintir, li ra serê çar qezayên Ermenistanê yên mezin dinêre. Eberan, Mela Gogteha, Talîn û Aştarak Ji dûr ve, yek dikare li serdirêjahî û pehnayiyê wî, bibîne. Li wê, ewir, wek pêlên derya yên bi kef, kom dibin. Ezman jî, li wê şîn, vala û bê hed e. Alagoz, di ser deşta Erîva a dewlemend re, hilbûye, û, rojên germ ên havînê, di rojên paleyî yên dijwar de, çavên xebatkerên ji teab û germiyê ketî, li serê wî yê bi berf dinêrin.

—Gezo, kurdek ji hevalê xwe re dibêje û bi destê xwe serê pozê Alagoz şanî dide, nihu li wê ba çiqa hênik e, li nêzîkî berfa ku li wê me par şivantî dikir.

—Belê, Beko. Eger me bizaniya ku axa û şêxên me, em dixapandin, qet me keriyên wan diçêrandin? Careke, bifikir! Ez pênc sala. bi kifletên xwe re, çûm ber pezê Egîd û Mecîd beg; lê, di dawiyê de bêi ku tişteki bidin min ez qewirandim. Min li cem mezinê wan giliyê xwe kir, ewî, di ser de, şûna ku heqê min bide, ez dam ber dara, çima min ji bega gazin kiribûn...

—Oh, Xwedê; Te welê kiriye, te ew dewlemend û em feqîr kirine!...

Her du jî xwe bê deng dikin û melûl, destên wan hîn bêtir qebdên xenceran digivêsir

Ezman erd ji gelekî nêzîk ve dipêçand, herwekî dixwest wî himbêz bike, roj ewqas xurt diçirisî, wa dixuya ku ewê di germiya xwe de bihele.

Gezo û Beko, piştî paleyiyê, vedigeriyan malên xwe, û, ji pereyên ku kar kiribûn, kêfxweş bi rê ve diçûn.

Nêzîkî çiyê bûbûn; bayekî honik ji quntarên Alagoz ew baweşandin. Xiftanên wan vekirî, dilşa dimeşiyan û bêhna kulîlkên çolê ya xweş dikişandin hindurê xwe.

Gava Gezo û Beko gihaştin gundê xwe, Şemîran, roj çûbû ava û pez û dewar digihaştin mal.

Li dora gund, li ser mêrgê, qederê du sed zilam kom bûbûn. Gezo û beko firsiyan:

—Ev, her hal, begên me ne kêf dikin, Beko got, eger me bibînin ewê ji me xercê begîtiyê bixwazin.

Emê li benda şevê bimînin, Gezo vegerand, û emê piştire, ji wî alî bikevin gund.

Her du jî li wê, qederekê, bê deng man, lê piştire da ku bizanin li wê çi derbaz dibû, hêdî, hêdî, bi dizî, û di tariyê de, xwe gihandin nêzikî xelkê.

Qeliya koçeran di distan de sor dibû, agirê êzînga pêt didan. Li jor, li ezmên, stêr bi ronahiya xwe ya sar dçirisîn. Li ber êgir, li ser doşek û balgihên nerm beg û axa rûniştibûn. Hempa (dewlemend) li cem wan cî girtibûn.

Li paş wan, xulamên wan, heya diranên xwe, bi xencer, şûr, debençe û tifing, çek kirî, disekinîn.

Ji wan dûr, gundiyên feqîr, li benda emrên *wan*, serê wan xwar, li ser hev kom bûbûn.

Begek ji wan rabû û bi awirên tûj li dora xwe nêrî:

—Berî peydabûna vî komunîstê ha, her tişt xweş dimeşiya. Me xwe bi xwe îdare dikir. Xortên me bi gotinên mezinên xwe dikirin, lê. bi hatina wî. her tişt guhirî.

Şemoyê Oso, mêrxas û egîdê began, ji ciyê xwe rabû û got:

—Ewî ez ji serektiya gund avêtim û got ku ez hempa me (gundiyê dewlemend).

—Zugirt ku gub didine wî gelek in; ew jî bêbextiya adet û isûlên eşîrtiyê dikin û di riya mezin û kalan re nameşin.

Binêrin, meselen, kurê şivanê me; bere ji bo perçekî nan l; cem Mihê dişixulî, û nihu ji giliyi wî kiriye da ku Mihê kiriya wî giş bidiyê. Ev tişt, giş ji kû tên? Bê şik, ji vi komunîstê; ewê wan hemuya ji rê derêxe, Yusif beg bi ser de ajot.

Tu deng nîn e. Qelî di rûn de diqijqije, û ba, bêhna wê dibe ji feqîran re ku li jêr rûniştine. Bayekî sar tê.

Dîsa bêdengî. Şêxê mezin radide:

—Hun dizanin çima, Yûsif beg, Cangir beg û Egîd beg, hun li vir civandin? Ewan hun civandin da ku hun, Xelkê Eśîra, zilamên sadiq û mêrxas, kêla xwe bînin, dilşa bibin! Hûn, xadimên dîn û Xwedê!!...

Bi dor ji gundiya re şerbet didin.

—Bi xweşiya begê min! Şemoyê Oso dike qir.

Evê ha, li gora talîmatên bega, mala feqîr û fiqereyan dişewitîne. Ji lewre xelk jê ditirsin. Duhî bi xwe, çûbû talana eşira Şerqî, ku ji weslê Taşnaqa de rabûbû began.

—Serekê eşîra Şerqî dixwaze bi me re bibe, Şemoyê Oso dibêje, lê ev komûnistên zugirt *wî* nahêlin

—Xulamên min, eşira min a sadiq! Ûsif beg destpê kir.

—Hun dizanin ku bavê min, bapirên min û kalanên min, mezinahî li we dikir. Em, nihu ji heft bava ye ku serektiya we dikin. Hun ji me re sadiq û mûti bûn û hun ji adatên eşîrtiyê dernediketin. Mala Yûsif beg a miqedes û nanê wi, hun ji bela, nexweşî û perîşaniyê, û, pez û dewarên we jî ji êşa parastin. Lê, nihu hikmeke nû derketiye, hikmeke ku ne dîn û ne Xwedê dinase. Li gora vê nîzamê, divê herkes feqir, belengaz û zugirt bibe, û tu kes jî dewlemend nebe. Hingê feqir di nav eşirê de, wê çava bijîn? Keleş, meselen, û bin perîşanên din, eger keriyên Xûdo ne bûna, ewê nanê xwe ji kû derêxistana? Na, ev nizam bi kêrî koçerên wek me nayê. Bi çi awayî ku be, bi arîkariya Xwedê, îro kurê min we îdare dike, û Cangîr beg jî li ser eşîra xwe yê. Me, bi

vi awayi xwe xweş îdare dikir û tu kesîjî ji rè dernedîket. Lê, va ye, em nizanin ji kû û çawa hat? Kurê şivanê meyê kevin, Misto. Ewî bêbextî li dîn, malbat û miletè xwe kir û çû ji xwe re jineke ûris anî, ji dîn derketiye, Xwedê nas nake, bûye (komunîst), simhèlê xwe kurkiriye, û yek dibê qey gawirek e. Û ketiye nav şivan û gavanên ehmeq û wan dixapîne. Ew ji bêbextî li dînê xwe dikin û dikevin dû wî, û xort jî xwe komsomol (xortên komunîst) dinivîsin.

—Ev e mehek e ku ketiye dû min, şivanè Mecîd beg dibêje.

—Ev pîsê ha, Yûsif beg dom dike, nihu ji dixebite ku, her wekî gotine min, me bê çek bike. Çi dixwaze? Em ji heqê intixabatè dûr xistin û nihu jî çekèn me ji me distîne, dixwaze çekên malbata me, çekên bav û kalanèn me, ji destên me derêne.

—Xadimên min ên sadiq, xelkè eşîra! Bi çi awayî ku bedivê em xwe ji Misto xilas bikin. Malê beg pir e, heya hun bixwazin ewêpez bide we, konekî mezin wê bide we, bi şerta ku hun wî winda bikin.

—Bi navê Xwedê, bi navè dîn û iman, bi pakiya eşîra kurdî, divê hun wî sax nehêlin!!

Li ser van gotina, beg, axa, pisaxa û şêx rabûn û ji zilamên xwe re, dest bi belavkirina diyariya kirin. Di nav feqîra de, ewê pêşîn ku qebûl ne kir tiştekî wan bistîne, rencberek ji eşîra Zukrî, Edê bû. Di cî de, hemu dewlemend û mirovên wan, xwe avêtin wî û kirin ku wî bitirsînin:

—Pîsê heram! Tu bi me re bèbextiyè dikî??»

—Edê xwe ji nav koma dewlemenda derêxist û xwe gigande feqîra ku wek keriyekî xwe digihandin hev.. Tu tehdid Edê ne ditirsand. Ew ji nihu de, di sovyetekê de bûbû endam û guhdariya gotarên nemînendeyên Hikumetè kiribû, û, ewî xweş dizanî ku, di nèzik de, destê prolêtariya (xebatke-

rên feqîr) wê bigihişta van çiyan iî û ewê dawiya van tiralên xwînmij, hianiya...

Hempa, tevde ji serekên eşîra re sond dixwarin ku ewê heya dawiyê bi wan re bimînin. Lê, feqîra bi xwe, xwe da bûnalîkî û bêmad, û bê deng, li wan dinêrîn. Pîr Ebas xwe nêzîki wan kir;

—Heft salan, min mixtarî kir û min tu cara xwedê ji bîra xwe derñexist; lê, hun wek berxa, ji aliyê vî Xwedanenas hatin xapandin!...

—Tu tişt ne qewimiye, cemaet vegerandê.

—Belê, nihu ji we re, bi qemçiya xwe, çawişekî jendirma lazim e, yan ua diviya bû ev wezîfe bidana min da ku min hun bielimendana itaeta beg û rispiyên we û ne ya Misto. Pîr Ebas di nav diranên xwe re ev gotin fîkandin.

—Bira bawer nekin, Mecîd beg ji aliyê xwe bi dengekî bilind got ku, Bolşevîk wê pir dom bikin. Di nêzîkê de ewê dîsa bikevin bin qemçiya me, û emê bingê şanî wan bidin...

Ji şerabê serxweş ketî. beg çi dihate ser zimanê wan digotin. Mecîd beg rabû. derfekê şerabê di destekî û piyanek jî di destê din de, bi hejandinê,. xwe gihande feqira ku şerabê bide wan. Li gora adetên kevin, herwekî beg bi xwe xizmet dikir, diviya bû ku herkes ji destê wî qedehê bistîne û vexwe. Hate ber Edê:-Kuro!. Di wextê Taşnaqa de ez zabit bûm û nihu. kerê mezin. tu li min xwar dinêrî... Ezê şanî te bididim.. Bigir, vexwe!... Piyanakî tije şerab dibe ber devê Edê.

—Mecîd beg ez venaxwim, ez tayî me.

—Serseriyê mezin! Mecîd beg bi tinazkire qîr, tu nizanî ku şerab ta dikuje? Ewî qedeh danî ser lêvên Edê.

Lê. Edê qet venexwar û feqîrên din jî. jê tam ne kirin. Şêx, axa. û rîspî, bi eşkere dijun lê. kirin; çima ji destê beg qedeh ne girtibû, û, ji rûyê wî, feqîrên din jî, venexwaribûn.

Goşt, nan û şerab, heya sibê, ji maseyan kêm ne bûn. Têşnaqek di nav Yûsif û Cangîr beg de rûniştî bû, û, wa dixuya ku şiret li wan dikir, ji wan her duyan re pistepist dikir, û, piştire ewan ji dizivirîn û bi feqîra re diştexilîn. Şîv digihaşt dawiya xwe. Çend heb ji vexwarinê mest bûyî, li ber êgir raxistî bûn erdê û xir, xir dikirin. Şêx, hempa û merivên bega, li cem hev rûniştî bûn û qala mêranî û talanên ku di wextê Taşnaqa de kiribûn, dikirin.

Hingê Ermeniyê Taşnaq (Ximpabêtekî kevin) rabû, xweş bi kurdî dizanî; berê ewê, emrên ku Misto, li ser beg, axa û pisaxa, derêxistibûn, xwendin û piştire jî gotara jêrîn da:

—Hun baş dizanin, ewê despê kir, ev nîzam çawa ye, ew mala gundiyan xira dike û dixwaze ku giş feqir bin da ku wan hemu bike emele û xebatker. Ji nav we, ên feqîrtir dibêjêre û wan dike mezin û serekên we, weke vî Mistoyê ha, mesela.

Bi rastî, ev Misto kî ye? Hun giş baş dizanin ku bavê wî û ew bi xwe, li cem tirk, molokan, ermenî û kurda, şivan bûn. Tu cara, ji olçekê bêtir zadê wan û ji kereki pêve tu dewarê wan ne bûn. Taşnaq bi destê xwe pireki bi simbêl nîşan dide: -Va ye axayê wî! Ew dikare rastiyê ji we re bibêje. Û nihu jî ev Mistoyê Şivan, ketiye nav me û feqîra radike beg axa û şêxa. Xorta dixapîne, wan rêdike bajêr, û li wê ji dersên ku dabûn Misto, didine wan jî. Eger hun hez dikin ku mala we neyête xira kirin, divê ku hun bikevin pê begên xwe, û şerê zilamên wek Misto bikin.

Gotara wî, bi reyina seya û bi dengê simê hespa, hate birîn. Dengeki xurt li derve dikire qîr«-Serekê Sovîyeta gund li kû ye? Ji milîsa re (eskerê bejik) cî çêkin!»

Cefil kete nav koma civiyayî. Giş xwe avêtin mala. Taşnaqê bizdiyayî ji şaşbûna xwe, kete nav koma küçika ku hindik ma wî bidirînin, eger hinekî dî xwe ne gihandaba mala Mecîd beg. Gund xwe bê deng kir...

## 2-Piçûk di nav xwe de diaxêvin.

Gezo û Beko di ciyê xwe de heyirî diman. Ewan xweş dizanînku, li wê, li deştê, li gundên ermeniyanku ew lihavînê lê dişuxilîn, siha tu beg ne mabû, lê li vir, li gundên kurda, wek berê, beg hin biçek in û hîn, bi kêfa xwe hikim li kurda dikin. Gezo û Beko, mideteke dirêj xwe ker kirin û li ser tiştên ku dîbûn, raman.

Şeva payizê digihaşt dawiya xwe.

Stêr vedimirîn. Bayekî sar û sivik derbaz dibû.

Gezo ji ciyê xwe rabû, çû cem Beko û çawa zilamekî raketî dihejînin ew hejand:

—Rabe, herin mal, gotê; ew êdî ne livir in. Emê sibê Edê bibînin û pê re li tiştên ku lazim e bikin, bifikirin.

—Belê, Gezo, gotinên te rast in. Edê kurikekî hêja ye. Em jî *wek* li gundên ermenî bikin; emê xwe bigehînin wî, malika xwe (hewze) deynin û tevde bixebitin.

—Tu çi dibêjî? Te xwe winda kiriye? «Malikek?» Tu dîn î? Ew komunîst in lê em bi xwe ne komunîst in.

—Gelo te, di civîna xebatkeran de ne bîhîst çawa Reşo digot ku gava çend zilam bi hev re xebateke milî dikin, ew xwediyê malikekê, tên hêsab kirin.

—Belê, rast e, Beko hezîn lê vedigerîne.

Sa hatibûn ciyê dawetê. Gava Gezo û Beko dîtin xwe avêtin wan. Hingê, her du jî, ji ciyê xwe rabûn, kûçik qewirandin û çûn mala xwe.

Wê şeva ha, Edê qet raneket. Gotinên beg, şêx û axa, wek derbên çakûçekê di serê *wî* de diçingiyan. Ji bêrîka xwe tutin derêxist, cigareyek pêçand û kibrîtek pêxist. Li jin û zaroyên xwe yên raketî nêrî; rûyên wan, li bin ronahiya kibritê çilmisî dixuyan. Heyiva çardeşevî sor û mezin, wek firaxekî paxir, di pencerê re lê dinêrî. Edê xisteeqlê xwe ku, hema sibê, ewê here û her tişt ji Milîsa re bêje.

Gelekî mitala kir û piştire kete xew. Sibê, bi qorîna çêlekê ku jina wî, di ber serê wî re dibir garanê, çavên xwe vekirin.

Gava gund şiyar bû, roj qederekê bilind bûbû.

Piştî daweta şevê dî, xelk di xew de mabûn; digel vê yekê roj tije xem xuya dikir.

Golè (serekê keriya) û Obe başî (serekê zozana) ji bo vegera germiyana emir dabûn. Herkes dixebitî û lez dida xwe: Kon radikirin, cil, mehfûr û kulav ba didan, stûnên kon girêdidan û werîs ditewandin...

Gezo û Beko lez ne didan xwe. Tu tiştê wan ne bû. Bi tenê xwediyên keriya xwe ji bo germiyana pêktanîn.

Beko li ber mala xwe rûnîştî bû gava Edê hate cem:

—Rojxweş Beko! Tu kinga hatî?

—Duhî.

—Te li deştê havîn çawa derbaz kir? Tu nexweş ne ketî?

—Na, Beko vegerandê, ji aliyê nexweşiyê tu gazinên me nebûn, lê, em ji germî fetisî bûn.

—Te Misto dî? Tu nizanî ewê kinga bê?

—Na, çawa me dikarî wî bibînin? Em li çolê bûn û qet ne diçûn bajêr.

—Çi xeberên nû li cem we hene?

—Gotinên min pir in; lê divê em xwe giş bicivînin da ku ez gundî û emeleyên ermenî, çawa xwe tanzîm dikin, ji we re bêjim.

—Havînê, Beko bi ser de ajot, Misto çûbû zozana. Li wê xelk dicivandin û ew hînî xwe tanzîm kirinê dikirin; lê bega bela xwe danê û nehiştin ku şixul bibe serî.

—Bêje min, li cem we civîna du hîçî bû? Beko jê pirsî.

—Ji bo vî tiştî bi xwe, min dixwest ez Misto bibînim, Edê bi dengekî nizim vegerand û li dora xwe nêrî, da ku jê re bêjim ku, livir beg, şêx û hempa, bi arîkariya Taşnaqa,

dixwazin belakî bînin serê wî.!

—Belakî bînin serê wî! Çawa?»

—Hineka dixwazin qebîleyên xwe giş bicivînin û li cem hikumetê giliyî wî bikin. Lê, gelek beg û Taşnaq di carekê de kuştina wî çêtir dibînin.

—Lê hevalênme çi dibêjin?

—Hevalên me kî ne?

—Ma feqîr gî ne bi Misto re ne? Ew baş dizanin ku ji roja hatina Misto halê wan xweştir bûye. Carekê bifikire! Di gundên Ermeniyan de, feqîr ji bêşa bi timamî miafin. Lê, li cem me, feqîr (bêşa koçeriyê, bêşa dexlê û ya bega didin). Li wê evçar sal in ku nîzama Bolşevîka, nîzama şewrên gundî û xebatkera hatiye danîn, li vir li cem me, hîn hikma bega wek berê dimeşe, Beko biser de ajot. Hinekî bifikir malava! Ez rastiyê dibêjim. Cangîr û Elîxan beg dîsa bûne serekên eşîrê.

Ewê xema kê bixwin? Bê şik xema yên xwe, yên dewlemendan; lê ême bi xwe, me tazî dikin. Ne xwe bi rastî, nîzama soviyetî hîn ne ketiye cem me...

Hîn dinya zû bû. Hewa ji bêhna erdê ya ziwa dagirtî bû. Roj ku derdiket hinekî bù tarî; ewirekî reş ew pêçand û siha xwe raxist ser çiya, gund, Edê û Beko.

Beko weke nalînê, keserek kişand, hinekî wê de çû û li ser kevirekî rûnişt. Edî jî xwe nêzîkî wî kir.

—Bala xwe bide min Edê, Beko bêdîka gotê, di gundên ermeniyan de ku em lê bûn, nahêlin axa û hempa têkîlî şixulên gund bibin, heta, wan naxin civîna jî. Xeçedûr axa tê bîra te? Milkê wî ji destê wî standin û ew ji rencbera re par kirin. Digel vê yekê, li cem me hîn beg û axa bi kêfa xwe dikin. Li wê, hema, her roj, minezimê xebatkeran dihat, em dicivandin, bi me re daxaft û emê çawa xwe ji bin destê axa û dewlemenda, xilas bikin, digote me...

—Gava Misto jî me dicivîne, Edê gotê, ew jî me ji her

tiştî ageh dike û riyên azadiyê şanî me dide, lê, hin bêbext diçin û gotinên wî digehînin beg û axan. Ma halê me xirab e nihu?

Em êdî tu tişt nadine bega; û her wekî em feqîr in hikumet jî bêşa ji me nastîne. Lê, eger ji te, tê bêşên Yûsif beg û Elî beg mede; ewê di cî de, egîdê xwe Şemoyê Oso, rêkin te û bi zor wan ji te bistînin.

—Binêr, êmin, ez çi difikirim? Beko xwe hinekî tevda û got. Divê em xeberê bidin Misto, an serekê canbêzara; yan na, beg wê Misto bidin kuştin.

—Na, vî nakin, Edê vegerand û rabû ser xwe; newêrin xwe bêxin vî belayî. Yûsif beg bi xwe got: «Divê em wî nekujin, yan na, ji bo wî, ewê me bidin ber tifinga.» Di wextê Teşnaqan de, Yûsif beg di civat miletê de nemînende bû, ji lewre bi qanûna dizane. Di wextê qeysera de, her meh diçû cem Hakimê Qefqasiyaya û ji bo serektiya Eşîra Hesenî, jêmeaş distand.

—Li dawiyê, şevê dî çi qerar dan?

—Piraniya *wan* gotinên xwe kirin yek ku giliyî Misto bikin.

—Nexwe, divê ku, Beko got, emê banî feqîr û rencberan bikin; herwekî di gundên deştê de dikin û emê, beg û Taşnaq bi Misto re wê çibikin, bêjine wan. Ez bawer im ku, feqîr û rencber wê hevaltiya beg û dewlemenda nakin, û bi me re bimeşin.

—Belê, divê em wan bicivînin, Edê vegerand...

Beko û Edê ji hev cuda bûn.

## 3-Li ser riya germiyana.

## Jin dest hiltînin.

Her tişt pêk hatibû. Hurmur li ser ga ku zaro ji her aliyê gund kom kiribûn, hatibûn barkirin. Nêzîkî saet heşt, ker-

van, weke werîsekî dirêj û bi can hate ser rê ku lê giya şîn bûbûn.

Cangîr beg, serekê êlê, qet guh ne dida nîzama sovietî û wek di wextê bav û bapîrên xwe de, an weke di wextê Taşnaqa de, hereket dikir. Li hespekî sergerim siwar bûyî, mîna serfermendarekî, li ciyekî bilind sekinî û hişt ku kervan di ber wî re derbaz be. Gava dît ku her tişt saz bûye, hespê xwe yê boz ajot û kete pêşiya koçeran ku mîna dîwarekî, diherikîn.

Li paş keriya şivanekî, li ser milê xwe pezekî ling şkestî hilgirtib û. Reben westiyabû û bi zor bi rê ve diçû.

. Pez ku xwe tim xwe tev dida, ji destê şivan filitî û kete erdê. Çavê Cangir beg pê ket; hate cem şivên li ser zengûyên hespê xwe ji piya sekinî û çiqas jê dihat, bi qemçiya rabûyê:

—Kerê mezin! Te çawan wêrî vî pezî li erdê xî? Tu lingekî wî ne hêja yî! Ezê şanî te bidim, sa, kurê sa!»

Rencberê reben, li bin derba tewandî, kire hewar:

—Mîrê min, min ew bi qesid ne xiste erdê... Ew bi xwe ji destê min xwe derêxist, min ew ji dûr ve hilgirtibû û ez ji teab ketibûm...

Gotinên şivan ji beg re giran hatin; çawa rencberekî dikarî bêedebî bike û li ber begê xwe xeber bide? Mecîd beg hîn bêtir xeyidî, hespê xwe ajot ser şivanê reben û li bin qemçiyan ew avête erdê.

Gava şivan dît ku ne dikarî xwe ji destê wî xilas bike, xwe avête nav jinan ku gihaştibûn cem wan, û xwe li paş wan veşart.

Cangîr beg ji adet û isûlên kevin derneket. Ewî dizanî ku li sûçdarekî ku xwe davêje bextê jina, êdî lênaxin. Di pevçûnan de, di kuştina de, di şera de, jin kefiya xwe ji serê

xwe radikin, wê davêjin erdê û dibêjin: «Bi navê Xwedê, vê sînorê miqedes bigirin, êdî li hev mexin, bela xwe ji hev vekin»

Û her du neyar bi ya *w*an dikin û dev ji hev berdidin.

—Ji siûda xwe, te xwe avête piştajinan; yan na, min şanî te bida! Kurê berêz, diya te şîrê kera daye te!... Û Cangîr beg hîn dom bi dujina dikir...

Ciyê herkes di êlê de gelek bi nizam hatibû saz kirin: Li pêşiyê jinên dewlemenda li hesp an ga siwar bûyî, diçûn, bi çend gava li paş, jinên feqîr, yên rencber û şivana, dimeşiyan. Li pişt wan zarokên piçûk girêdayî bûn.

Ewên ku bê zaro bûn, barên welê giran hilgirtibûn ku, bi zor di bin de bi rê vediçûn. Li dû wan, gayên barkirî, hesp û çêlek, û di dawiya gişan de,mî û bizin di riya x*w*e re diçûn. Dewlemend, şêx, melayên qure û rîspî, li ser hespa, di her du alî re, li cem kifletên xwe, bi pozbilindî dimeşiyan

Roj ronak û gerim bû. Jina Cangîr bega şanzde salî, Zedîne xanim, li ser hespê, li cem firax, nivînên xwe yên hevrîşim û micewherata, diçû, di deryayên xeyala de, hêdî, hêdî bi ba*w*eşînê, mêş an kelmêş, diqewirandin û li cariyên xwe qîr dikir. Pezê ketî, yê merivekî mêrê wê bû; ji lewre xanimê ne, dikarî bêteref bimîne:


—Çima, ewê digote mêrê xwe, te ev bêbextê ha di cide ne kuşt? Ew giş êdî bûne wek gura ku li deviya dinêrin. Bi tenê qemçî dikare wan bîne îtaetê, yan na ewê rabin û me biqurtînin...

Dengekî tevlehev, ji êlê hildibû... Mî, berx û bizin dikaliyan, çêlek û ga dioriyan, û, ji her alî, zaro û keçik pehlizokên x*w*e digotin...

Gezo lêdana şivan dibû. Lê ew bi rojanî li gundên ermenî xebitîbû, ketibû nav çivîna û ewî baş dizanî hikma so-



Ev êdî bes e ! Em dikarin ji heqê wan derkevin...



Ev êdî bes e! Em dikarin ji heqê wan derkevin...

100-101



Ev êdî bes e! Em dikarin ji heqê wan derkevin...

yetî çiqas heqên xebatker û feqîra diparêze, ji lewre ew vî tiştî qebûl nake, û gaziya reben, gundiyên feqîr, gundiyên pî (yên ku halê wan diqete), û x*w*endevanên bi wicdan, dike da ku dawiya zilma beg û axayên kevneperest bînin.

—Li ser laşê piraniya ji we, ciyên qemçiyan hîn sax ne bûne; lê nihu *w*ext hatiye, divê hun bizanin ku ev hal êdî ne ma dikare dom bike.

Nihu hikma me ye, hikma xebatkera, hikma rencber, cotkar, şivan, gavan, emele û paleya.

Divê ku êdî beg û axa ji me bitirsin! Lê, ji ehmeqiya xwe, heya nihu, em xwe datînin ber derbên wan, bi navê eşîrtiyê xulamtiya wan dikin, ji bo wan hev û du dikujin û bi ser de jî, bêşa didin wan. Kê Cangir beg ji me re serek bijaritiye?!! Çima soviyeteke meya gund nîne? Em êdî ji vî halî têr bûne...

Ev gotin ketin devê jina ku, li bin barên giran dimeşiyan. Piştî wan, zilama jî xwe gihandin dengê Gezo. Deng bilintir dibû û xelk li dora Gezo kom dibûn.

—Li zozana Cangir beg bi hesinekî li min xist yekî digo.

—Û ewî li ser min jî du dar şkênandin, çima ku min ji kaniyê kuli nêzîkî konê wî ye av dibir...

—Ev êdî bes e! Em dikarin ji heqê wan derkevin...

Hempa Smaîl Şêxo hate nêzîkî cemaetê û gote wan ku nihu beg wê bê û hêsaba xwe ji bo wan gotina ewê bi wan re bibîne. Xelk li dora wî bûn kom. Şivanekî bi laş û gewde kire qîr: «Wî ji hespê bînin xwar.»

Ên mala me xirab dikin ev in; û e*w*î Smaîl ji pişta wî girt û ew ji hesp kişande jêr.

Li ser qîr qîrên Smaîl, Cangîr beg hespê xwe bezand û hate wê derê:

—Xwe ji hev bidin alî yan ezê berdim! Xelk dev ji Smaîlê ji derba ketî berdan û xwe dan paş.

—Kê destpêkir? Cangir beg ji cemaetê pirsî.

—Me giş, me tevde kir! Bi dengekê gotin.

Gava çavên jina li Cangîr beg ketin, stûnên konan ji ser barên ga kişandin û xwe avêtin wî. Di nav wan de bi navê Elmast, jinikeke bejin bilind hebû. Ew di wextekê de li malên Molokan xebitî bû, piştire, gava vegeriya bû welêt Hikumeta Soviyetî erd dabûyê.

Elmast bi dilekî pola, stûnek di dest de, xwe avête Cangîr beg û derbek avêtê ku, çû li hespê wî ket. Heywan xwe hilda û xwe da alîkî. Gelek jin û mêrên din jê cesaret girtin û Cangîr beg tehdîd kirin û ew revandin. Bîsteke dî, Pîr Ebas, çend şêx û dewlemenda, ji kitêbên miqedes ayet dixwendin û digotin ku li sereka rabûn guneheke pir, pir mezin e.

Hingê Gezo derket ser tehtekê û destpêkir:

—Hevalino! Iro bi xwe, divê em zilamekî rêkin Erîvanê, cem Misto da ku wî ji her tiştî ageh bikin. Divê ku em çekên beg, axa û hempa, ji wan bistînin. Hun giş, diçin û tên gundên ermenî û gurcî û dizanin ku li cem wan, axa û mixtar ne mane. Lê, heya nihu li vir beg û hempa me dixeniqînin.

—Divê em, wek Cangîr beg, dersê hempa jî bidim, Elmast dibêje, ew xulamên began in û her gav destê wan digirin, ji ber ku nezan û kole mayina me ji menfaeta wan e.

Çend hebên din axaftin û qewirandina Cangîr beg xwestin.

Di vê gavê de, merivek xwe gihande êlê û xebera jêrîn da:

—Misto hatiye gund, Serekê Komîteya Bicîbir (Licne merkeziye), Elîxan û hin din jî pê re ne. Dixwazin soviyetên gunda bibijêrin. Lê her wekî nihu koçer vedigerin germiyana, berê çûn cem kurdên gundî, piştî heftekê, ewê bêne cem me.

Nûhatî hîn îlawe kir ku Elîxan beg ji mixtariyê hatibû avêtin, lê ku şêx, hempa û encimena eşrefa, gazî milet kiribûn da ku, dîsa li ser kar anîna wî bixwize û danîna soviyeta qebûl neke.

—Ev giş, karên Misto ne! Şêx û hempa digotin; pîr Ebas her gav li pêşiya wan bû. Divê em wî nehêlin, yan, na ewê toza me rake...

Koçer nêzikî çiyakî bilind dibûn, Boxûtlû, ku weke nanekî şekir, kenarên wî bilind bûn; zinarekî mezin ber bi ezmana ve hilbû bû û ji jêr gelek reş û tarî dixuya.

Piştî şîveke sivik, herwekî şev xweş bû, hemu li bin stêra raketin.

Serê sibê, diviyabû dîsa dom bi riya xwe ,bikin...

Dawiyê, roja sisiya, koçer gihaştin germiyana xwe, Li wê, li ser erdekî glover û fireh. Konên xwe danîn û ew cî ji xwe re kirinwarê zivistanê.

Li biharê, gava berê pez didin zozana, ev der dîsa vala dimînin.

Di vê midetê de, ev der dîsa tèr çêre dibin û li zivistanê, peza, xwêş têr dikin.

## 4-Fîkrên nû di nav milet de belav dibin.

Dema dayina xûkiya bega û sixreya wan hatibû.

Egîd beg bi xulamên xwe ji eşîrê re da zanîn ku herin ciyê pezê wî yê zivistanê çêkin. Cangîr beg jî emir da êla xwe.

Gundiyên feqîr û pî (yên hinekî xweşhal), berê ku ji xwe re tiştekî bikin, diviya bû ku, mal, û zar û zêçên xwe li bin ezmên bihêlin, bi mer û bêra herin şixulê bega biqedînin.

Gelek ji wan qebûl ne kir, li dora Gezo civiyan û ne razîbûna xwe nîşan dan.

Mecîd beg, qemçiyek di dest de, di ber koçera re derbaz bû û bi awir li wan nêrî. Tu kes ii yên rûniştî ji bo ikaraha adetên kevin, bi hatina wî ranebû.

—Xem nakê, baş e, baş e, rûnin!... Egîd beg gote wan. Di nêzîk de, ezê we ji bav û kalanên we bêtir bêxim bin hikma xwe. Hun bawer dikin ku nîzama we ewê dom bike, ne?!!Hunê paşê bibînin!... Ingiîz û Taşnaq çermê we û yê xortên we yên Komunîst wêrakin...

Tu kesî bersîva wî ne da. Mecîd beg derbaz bû. Li wî, aliyê wargekê, hempa, şêx û eşraf li cem Egîd beg diciviyan û bi saetan ve, şewra hev dikirin.

Gava, hin feqîr û pî bi danîna konên began mijûl bûn komsomolek (Endamekî ji xortên komunîst) ji bo xwestina êgir çû cem wan.

—Here bixebite!... Tu çi karî dikî, Tiralo?!!

Zilamekî kal ku dixebitî gotê, ên li emrê bega ne em tenê ne...

—Ez tu cara şixulê dijminên xwe nakin, Konsomol vegerandê.

—Ew ji kû dijminên me ne? Kalo beyirî...

Di vê gavê de Misto derket, gotinên wan bîhîstin û gote kalo:

—Dijminên me kîne, ezê ji te re bibêjim; gotinên min xweş bêxe serê xwe, wan di nav nas û hevalên xwe de belav bike û wan jî li dijminên xwe rake. Eger em destê hev bigirin, em bi hev re heval û yek bin emê bikaribin zora wan bibin ji ber ku heq bi me re ye...

—Min, dijminên me kî ne hîn fehim ne kir? Kalo dîsa pirsî.

—Dijminên me yên pêşîn û dijwartir, beg, axa, şêx û

hempa ne. Bi wasiteya adetên kevin, ew me ji xwe re dikin xulam û me ji bo şixulên xwe dixebitînin. Va ye binêr! Ewrên reş ji nihu de kom dibin; bîsteke din, baran wê bikeve, kifletên te wê şil bibin; ji ber ku berê ku tu konê xwe deynî, beg te mecbûr dike ku tu yê pezê wî deynî. Em nikarin êdî, bi vî awayî bijîn. Li gora adetên kevin, divê ku em bê gotin, serê xwe li ber beg, axa, şêx û hempa, xwar bikin û guh bidin gotinên wan, ne ji ber ku ew zilamên qenc, xwenda, zana û bi eqil in, lê, ji ber ku bi tenê beg an dewlemend in. Em ji aliyê wan çiqas tên êşandin û kêm kirin!... Li cem dewlemenda, kon tije mal û pere ye, lê, li pişta feqîra kirasek nîne. Divê ku em adet û qanûnên xwe yên kevin bavêjin û êdî guh ne din beg û axa ku emirên wek van didine me: «Zidî qudsiyeta şêxa tiştekî mebêjin! Ewê we kor bikin!...» û gava yek qala şêxekî dike, beg wî davêje ber dara.

Bî vî awayî ew hev û du digirin û ji feqîra xebat û îtaetê dixwazin. Divê em van qanûna ku ji aliyê beg, axa, şêx û dewlemenda hatine danîn berdin û qanûnên welê çêkin ku pê feqîr bikaribin bijîn û xwe ji bin istibdada axa û şêxan xilas bikin. Çima beg, axa û şêxên feqîr tune ne? Ji ber ku ew me icbar dikin ku em ji wan re bixebitin.

Li dinyayê her tişt bi xebatê çêdibe, lê eger tu bixebitî û xebata te ji xeyrê te re be, bê şik, tu ê feqîr û bi ser de jî bin dest û mehkûm bimînî...

Berê, gelek miletên din weke me dijîn.

Ew jî weke me koçer û gundî bûn. Lê, ewan berî me fehim kirin, bi ziraet û candiniyê re seneat jî elimîn û ji xwe re bajarên mezin çêkirin. Lê, em hîn wek berê dimînin. Em di koçeriyê de didin dû bega, û, di gunda de jî, bi navê eşîrtiyê, girêdayî axayekî dimînin, xizmeta wan, dikin, ji bo nav, mezinahî û dewlemendiya wan, şerê feqîrên din dikin, hev û du dikujin, û bi xwîna xwe, ji beg, axa an şêxên xwe re eraziyên din vedigirin. Ev hal, mîna vê meselê ye: Herwekî ba-

vekî du kur hebûn; yek ji wan, piştî ku hate dinê, midetekê di derguşê de ma, piştire meşiya, mezin bû û bû zilam. Lê, ê din tim di derguşê de ma û tu cara jê derneket.

Em wek vî kurê paşîn in. Ev çend hezar sal in ku em hatine dinê, lê em hîn di derguşê de ne û em bi jîriya xelkê dijîn. Êdî, ji bo me jî wext e da ku em jî rabin ser xwe û wek miletên din bijîn. Binêr, meselen, li gora adetên me yên koçera, divê ku her kurd konê xwe bi awakî miayen dêyne, yan na, ji qanûn derketin, mal û malbata wî tev de, wê bîne helakê. Lê, digel vê yekê, beg û şêxên me, konên xwe bi kêfa xwe datînin û tu bela nayê serê wan. Ne xwe ev`çima bi tenê, ji me, ji feqîra re kifr e? Dîsa li gora adetên eşîrtiyê, divê ku her eşîr, her bavik, bi serê xwe bijî û wek dewleteke biyanî, xwe bi xwe îdare bikê, û çavên wan jî, hema, tim li milk û malên eşîr an bavikên din bin. Gava zilamek, ji eşîrekê dibe dijminê zilamekî, ji eşîrêke din, her du eşîr ji bo van her du zilama, dibin dijminên hev, û, bê sebeb, xwîna hev dirijînin. Ev tişt ne ji bo carekê, an du cara, lê tim û tim. Û ev pevçûn, şer û xwînrijandin, bi tenê bi kêrî beg û axeya tên. Heta, ew bi xwe vê dubendîyê dixin nav xelkê.

Bigir meselen. Dijmintiya esîrên Ortlî û Kasan; ev çend sal in ku hev û du dikujin, û bi ser de jî, bertîla didin bega lê, ev êdî eşkere bûye ku dijmintiya her du qebîle bi teşwîqa Egîd beg destpêkir. Bro, li ber mirinê bi xwe got ku tu kes ji qebîleya Kasan li kuştina wî ne digeriya, lê Egîd beg bi xwe fitne dabû wan; ewî bi guhê xwe bîhîstibû. Hingê, Kasana xwe avêtin wî û derba mirinê danê.

Çi xirabî û perîşanî ji van tiştan tên serê kurdên koçer û gundî...

Piştire, li gora adetên me, divê ku şixulên giran û dijwar ji aliyê jina bêne qedandin. Ew ji vî tiştî zû nexweş û pîr dibin û zû dimirin. Û jinanîn li cem me çawa çêdibe? Birayê xwe bigir meselen: kal bûye û hîn heya nihu ji xwe re jin,

ne aniye; ji ber ku pereyê wî nîne û nikare qelen bide. Lê dewlemend bi xwe?... Ha ji te re egîd beg: Sê jinên wî hene û nihu jî ji xwe re keça Nado ya donzde salî xwestiye. Apê Cangîr beg 56 salî ye, lê di van rojan de, bi pere, keça Tahir a 14 salî ji xwe re anî. Kê ev qanûn danîne? Û kê gotiye ku dewlemend dikarin bizewicin û gelek jina ji xwe re bînin û, em feqîr nikarin yekê jî bistînin? Bê şik, beg, axa û şêxa ev adet û qanûn danîne.

Di her civînê de, min rakirina qelen xwest û we giş destê xwe radikir. Em hemu, rojek berî rojekê, rakirina qelen û ji vî nîrî, xilaskirina milet dixwazin. Vê havînê, li zozana, di (Civîna Mezin) de, pîr, kal, keç û xort tevde, me rakirina qelen teleb kiribû.

—Lê, beg, axa û şêxa ji bo vî tişiî çi digotin? Komsomol ji kalo pirsî.

—Çi digotin...? Digotin ku ev bê imkan e, ku ev guneh e, ku Misto xayinekî dînê me ye, ku êwî ji xwe re jineke Ûris aniye û simbêlê xwe kur kiriye. Wan rojên ha, êvarekê, beg li hev civiya bûn û difikirîn bi çi awayî xwe ji Misto xilas bikin...

Cemaet xwe ker kir. Komsomol demekê rama, piştire ji bêrîka xwe kaxitek derêxist û bi dengekî bilind, emrê lexûbûna qelen xwend û got ku heçî bi pere jinekê bînê, ewê bête girtin û 500 rûbil ceza, wê jê bêne standin. Piştire, heta ku keçik ne bûye şanzde û kurik jî hejde salî, nikarin bizewicin. Û divê ku, di dav jin û mêr de ji 10 sal bêtir ferq nebe. Û dawiyê, qanûn êdî nahêle ku tu kes ji jinekê bêtir bînê.

—Bijî...! Kalo ban kir û ji kêfa xwe mera xwe avête hewayê.

Kurdên ku bi îşên bega mijul bûn, hatin û li dora wan kom bûn. Kalo ji Komsomol xwest ku careke dî emrê lexû-

kirina qelen bixwîne. Ewî dîsa, ew xwend û ji wan re, her tist da fehim kirin.

— Bîjî Misto! Bîjî Misto! Xelkê kir qîrîn.

Mecîd beg deng û kenên wan bihîstin. Rabû û ber bi wan ve çû. Misto bi gotara xwe ya birî dom dikir:

— Belê, her wekî min digot, em hîn di dergûşê de mane; me adetên bav û kalan, wek tiştên mîqedes girtine. Lê, beg, axa û şêxên me bi xwe, van adeta ji bo mezinahî, dewlemendî û merkezên xwe, ji xwe re dikin alet; û milet feqîr, nezan, perîşan û paşde mayî dihêlin. Çima em bê xwendin in? Çima em bê seneat in? Ji ber ku, beg, axa û şêxên me, bi nezan, şivan, gavan, rencber û feqîr mayina me, me bê şzehmet ji xwe re dikin xulam û kole û bi kêfa xwe bi me dileyzin. Û, ji bo mayina vî halî, ev mezinên me yên ha destê xwe dixin destê xwînxwarên me û dijminên insaniyet û pêşveçûnê. Hun dibînin ku me hîn bi Teşnaq û Ingîlîza ditirsînin. We nihu seh kir çima beg, axa û şêx, dijminên me yên pêşîn in....

Lê eger, em baş bifikirin û em destê xwe bidine hev, em dikarin ji bin zilim û nîrê wan xwe xilas bikin, û roj bi roj pêşde herin.

— Ev giş rast e, gundiya, tev de, bi dengekî gotin.

Misto di cî de ew berdan û çû gundekî din.

Mecîd beg hate cem koma feqîra; gava çavê wî li Komsomol ket, xwe nêzîkî wî kir û ji serê wî heya piyên wî lê nêrî û bi xeyid lê kire qîr:

— Çima tu şixulê zwe disekinînî? Careke din, eger tu bê obeya min, ezê stuyê te badim...

Komsomol qet xwe şaş ne kir:

— Ji mêj ve êdî obeya te ne maye. Va ye obeya te!

Xort ev gotin û bi destê xwe şikeftek nîşan dayê : — Êmê te di nêzîkê de, bêxinê.

Mecîd beg qemçiya xwe rakir û xwe avête Komsomol ku li wî xe. Lê zilamên pîr û kal ku şixulê wî dikirin bi enir gotin :

— Destê xwe nedî vî mêrxasê ha, yan na emê aliyê wî bigirin *û* emê te pîs bikin... !

— Hun li van zugirtên ha binêrin ... Ne bi tenê ji *wan* re qemçî lazim e, lê divê ku qona wan jî bi hesinekî sorkirî bête dax kirin, herwekî Egîd beg bi Şerqiya re kir.

— Ev bi xwe tiştekî nake û nahêle em jî bixebitin, zilamên bega gotin, divê serê Misto jî bête pelaxtin, e*wî* ev serseriyên ha rakirin mezina...!

Mecîd beg sekinî, qebda xencera xwe givaşt û bi awir li xelkê ku gazin dikirin nêrî û mirmirî : « Xem nake. Di nêzîkê de dora me wê bê, û emê şanî we bidin, kurên sa...!»

Komsomol bê deng vegeriya mala xwe.

## 5 - Serhişkiya Derebegiya dom dike.

Roj diçû ava. Jor, li ezmana, êlo, ji hev dûr, li hewa hilavistî diman, weke ku bi çavên xwe yên tûj, li nêçîra xwe digeriyan. Car, car, li gîrên rût, dengekî zirav û kûvî dihat ; ev jî dengê êlokî çiyayî bû.

Konên bega û govên pezê wan hatibûn danîn. Şêxa jî konên xwe vegirtibûn. Ewrekî reş, li ûfik xuya kir ; bayekî xurt ew ber bi warê koçera ve anî. Berî rojava, taviyeke xurt hat. Zaro û hur murên ewên ku ji bo beg û şêx dişuxilîn şil bûn. Bayê payizê yê sar rabû. Zaro ji sermê dilerizîn. Bi hatina şevê baran sekinî.

Zaroyên beg, axa, şêx û hempa, ji kona derketin, destên hev û dugirtin, stran gotin û reqisîn. Zaroyên xebatkera, di nav cilén şil de xwe pêçabûn û bi keser seyra wan dikirin...

Hingê feqîra gotînên Misto anîn bira xwe û heya sibê, je beg, axa û şêxa gazin kirin û lanet li wan barandin.

Sibehî, roj tîrêjên xwe dirijandin li ser beriyê, û giya li heyara, weke tayên hevrîşmê yên zirav dîçirisîn.

Beyar, mîna şevekê zivistanê bi tirs û melûl in wek meydanekê şer, vir da, wê da ji hestiyên insan û heywana, tije ne.

Di wextê Teşnaqan de, kurd û ermenî ku ne dixwestin bikevin bin hikma tifinga Teşnaqa xwe li wê vedişartin.


Roj hîn bilintir bû. Dewar û pez ji şahiyê diboriyan û dikaliyan. Hesp, bi hiskirina rahetiya germiyanê, dîşîhiyan. Jin jî, bi dilxweşî, li dora bara diçûn û dibatin.

Gava hempa, bi giranî piyase dikirin, da ku piştî siwariya çend roja lingên xwe yen tevizî rahet bikin, feqîra kevir hildigirtin û ji bo konên xwe cî dikolan. Zaroyên wan jî berx dibirin çêrandinê.


Cangîr beg diltengî dikir ku zû here Yûsif beg bibîne û jê re bûyerên rojên dawîn bibêje.

Li ser hespê xwe, di şîveriyeke xwar û mar re, ser ber êr dibû. Ji nişkave, ji nêzîk, ji pişt tehtan, keneke gur kete guhê wî : Jînên kurd dikeniyan. Cangîr beg hespê xwe sekinand. Jê hate xwar û di şiverê re beziya çivanekan, giha erdekî bi sêlak ku diçû heya golê, coyeke kûr tê re derbaz dibû. Jînên kurd jê av dikişandin, ji ber ku li wê, av ji ya golê paqijtir, cemidîtir û zelaltir bû.


Emîne, Pişta wê li şiverê û fistana wê ya şîn lê, li



Sa tu yî û bavê te ye! Ewî li Mecîd beg kire qîr.



Sa tu yî û bavê te ye! Ewî li Mecîd beg kire qîr.



Sa tu yî û bavê te ye! Ewî li Mecîd beg kire qîr.



Sa tu yî û bavê te ye! Ewî li Mecîd beg kire qîr.

wê disekinî. Ji bin kûfiya wê ya glover, ji serê wê yê piçuk, ber bi paş ve avêtî, 14 keziyên zirav û dirêj, dihatin xwar. Ji dora xwe ne ageh, Emîne serê xwe dihejand û dikenî. Li ber wê, destên wî li kêlekên wî, xortekî kurd bi laş û gewde, rawesta bû. Ewî diranên xwe yên xweşik û spî nîşan didan, brûyên xwe digijgijandin, û bi xiftana xwe ya peritî, bi kumê xwe yê riziyayî û bi piyên xwe yên nîvxas, li Emîne dinêrî. Gava çavê wî li Cangîr beg ket, çend pirs gotin Emînê, xwe xwar kir, şerbika xwe girt û bi zerikekê dest bi dagirtina wê kir.

Emîne xwe zivirand û çavên wî rastî yên Cangîr beg hatin. Rûyê wê, berê sor, piştire bû zer û ken jê winda bû.

Cangir beg heyirî, xwe hilda. Emîneya wî, bi tena xwe, bi vî zilamê perîşan û bi kincên peritî re çi dikir? Ji xeydê, qirika wî hate givaştin. Diranên xwe reqriqandin, bê deng xwe nêzîkî kurdê hlengaz kir, şerbika wî jê stand û ew ewqas bi qîwet dehif da ku şivanê reben xwe ne girt û ket.

— Sa! Cangir beg zuriya, tu ciyê xwe nas nakî?!! Berê ku tu hîn sax î ji ber min biqele...!

Kurmancê feqîr rabû, bi milê xwe ruyê xwe paqij kir, hinekî ma, piştire rahişte darekî û Cangir beg tehdîd kir:

— Sa tu yî û bavê te ye! Ewî lê kire qîr, pişta xwe tewand, ji şiverê xwe da alî û di nav tehtan de winda bû.

— Emîne...! Dengê Cangîr beg ê birî dilerizî... Emîne...! Te ji bîr kir ku tu dergistiya min î? Te çawa diwêrî tu bi vî şivanê reben re xeber bidî, û heta pê re henakâ jî bikî...? Ma ji îro heya du heftan ezê qelen rênekim bavê te...?

— Tu çawa qelen rêkî, ma êdî qelen maye? Emîne heyirî, jê pirsî. Eger tu qelen bidî, li gora qanûnên soviyetî, ewê te bigirin.

— Xem mexwe, ewê min nagirin. Ezê qelen bi awakî welê bidin ku tu kes pê nizanê..

— Cangir beg, mîrim... Emîne bi denegekî nizim gotê, ew şivanê me ye, hatibû avê û arîkariya min kir.

— Lê, eger yekî ji eşîra me ew dîba, di nav xelkê de îştixalî wê çêba, hingê ez mecbûr dibûm te berdim.

— Oh ! Ez gorî, min efû bike ! Ew jî ne şivanekî adî ye. Ew jî ji maleke baş e. Bavê wî mêrxasê hemu eşîra Hesenî bû. Em bi hev re mezin bûne. Bavê min ew bire ba xwe, ji ber ku mêrekî hêja ye. Carekê, ewî bi tena xwe keriyê me ji destê dîza derêxişt. Lê, nihu, Emîne dîbêje, ez bi malbata xwe û bi şêxa sond dixwim ku ezê êdî li rûyê wî yê kirêt nanêrin. Û Emîne bi girînê ket.

Bi dîtina hêstirên çavên wê, xeyda Cangîr beg di cî de çû :

— Baş e, Emîne, bi dengekî şîrîn ewî gotê, ez te efû dikim. Ez bawer im ku ev tişt ji bo cara pêşîn bû û ku carceke dî çê nabe... Ezê emir bidim xulamên xwe ku vî sêwelekî ji vir biqewirînin. Vî geniyê ha xwest ku bi êgir bilêyze... Çavên xwe bimale û êdî megirî...

Emîne û Cangîr beg li hevhatin. Piştî nîv saetekê her wekî tiştak ne qewimî bû, Emîne, kûzê wê li ser milê wê, berê xwe dabû çiyê û Cangîr beg jî vedigeriya ciyê ku hespê xwe li wê hiştibû.

Lê, hesp li wê ne bû. Kurdê êşayî, ji bo hêlanîna heyfa xwe, ew revandibû.

Cangîr beg hêrs bû ; lê, tu tişt jê ne dihat. Tu kes li wê ne bû ku emir bidiyê û neyarê xwe pê bidê girtin. Bi peyatî xwe gihande konê Yûsif beg.

Di nav warê koçeran de xeber zû belav bû. Kêfa feqî-

ra gelek pê dihat û pêsnê vî merxasî hêja didan...

Beyarên çolê li bin tîrêjên rojê dişewitin. Di germiya bi rewrewk de, ûfiq xwe dilorîne û dilerize.

Li perava golê ya bi sêlak, konên Yûsif beg ên rêş xweş dixuyin, û li paş wan wek komên giya, konên feqîra belawela ne.

Pez ji golê wê da diçêre, hesp li ber qiraxê, bi diranên xwe yên spî û xurt giyayên ter heya bi rehên wan ve jê dikin.

Bîst gava ji konê Yûsif ê mestir wê de, ji mêvana re konekî nû vedigirin, Ji ber ku ji Yûsif beg re dane zanîn ku Teşnaq, (Ximpahêtên kevin), wê bêne cem wî.

Dûyê agira direj dibe, li ser yekî nan lêdixin, û li ser yekî din goşt dibirêjin. Sêyran xanim, jina Yûsif beg ji xadima re emir dide . Her der paqij û her tişt saz dikin.

Yûsif beg, bi giranî, li ser mehfûrekî rûniştiye ; li beriyê dinêre û çavneriya mêvanên xwe dike. Li cem wî, Cangîr beg jê re dibêje ku di nêzîkê de, ewê dest bi bijartina soviyetên koçeran bikin .

— Tu dizanî, Cangîr beg, ku kurê min derêxistine? Nihu çûne cem kurdên gundî û piştî çend rojan ewê bêne cem me. Zor bide qebîla xwe da ku te bikin serekê soviyeta xwe. Bi şêxa re bixebite ku feqîra bixapînin.

— Na, Yûsif beg. Vî Mîstoyê malxirab feqîr û belengaz li me rakirine. Dîbêjin ku, di havînê de, ew diçû û dibate cem me, xelk dicivandin û bi kêfa xwe ew tanîn ser daxwaza xwe; bêî ku haya me jê hebe.

— Belê, Cangîr beg, tu rast dibêjî. Gava Mişto li gundê me rencber û feqîr civandin, em ne xistin civînê û ji me re da

zanîn ku êdî milet mezinahiya bega û axa ya bi zor nâxwaze û ku ji îro pêve ewê xwe bi xwe îdare bike. Û hingê şêwra gund bê me hate danîn.

Di vê gavê de, ji gundê Qoçê zilamek hate wê de rê û got ku ji deşta Serderabad hin siwar ber bi konên koçera ve dihatin.

Deşta Serderabad... ! Çi ordiyên dijwar di nav te re derbaz bûne... ! Bi ser dirêjahî û pehnaiya te re, Teşnaq, Tirk û mihacirên kurd çûn û hatin. Te hinîbêza xwe ji wan re yek bi yek vekir. Lê, ew, bêî ku li ser erdê te yê bê pîvan, tu şopa bihêlin, giş winda bûn û çûn...

Beriya ziwa û bê av, bêdengiya xwe ya giran biparêze...

Kê bawer dikir ku li vê beriyê ku ji ewqas insana re bû bû goristan, rojekê, bi vekirina coya Serderabad, bi hezaran gundên kurd wê bêne avakirin. Ew kurdên ku, bav û kalanên wan, bi sedan ve sala, di vê beriyê re bi koçeriyê derbaz bûbûn.

Li beriyê hesp xweş bi teleb bi rê ve diçin. Li çola û li çiyan xebera hatina Misto û ya Encimena Mintiqê ya Tenfîzî ji bo bijartina meclîsên şewrê hin zûtir digehin gunda.

Belê li çola û li beriyê, di nav tehtan de û di newala de, ji van kurdên reben re, bi tenê Hikmê Soviyetî bextiyarî, xweşî, azadî û peşveçûn, anîn...

---

## 6 — Daweteke Eşîra

Gava bavê wî mir Bro hîn gelek pîçuk bû. Ji wî, jê re 20 pez, ga û hespek mabûn. Diya Bro, Besê, her gav digo : « Bavê te li ber mirinê gote min ku bi van peza ez

qelenê te bidim û jinekê ji te re bînim », û ewê bi dil û can li van miyan dinêrî.

Ji bo peyda kirina dergistiyeke hêja ji kurê xwe re Besê gelek geriya , lê tim taba wê vala diçû ; qelenekî giran dixwestin.

Ji piçûkahiya xwe de, Bro, Emîne nas dikir û her du jî hej hev dikirin. Lê, Bro ne diwêrî dilê xwe ji diya xwe re veke.

Carekê, di şeveke tarî de, gava Bro ji xebata xwe vedigeriya mal, rastî Emîne hat ku melûl û bi dilekî xemgîn diçû. Bi ditina wê, Bro lê kenî, silav lê kir, ew girt, ew kişande singa xwe, û ew maçî kir û rûyê wê çima ewqaş bêmad û çavên wê çima tije hêstir bûn, jê pirsî.

Emîne gotê ku Cangîr beg ew ji xwe re dixwest.

— Ez kurê koçerekî bi şeref im, Bro vegerandê, ez dilê xwe naguhirim. Tu yê bibî ya min ! Em tevde mezin bûne. Me bi hev re zarotiya xwe di zozanên Alagozê de derbaz kiriye û gotin daye hev û du. Çawa dibe ku nihu bêbextî li min bikî...? Dibêjim qey piştî mirina bavê min û feqîr ketina me...

— Na, Bro, ez weke berê hêj te dikim, Emîne bi girîn gotê ! Lê, li bêsûidiya me binêre... Vî Cangîr begê qereqûş ez ecibandime û bavê min dilê wî naşkîne û dibêje : « Ew beg û zilamekî dewlemen de ; ewê qelenekî giran bide...»

Bro gelek kûr rama ; ewî dizanî bi begekî re şer kirin çiqa dijwar e, nemaze bi serekê êlê re. Lê, ewî dî cî de xiste bîra xwe ku here ji diya xwe re bêjê ku qelenê Emîne bidê.

Li gora adetê, Besê apê Bro ezimand mala xwe û bi dizî qelen hate dayin.

Piştî lihevhatin û dayina qelen dîvê ku xort ji merivên dergistiya xwe re diyariya bidê û li ber wan bi zîrekî û xwînşêrîniya xwe jî xwe bi qiymet bikê. Besê ku, ciyê bavekî girtibû, li kurê xwe dinerî û digot : « Te dît, kurê min, min wesiyeta bavê te bi cî anî. Sibê, tu yê bibî xwedî jin. Ji îro bi şûn da, êdî tu bi serêxwe yî. Divê ku tu xwe bi xwe îdare bikî û ji her tîştî bêtir bala xwe bidê miyên xwe. Sivik, pozbilind mebe. Gava tu diçî nav eşîrekê ku zilamên wê bi çavekî ne divê ku tu jî wek wan bibî û xwe bîelimînî adetên wan.

— Baş e, dayê, Bro vedigerandê.

— Û nihu emê bi mêvanên xwe mijul bin ; gelo ji ber kes re diyarî hatin rêkirin ?

Li gora isûlên eşîrtiyê, divê ku, desgirtî ji her vexwendiyê dawetê re diyariyekê bişînê : Destmal, sabûn, êlax... Ewê ku dil dike bê dawetê, diyarî qebûl dike, yan na wê nastîne.

— Belê, Yadê, me ji her kesî re rêkir.

— Gelo diyarî wê têr bikin ?

— Herê, dayê, ewê têr bikin ; ji ber ku apê min ji bo daweta min heft pez dan min. Ewî baş dîzanî ku em bi tena xwe ji heq dernediketin...

Roja dîtir gundê Bro ne dihate naskirin ; gelek mêvan hatibûnê. Dawûl û zirne dengê xwe yên bilind digihandin ciyên dûr. Merimên Bro giş li wê bûn. Gundî, bi şal û şapikên xwe yên nû û bi kum û destmalên xwe yên rengareng bi kêfxweşî, ji konekî diçûn konekî din.

Di nav wan de, jin bi fistanên cejnê yên giranbiha û bi neqiş, bi delalî dikeniyan. Li ser kûfiyên delalên çiyê, zîv, zêr û guhar diçirisîn.

Li Wî aliyê gund tevdaneke din hebû. Li wê jî, siwar ji bona cirîdê civiya bûn. Heryekî ji wan zor dida xwe ku hinerên hespê xwe pêş xelkê bike. Hineka bi hev re şert digirtin û hin jî li ser esîl bûna hespên xwe isbatên rengareng derdixistin.

Dawiyê, beza hespa despê kir. Mêydana hespa 10 kîlometir dirêj bû. Siwar bi çargavên piçuk, gava digihaştin serê meydanê, bi dengê zirneyê tîz ku kêlê siwariya dixist bi hespên xwe cenbazî û hinerbaziyên dijwar dikirin.

Xelkê bi vi awayî kêf dikir. Di vê gavê de, Bro li ser textê zavatiyê rûniştî bû. Xortê ku li dora wî civiyabûn distrandin, direqisîn. Hineka serê wê kur dikir, ew dixemilandin û cîlên xweşîk lê dikirin. Li gora adetên kurdên aliyê me, porê wî bi derence dibirîn; her hevalkî wî diçû cem berber, pere didayê û jê dixwest ku para wî jî ya yên din zûtir biqusîne. Pere ku, bi vî awayî kom dibû, dîçû sendûqa xorta.

Emê bêne Emînê: Ew jî di bin kon de, bi hevalên xwe re rûniştibû. Ewane cilên wê lê dikirin, û li gora adetên kurdî, digirîn jî. Yekê ji keçika strana cilwergirtina bûka digot:

Xerîba Xwedê me.
Li ber penca rojê me.
Hesreta mala bavê me.

Porê xwe venakim.
Hinê pê wernakim.
Sûştina dayikê ji bîr nakim.

Xaniyê bavê te bi kort e;
Van dilopan şort, şort e,
Xwakê megirî zavayê Xort e!

Piştî her mîsra, giş digiriyan. Lê, digel vê yekê, her yekê ji wan digote bûkê: «Tu çiqas bextiyar î! Mêrê te xort û çeleng e. Lê, em bi xwe hîn nizanin çi bête serê me...? Dibe ku, em jina sîsiya, an çahara ya kalekî genî bibin? Hingê bê dîlê xwe emê mala bavê xwe berdin û ji dil hêstirên çavan birijînin...

Ber bi nîvroyê ve, gund hinek bê deng bû. Emîne siwarî hespekî kirin û bi hevaltiya siwara, ew birin mala Bro. Li ber derî tifinga berdan û diya Bro, di her destekî xwe de du firax girtin û reqsa koçerî kir.

Gava Emîne di şîpandeyê re derbaz dibû kûzek danîn ber wê; ewê ew şikênand û kete hundirê malê û dawet ji li wê giha dawiya xwe.

Deryayê dengê meriva xwe ker kir. Herkes çû mala xwe û her der bê deng bû.

Ev e saleke ku Emîne mêr kiriye. Li gora hisaba wê, ev sêzde heyiv in ku hatiye mala Bro. Bi tenê, piştî zewaca xwe bi mideteke, Emîne dikarî rûyê xwe veke, helî jê hêlîne û bi xesuya xwe re xeber bide.

Cangîr beg Emîneya xwe ya delal ji bîr ne kiribû. Gava xulamê ku ewî rêkiribû cem bavê Emînê, Vegeriya û nûçeya zewaca Emînê bi Bro re, anî Cangîr beg sond xwar ku ewê Bro sax nahêle...

Saet pê saet, roj pê roj, meh pê meh diçûn; Bro bi kêf û dilxeweşîyê bi Emînê re dijî û diya wî jî li cem bûk û kurê xwe di derya bextiyarîyê de ajinî dikir.

## Demeke Nû Despêkir.


Bihar nêzîk dibe. Wa dixuye ku roj li ser erdê, bi tîrêjên xwe yên zêrîn, dixwaze her tiştî bişewitîne. Teht û girên wargeha zivistanê ên zer diçirisin,,



Demeke nû despêkir.



Demeke nû despêkir.



Demeke nû despêkir.

Li bin kon agir pèketiye. Çend kurd li dora wî civiyane. Siha simbêlên wan ên dirêj dikeve ser rûyê wan û çavên wan ji guriya êgir diçirisn. Pir hêdî, weke mirmira avekê, bi hev re xeber didin :

— Gelek başe ! Bi vî awayî, Edê, li ser çêre, milk û bêşa dest bi axaftinê kır. Carekê bînin bira xwe, ewî digo, ji destê van zaliman me çiqas ezab û perîşanî kişand ! Erd û çêreyên baş di desté wan de bûn û bi ser de jî tu bêş ne didan. Lê, ji me bi xwe, her tiştê me distandin.. Nihu, her wekî Misto digo, emê her tiştê wan bistînin, erd û çêre wê bikevin destê şewrên gundî û koçer...

Edê, dum û dirêj behsa gelek tiştên din kir, piştire, blûra xwe girt û ew danî ser levên xwe. Weke tîrêjên roja germ, ahengên wê bayê berigê dadigirtin, diketin nav kona, ji jin û dergistiya re, şadî dibirin û delalên wan tanîn bîra wan.

Feqîra, jibo serbestî, rizgarî û ji koletî derketina xwe strandin û reqisîn. Ber bi sibê ve, dengê blûrê hate birîn û xelk ji hev belav bû.

Ji nişkave, obeya di xew de, bi hewar û qîrînên bilind şiyar bû. Zilamên nîv tazî an bî kiras û derpî, ji kona derketin. Di nava meydanê de peya kom bû bûn û xwe tevdidan ; tu kes nedizanî behsa çi ewqas bi germî dikirin ? Tu kes sebebê hewara wan seh ne dîkir ?

Lê, wa ye, siha merivên beg û axa ên bi gazin ! Li dû wan jî, sofî û şêxên rêhdirêj xuya kirin.

— Ho, ehlê dîn !, Evane despê kirin. Xwedê Teala ji me re belakî dişîne. Ne bi tenê hikim kete destê xwedênenasa, lê nihu jî beg, axa û şêxa digirin. Em nihu giş li ber helakê ne !... Sebebê van tişta gî Mîsto ye, dê herine wî ji ortê rakin û heyfa me jê hêlînin !...

Lê,gundiyên feqîr, ciwêlek, rencber, pale û pî ji vê nû-

çeyê gelek kêfxweş bûn û bi lez û bez dîsa vegeriyan konên xwe. Li meydanê, bi tenê, beg, axa, şêx, meriv û xulamên wan man.

Şeveke tarî, şeveke bi çavên şîn, erd xiste himbêza xwe û her tişt xwe ker kir..,

ERMENISTANA SOVIETI ji kurda re gundên nû ava kirin. Li şûna konên reş û kadîna, nihu, bi du, sê tebeq û bi pencereyên fireh, xaniyên wan ên bilind hene.

Feqîr, ciwêlek û pî ji xwe re kolxoz (Erazî, pez û dewarên mişterek) pêkanîne û xwediyên mal û milk bûne. Çandiniya xwe bi traktora dikin. Di kolxoza de makîneyên to, penîr û nivişk hene.

Di nav kurda de, seneatkarên mitexesîs û nûder bê hed û hêsab bûne. Giş endamên ( aza ) kolxoza ne. Xort hemu di partiya Komunîst de ne û ketine dibistana. Pir ji wan di zanîngeha seneat û ya karên bîlind de dixwînin. Bi hazaran di zanîstgehên Lenîngrad û Moskowa de dielimin.

Bê elektrîk û bê av tu xanî, bê dibistan, sînema, xestexane û mizgeft e tu gund ne mane. Melayên wan, bi dîyanetê re ilmên nû jî dixwînin, digehin dereceyên gelek bilind, û dibin memûrên hikumetê yên resmî.

Nihu, li warên koçeran, jîneke iştirakî ya nû dikele.

Li şûna ku xulamtiya beg axa û şêxa bikin, xwîna hev birijînin, perîşan û çavgirtî bimînin û di destê istimar de alet bibin, kurdên Alagozê îro di aşîtiyê de ji bona pêşveçûna Soviyetistan û ya cîhanê û ji bona xilasiya 12 milyon kurd, bê rawestan, şev û roj dixebitin..,

DAWÎ . . .

# Çend Şiîrên
# Kurdî yên Şewristanê

Celalî.

Gaziya min!

Pêşkeşî 100 hejmarê «Riya Teze»
dikim.

Sala,
Zemana,
Em
Grêdayî mabûn...
Mabûn grêdayî
Di bin,
Nîrê
Qeyd û zincirê
Axa, û mîran
Bega, imperialista!
Pişt vekirî
Pêxas
Belengaz
Dest qelişî.
Libitîn
Xebitîn.
Ewan Xar
Vexar!..
Em
Mabûn be êlim
Di tariyê de
Nava dinyayê de,

Kirina me,
Ya wan bû.
Heq, emeg
Wan re bû.
Li nav mila,
Derbê
Qemçî,
Çomaq
Û dar bû.
Evê zûlmê
Evê qehrê,
Ûsa,
Qat
Qat
Heta rojekê
Dewam kir hat.
Paşê,
Qewimî
Li Ûrsetê (1)
Sîleh teqiyan,
Eşya reqiyan.
Bû deng û gazî
Bi vî avazî
— « Inqlab !
Xlas !
Prolêtariat (2) esas ! »

---

(1) Soviyetistan
(2) Sinifa xebatkarên feqîr.

Ev deng,
Blind bû
Di çiya de wer bû.
Qefqas hingaft
Ghişt rohelat.
Zûlmet qelişî,
Tarî vebû,
Bû şefeq
Sor bû Oktiyabr (1)
Oktiyabr,
Kurek agir...
Keliyayî!..
Keliya!
Zincira
Ûstiyê pala,
Emegdara,
Qûtbû,
Heliya.
Bi sinifa xwe ve
— Îro em jî tevî wan
Xebatkarê Kurmanca!
Li dewleta Şewrê
Aza, bextiyar bûn
Ev çi bilindayîk?
Çi işq û ronkayîk?
Binêr!
Niha em

(1) Meha Çiriya Pêşîn (Inqilaba sor di vê mehê de çêbû).

Xwey ilm
Xwey kûltûr (4)
Xxey hebûn.
Ev Keremek mezin e.
Bizanbin !
Em birbînin !
Dayim herin,
Li riya Lenîn !

---

A. Mîrazî

## EM IN IRO

Em feqîr û fiqare bûn,
Bê gûman û îdare bûn,
Pencê qetlê li ser me bûn,
Ageh ji serê xwe tunebûn.
Serê me mij û dûman bû.
Em sefîl û sergerden bûn,
Zikek têr, cara birçî bûn.
Li çola û mexera bûn.
Iro zeman, zemanê me,
Hakim ketine bin lingê me,
Bi Saya hikumeta Şewristan,
Derge û diwan bûne yê me.
Şewrê da me medeniyet,
Ilim û xwendin û huriyet,
Li dijmina bûye qiyamet,

---

(4) Çand (seqafet, tehsîl)

Em in îro, aza û serbest.
Me beyreqa xwe blind kiriye,
Dujminê me ji me reviye,
Gerek em hê blind bikin,
Duniya timam aza bikin.
Duniya ku temam aza be,
Komunîzmê li dinyê rabe,
Kapîtalîzmê (1) ji dinyê winta be.
Diniya wê temam aza be!

---

## STALIN.

Tu yî rehber hevalê Stalîn!
Tu yî serkar şagirdê Lenîn,
Lenîn firqe çêdikir ji firqêd mayîn,
Te firqa Lenîn dha kiriye qewîn.
Tu çrayî — Çra hemuya,
Navê te belav bû çar aliya,
Ser topa dinyê welatek ne ma,
Ilmê te bela ne bû mîna çem û kaniya.
Tu stêrka geş î, şûle didî.
Tu behrek kûrî, delqe didî,
Xeberêd te qebûl dikin, pale û gundî.
Tu rehberî; rehberiyê dikî,
Li ber rast «çepa» tu şer dîkî,
Tu tehsîla Marks û Lenîn zengîn dikî.
Her milet rabûne serêd xwe blind dikin,
Inqlabê di nava xwe de hazir dikin,
Pey gotina te û Lenîn diçin qet ji bîr nakin,
Sekinîne dawa azayî û serbestiyê dikin.
Tu sedrî ji me re, sedrek alî,
Hevalekî ezîz, rehberek tamî,
Pale û gundî bi timamî,
Glîyêd te qebûl dikin bi dostanî.

---

(1) Sermayedarî

# Rastkirina Xeleta

| Xelet | Rûpel | rêz | rast |
|---|---|---|---|
| Xereb | 7 | 15 | Xerc |
| Dibîbin | 7 | 25 | dibînin |
| Ew | 12 | 5 | em |
| Ew | 12 | 15 | em |
| Tirşayê | 14 | 1 | Tirşoyê |
| | 14 | 29 | Bi van peran, bavo kereke mê kirî. |
| Dikirin | 17 | 26 | dikirim |
| Ez xwe kûz | 19 | 1 | ez xwe bilezînim |
| Rîzgar | 19 | 6 | rizgar |
| Xuliyên | 19 | 30 | Xuliyê |
| Geriyan | 19 | 31 | geriyam |
| Golikan | 21 | 1 | golikvan |
| Hîn | 21 | 28 | hin |
| Tê | 22 | 21 | te |
| Gihaştin | 23 | 18 | gihaştim |
| Bimînin | 24 | 19 | bimînim |
| Bod îtina | 27 | 26 | bo dîtina |
| Çavê | 28 | 1 | bavê |
| Feqîr | 36 | 2 | feqîr dikirin |
| Tektekc | 40 | 5 | tehteke |
| è | li şûna | | ê |